peyama Kurd

Rojnameya Gişti ya Hefteyî Hejmar 4 / Sal 1 01.10.2004

"Bila ti kes wisa nehesibîne ku Kerkuk dê li derveyî Kurdistanê bi awayekî dagirkirî bimîne!"

Rûpel 10



Kîselên Qobadî firiyan û xelat wergirt

Rûpel 15



Perwîz Cîhanî: Gotinên pêşiyan

Rûpel 14

Hak-Par da ser riya Brûkselê

Rûpel 4

Kurdên li Ewropayê dê rêjîma Suriyê protesto bikin

Rûpel 4

3 partiyên kurd li ser endametiya Tirkiyê bo YE

Rûpel 9

Rûpel 12-13



Kurdish weekly newspaper
Kurdische Wochenzeitung

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1,70 EUR

4 196577 401503 04

Pîroz be donzdeh saliya

Dewleta Kurdistanê

Rûpel 3



42 sal piştî "Serjimartina Awarte" li Suriyê:

Trajîdeya Kurdên "biyanî" hîn berdewam e



Dilo* (33) her sibe li pêşiya Zanîngeha Şamê disekine û çayê, qehweyê û vexwarinijne din difiroşe xwendekaran. Li pêşiya çavên wî keç û xortên ciwan diçin zanîngehê û derdikevin. Dilo bi xwe jî şagirtekî jêhatî û serketî bû. Wî di xwendina xwe de radeyên bilind wergirtin û karîbû xwendina pijîşkiyê (textoriyê) bixwîne. Lê Dilo dûrî bajarê xwe, li paytextê bûye çayfiroş. Dilo Kurdekî "biyanî" ye. Ew yek ji bêtirî 120 hezar Kurdên Suriyê ye, ku di 05.10.1962ê de nasnameya surî ji wan hate kişandin. Di rojekê de, ew ji hemî mafan bêpar man. Li gel sozên rêjîma Suriyê, ku nasnameyan li wan vegerîne, ta niha ne rêjîmê sozê xwe bi cî anîn û ne jî Tevgera Kurdî karî bo vê pirsê tiştekî bike. Êşa Dilo û bêtirî 200 hezar Kurdên mîna wî berdewam e.

Rûpel 4

Kujerê Şewketê Hacî Muşîr hat girtin

Endamê serkirdayetiya YNKê û Parlemana Kurdistanê berî salekê hatibû kuştin

Rûpel 5

Keya Îzol	Silêman Alîxan	Lokman Polat	Selim Çürükaya
Divê em ji bo pêşerojê amade bin	Ji mirovên nefam re dibêjin "Kurd"!	Tiliya dewleta tirk di bûyerên Kerkûkê de	Qicî Uveyş hê se vûnî?
Rûpel 8	Rûpel 8	Rûpel 10	Rûpel 17

Ji peyama Kurd

Hêvî mezin dibin û xebat berdewam e

Bi kêfxweşiyeke mezin, em dibînin û dixwînin, ku Peyama Kurd bi şêweyekî berbiçav tê firotin û xwendin. Xwendevanên wê li seranserî cîhanê peyda bûne û hejmara wan her hefte zêdetir dibe. Lê mixabin hîn jî li hin bajar û deveran Peyama Kurd nayê bidestxistin. Em ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê rojane bi fîrmeya belavkirina rojnameyê re di têkiliyê de ne û hewil didin, ku li her ciyê ku Kurd lê hebin, Peyama Kurd jî lê peyda bibe.

Di hejmarên dawî de hin nivîsên dirêj hebûn. Ev dê di hejmarên bê de bê guhertin û hewildana weşandina nivîsên kurt bê kirin. Nivîskar divê di vê yekê de alîkar bin û nivîsên xwe kurt bikin. Ji bo nivîsên dirêj, Peyama Kurd dê di hejmarên bê de rûpelên taybetî ji bo mijarên ramyarî û pirsgirêkên polîtîkî yên aktuêl di kirasekî taybetî de biweşîne. Emê agahiyên derbarê vê planê di hejmarên pêşiyê de biweşînin.

Herweha di hejmarên bê de, emê bêtir derfetê bidin xwendevanên xwe ku li gel me bikevin diyalogê, da ku ew bi têbînî û rexneyên xwe xebata me bi pêş bixin.

Di vê hejmarê de, me ji bo çalakiyên derbarê endametiya Tirkiyê bo Yekîtiya Ewropayê plakateke rengîn bi zimanê ingilîzî amade kiriye. Ev plakat di nav rûpelên rojnameyê yên navîn de ye. Em bi hêvî ne ku xwendevan sûdê jê werbigirin.

Hîn jî kêmaniyên me hene û hîn jî rexneyên we pir in.û hîn jî hewildanên me ji bo pêşxistina xebata rojnameyê berdewam e.

Impressum

Xwediyê Rojnameyê:
Peyama Kurd Verlag
Peyama Kurd
Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn / Germany
Fon: +49 (0228) 18 00 654
+49 (0228) 18 00 655
Faks: +49 (0228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com
info@peyama-kurd.com

Redaksiyon

Kurmancîya Jorîn:
Fadil Özçelik (Editorê Berpirs yê),
Sirwan Hecî Berko (Koordînatorê Redaksiyonê, sne),
Silêman Aldanî (sa), Z. Pirkemal (zp)

Kirdkî (Zazakî):
Sevdoxan Kurij (Editor, sa)

Kurmancîya Jorîn:
Dana Ali, Veriş Faiq, Sirdan Aziz,
Nizar Caf, Cotyar Darfiroş, Mansur Sidqî

Peyama Kurd ji mafê xwe dibine, ku nivîsên jê re, çap şandin, kurt bike. Ger ji alîyê rêzeman û rastnivîsê ve di sêrastkirina nivîsekan de azad e. Peyama Kurd nerîna xwe ji re tê şandin û berê li ciyekî din hatibe belavkirin, naweşîne.

Digel dilşadiya salvegera Dewleta Kurdistanê, carek din girîngiya pirsa

WELAT, NETEWE û DEWLETÊ

Bayram Ayaz

Dema mirov li bîra dîrokê dikole, dibîne ku gel û welatên xwedî dewlet karibûne hebûna xwe bibarêzin. Van gelan di dîrokê de qonaxên cur be cur bi serkeftî derbas kirine û gîhane serdema em tê de. Berovajî, gelên ku dewletên wan tune bûye, yan jî di şeran de bin ketine û welatê wan hatiye dagîrkirin, piraniya wan di nav gelên bi hêz de heliyane û wisan winda bûne û çûne.

Îro jî, ferqa nabeyna neteweyên serdest û yên lawaz di pirsa dewlet û desthilatdariyê de xwe diyar dike. Neteweyên xurt hemî xwedî dewlet in. Dîroka her yek ji van dewletan bi kêmasî sed û pêncî du sed sal e. Lê, gelên bindest li welatên xwe wekî dîlan dijîn, ne xwedî dewlet in, ne jî desthilatdariyeke wan a siyasî heye. Jimarên istatîstikan jî vê rastiyê li ber çavan radixin.

Li gorî zanînên etnolog û etîmologan, îro roj li rûyê dinyayê nêzîkî şeş hezar (6000) ziman tên axavtin. Hezar û pêncî û du (1052) ziman zimanên nivîskî ne û kêm zêde xwedî lîteraturekê ne.

Di coxrafiya siyasî ya dinyayê de, îro sed û not û şeş (196) dewlet hene û heftê û pênc (75) ziman, zimanên fermî yên dewletan in. Zimanên fermî yên gelek dewletan wek hev în. Wekî mînak, zimanê fermî yê bîst û yek (21) dewletên ereban erebî ye. Ispanî, portugêzî, ingilîzî, fransî û elmanî jî li gelek dewletan zimanê fermî ye. Ku em li bîst zimanên herî zêde tên axavtin, binêrin, dibînin ku ev ziman zimanên fermî yên neteweyên xwedî dewletan in. Di nav van heftê û pênc zimanan de jî zimanên herî xurt û yê zaniyariyê, zimanên heft heşt dewletên endustriyê ne.

Ji kîjan alî ve dibe bila bibe, dema em li vê pirsê dikolin, dibînin ku pêşketina welatekî, neteweyekî, ziman û çandekî, bi hebûna dewleteke neteweyî ve girêdayî ye. Neteweyên xwedî dewlet û desthilatdariyê him di warê ziman û çand û zanistiyê de pêşketî ne, him jî xwedî aboriyeke xurt in.

Vêca, dema ev rastî li pêş mirovî zelal be, yek baş têdigehe, bê çima ev dewletên ku Kurdistanê û neteweya kurd di nav xwe de parve kirine, naxwazin ku Kurd bibin xwedî dewlet. Ji ber ku ev dewlet (Tirkî, Surî, Îran û Ereben şovenîst ên şraqê) dixwazin Kurdistanê her tim di bin destê xwe de bihêlin û naxwazin rê bidin îdareyeke kurdî ya neteweyî. Hewildanên dewletên dorber li dij Dewleta Kurdistanê eşkere ne!

Rewşenbîrî û ramyariya kurdî girîngiya dewletê ji mêj de dîtiye û nivîsiye. Ehmedê Xanî berî sê sed û pêncî salan doz û daxwaza dewletê kiriye. Sedemên paşmayîna Kurdan bi tunebûna "tac û dewletê" îzah kiriye. Destpêka sedsala 17ê hêdî hêdî bandora tevger û ramanên Ronesansa Ewropiyan berê xwe daye Rojhilata Navîn jî. Ji xwe vê tevgerê tovên ramana neteweperweriyê û damezirandina dewletên neteweyî çinandiye. Bîr û ramanên wisa neteweyî li ba Kurdan jî peyda bûne.

Ev nêzîkî sed û pêncî sal in, gelê kurd ji bo azadiyê û damezirîna dewleteke kurd têdikoşe. Îro jî pirsa Kurd û Kurdistanê pirsa azadiya welat û damezirîna dewleteke neteweyî ye.

Li başûrê welatê me, eger hêj di qada navneteweyî de pê nehatibe îtîrafkirin jî, dewleteke neteweyî heye. Ev Dewleta Kurdistanê ya Federal e. Divê li seranserê başûrê Kurdistanê tenê ev dewlet û desthilatdarî bi şêweyekî demokrat û dadmendî xwedî gotinê be. Miletê kurd jî pêwîst e bi her şêweyî vê dewletê biparêze û xurt bike.

Pirsa dewletê ji bo tevgera kurd pêwîst e bibe babeteke sereke. Doza neteweke bindest û welatekî dagîrkirî bê dewlet çareser nabe. Bi çi şêweyî dibe bila bibe, heta miletê kurd ser axa bav û kalan, yanî li Kurdistanê nebe xwedî dewletekê, metirsiya asîmîlasyonê (helandinê) ji holê ranabe.

Çima dewlet?

Pêwîst nîne li vê derê em dîroka peydabûna dewletê, tarîf û fonksiyonên wê dûr û dirêj binivîsin; behsa dewleta antîk ji dema Eflatûnê yewnanî heta modelên dewletên modêrn û demokrat ên îro bikin. Di dîroka mirovayetiyê ya bi hezar salan de, rastiyek êdî zelal bûye: welat û civak hewceyî birêvebiriyekê ne û ev jî dewlet e.

Di sedsalên nozdeh û bîstan de, dewletên neteweyî hatin damezirandin. Civakan di pêşengiya elîtên (koma rewşenbîr û siyasetvanên) xwe de ev dewlet ava kirin û dewletên neteweyî ji civakên neteweyî yên modêrn û demokrat pêk anîn û pêşde birin. Rûdana neteweyan û dewletên neteweyî di dîrokê de qonaxeke taybetî ye. Her ji çi sedeman be, ev mijareke din e, lê sed mixabin xelkên kurd di vê qonaxê de bêpar man, nekarî bibin xwedî dewleteke neteweyî. Ev rewş heta bi îro her berdewam e.

Mijara welat, netewe û dewletê em dixazin bi wêneyeke xweristî pêşkêş bikin.

Welat wekî bexçeyekî mezin û fireh e. Netewe û civak di vî bexçeyî de gul û kulîlk, dar û daristan, fêkî û sebzî, teba û insan in, cur be cur, renga reng... Û dewlet jî, di vî bexçeyê rengîn de, bexçevan û dergevan e.

Vêca pêwîst nake em sed teyoriyan derbarê mijara dewletê li pey hevdu rêz bikin, pirs gelek hêsa ye. Gelo bexçeyekî bê bexçevan dibe? Dergeheke bê dergeyan dibe? Malek bê serî û bê xwedî û bê serûber dibe? Eger bersiva me ji bo van pirsan na be, wê demê welat û miletek jî bê dewlet nabin. Ji Kurdistana şêrîn û miletê kurd ra "bexçevan û dergevanek" divê. Nuha dewletekî me heye, ew îsal bû donzdeh salî, divê em wê biparêzin, xurt bikin, mezin bikin, fireh bikin.

Dema em dibêjin îro pîvana kurdewariyê, kurdistanperweriyê, neteweperweriyê, pêşverûbûnê û demokratbûnê, paraztina Dewleta Kurdistanê ya Federal e, armanca me ji vê yekê pirsa bexçevanî û dergevaniya miletê kurd û Kurdistanê ye. Belê dewlet û carek din dewlet û carek din jî dewlet...

Lê, me dewleteke demokrat, modêrn, dadmend û medenî divê, ne dewleteke otorîter û dîktator! Miletê kurd bi têra xwe ji destê dîktator û xwînrêjan kişandiye. Dewleta me divê li Rojhilata Navîn nîşana demokratiyê û serdemê be. Divê dewlet di xizmeta miletî de be, ne ku milet bibe şîv û taştêya dewletê.

Dema mirov li donzdeh salên Dewleta Kurdistanê dinêre, dilê mirov geş dibe. Ji Zaxo heta Halabçeya şehîd, bexçeyê Kurdan û birayên me yên aşurî û keldanî û tirkmenên rasteqîn, yanî welatê me hemiyan Kurdistana şêrîn bûye wekî bihûştê. Em pê serbilind in, û ew hezar carî li me hemî neteweperweran pîroz be!

bayaz@peyama-kurd.com

Nameyên we ••• Nameyên we ••• Nameyên we ••• Nameyên we

Xuşk û birayên xoşewîst û birêz!

Ez we û xwendevanên we ji bo xatirê derketina "Peyama Kurd" pîroz dikim. Bi dîtina min, ev gaveke hêja ye, gaveke mêjûyî ye, ya dîrokî ye, li ser rêya dêmoqratiyê, progresê, hevfêmkirinê û hevhizkirinê ye. Xebat dermanê her nexweşiyekê ye. Ez vê xebata nû careke din pîroz dikim. temenek dirêj ji bo "Peyama kurd" re dixazim.

Dr. Ezizê Îsko Gerdenzerî-Danîmark

Ez her sibe diçim dikanê, da ku rojnameyê bikirim. Îro ez çûm, rojnameya Ozgur Politika nemabû. Çavê min li rojnameya "Peyama Kurd" ket. Ez şa bûm. Min got rojnameyeke ma ye din derket. Min 19 kron derxistin û dan. Belkî jî ne li gorî ramanên min be, lê min dîsa min ew kirî. Ez dê bikirim jî. Eger hûn gihiştin hejmara sedî, ez sozê didm we, ezê deh hezar kron bidim we.

Hasan Akbal – Swêd

Min ji bo aboneyê îro pere ji we ra şandin. Rastî min nedixwast ez bibim aboneyê Peyama Kurd, ji ber ku kirîna Peyama Kurd ji rojnamefiroşekî min gelekî bextewar dike. Lê ji bo ku hûn daxwaza abonebûnê dikin û du hejmar jî ji min re şadin, êdî ez jî mecbûr bûm bibim abone. Ez bûm abone, lê ezê dîsa jî rojnameyeke din ji rojnamefiroş bikirim. Kêfa min ji kirîna wê re tê.

Alî Alxasî - Elmanya

Ez derxistina "Peyama Kurd" kareki geleki hêja û giring dibînim û ji bo vê yekê we pîroz dikim.

Hunermend Şêrîn Perwer – Elmanya

Li vê derê Peyama Kurd nameyên xwendevanan diweshîne. Ji ber kêmbûna cî, ew mecbur e ku wan kurt bike.

Donzdeh saliya Dewleta Kurdistanê



Runiştina yekemîn ya Parlementoya Kurdistanê 1992

Ezîz Azad

Sal 1990. Seddam roja 2yê tebaxê berê artêşê û hêzên xwe yên taybetî da Kiweytê. Di nav şev û rojekê de dest da ser vî welatê biçûk û ew bi temamî dagîr kir. Seddamê dîktator ji ber şerê bi Îranê re gelek ketibû bin deynan û ji dewletên ereb jî pirr aciz bûbû, li xezneyên nû digeriya û dixwest bibe Hitlerê Ereban li Rojhilata Naverast.

Seddam piştî ku şerê Îranê rawestand, berî her kesî êrîşê Kurdan kir, bombeyên kîmyawî li miletê me barand û dest bi enfalê kir, nêzîkî du sed hezar Kurd kuştin û dan windakirin. Hêj destê wan di xwîna Kurdan de, vêca berê xwe da Kiwêtê.

Dema li Halabçeyê bi hezaran Kurd di nav çend deqeyan de kuştin, tu deng ji dinyayê derneket. Dema heyşt hezar Barzanî girtin, ku heta îroj kes nizane bê çi ji wan hatiye, car din deng ji kesî derneket. Lê dema Seddam xwest li ser 97 milyar barêl petrola Kiwêtê rûne, dinya yekser bi xwînmijî û hovîtiya Seddamî hesiya û serî hilda!

Di nav çend mehan de, li dij rêjîma Seddamî hevkariyeke navnetewî ya fireh pêk hat. Saziya Yekîtiya Miletan biryara şunde vekişîna leşkerên şraqê da. Piştî ku Seddam ev biryar û daxwaz bi cî neanî û ji Kiwêtê venekişiya, roja 17.01.1991ê di seet 00:30 de li hemberî Seddamî şerê Kendavê ya Duyemîn dest pê kir. Roja 21ê sibatê, Hêzên Hevkar ketin Kiwêtê û artêşa şraqê şikand. şer şeş-heft rojan li ser axa şraqê jî dom kir û roja 28ê sibatê hat rawestandin.

Hevbendiya navneteweyî bi pêşengiya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê û herweha Brîtanyayê Kiwêt ji jêr destê dîktatoriya Seddamî rizgar kir. Lê ev cinawir li Bexdayê li ser text ma.

Destpêka meha adarê gelê kurd li dij rêjîma Seddamî serî hilda. Roja 3ê adarê, xelkên bajarê Ranyayê serî hildan û bajarî girt. Serhildana Kurdan jî Ranyayê dest pê kir û roja 8ê adarê bi serhildana li Silêmaniyê dom kir. Roja 11ê adarê, serhildan giha seranserê başûrê Kurdistanê. Hêzên hevpeyman Kiwêt rizgar kiribû, gelê kurd jî Kurdistana xwe ya dagîrkirî azad kir. Li başûrê Iraqê jî serhildanên şiiyên yên ereb rûdan.

Sala 1991ê ji bo gelê kurd him sala serhildanê bû û him jî sala xwînê, kuştinê, malwêranî û penaberiyê... Hêzên taybet ên Seddamî êrîşî serhildanên kurdan kir. Bi taybetî li Kerkukê, bi komkujiyêke hovîtî bi hezaran kurd kuştin.

Hêzên Hevkar Kiwêta xwedî petrol rizgar kir, lê hişt ku serhildana miletê kurd di nav xwînê de bimîne. Piştî wêneyên zilma rêjîma dîktator li dinyayê belav bûn û piştgiriyeke berfireh bo Kurdan peyda bû, hêzên hevkar wê demê mecbûr man ku li bakur û başûr ji bo Kurdan û Erebên şîî deverên paraztî durist bikin. Bi vê biryara Koma Miletan derfet ket destên hêzên kurd ên neteweyî û demokrat, ku li başûrê welatê me gav bi gav îdareyeke Kurdan saz bikin.

Piştî ku bi milyonan Kurd, Aşurî, Keldan û Tirkmenên ku tevê serhildanên Kurdan bûbûn, ji kampên ser sînorên dewleta Tirkiyê û Îranê vegeriyan ser axa xwe û li başûrê Kurdistanê emin û aramî peyda bû. Bereya Kurdistanê biryara hilbijartinan da, ku armanca wê damezirandina parlamaneke neteweyî bû.

Hilbijartin roja 19ê gulana 1992 çêbûn. Bereya Kurdistanê derbarê encamên hilbijartinan guftûgo kir û roja 23ê gulanê biryarên yekgirtî dan. Li gorî biryara Bereyê, Meclisa Neteweyî ji 105 parlamenteran pêk hat. Pênc endamên parlamenê ji PDK û pênciyê din ji bo Yekîtiyê hat biryar dan. Pênc parlamenter jî wekî nûnerê Aşurî û Keldaniyan ji bo Encûmenî Neteweyî hatin hilbijartin.

Encûmena Kurdistanê ya Neteweyî meha heziranê kom bû û endamê PDKê Cewher Namiq wek serokê Parlamenê hilbijart. Hikumet jî roja 04ê tîrmehê di bin serokatiya endamê YNKê Dr. Fuad Mehsûm de hat damezirandin. Parlaman û Hikumeta Kurdistanê dest bi karê xwe kir û di demeke kurt de li Kurdistanê li deverên azadkirî desthilatdariyeke kurd a demokrat saz bû.

Çend meh piştî hilbijartinan û damezirîna hikumetê, Parlamena Kurdistanê a Neteweyî dest bi karê îlankirina Dewleta Kurdistanê ya Federal li şraqê kir. Piştî pêşhaziriyên polîtîk, dîplomatîk û yasayî, roja 04ê çiriya pêşîn sala 1992ê Parlamena Kurdistanê ya Neteweyî bi biryereke yekdengî li ser axa başûrê Kurdistanê ya di nav sînorên dewleta şraqê de, DEWLETA KURDISTANÊ YA FEDERAL îlan kir.

(Berdewam rûpel 10)

42 sal piştî "Serjimartina Awarte" li Suriyê: Trajîdeya Kurdên "biyanî" hîn berdewam e

Sîrwan Hecî Berko

Di 23.08.1962ê de, hikumeta Suriyê bi fermana jimar 93 serjimartineke awarte bo parêzgeha Hisiçayê da, ku di 05.10.1962ê de di rojekê tenê de hate pêkanîn û di encama wê de ji dora 120 hezar Kurdî nasnameya surî hate kişandin û milkên wan ji wan hatin standin. Ji ber tunebûna istatîstîkan, jimara wan a îroyîn ne diyar e. Rêxistina UNHCR a Neteweyên Yekbûyî hejmara wan bi 200 hezaran texmîn dike.

Hikumeta surî îdîa dikir, ku "Kurd ji Tirkiyê hatibûn Suriyê" û bi vê yekê "karaktêra welatî ya erebî xistibûn xeterê."

Di nameyeke xwe de bo rêxistina "Human Rights Watch" (12.07.1986), balyozxaneya surî li Emerîkayê nivîsandibû, ku "di destpêka sala 1945ê de, Kurd ji welatên cîran û bi taybetî ji Tirkiyê bi şêweyekî qaçax sînor derbas kir û li bajarên mezin mîna Amûdê, Dirbêsiyê û Dêrikê li parêzgeha Hisiçayê bi cî bûn." Li gorî nameya balyozxaneyê, "piraniya Kurdan karî xwe di lîsteyên qeydkirinê yên sivîl de qeyd bikin û nasnameyên surî bi dest bixin, da ku erdên ku ji aliyê hikumetê ve li ser miletî dihat parkirin, bi dest bixin." Lê hikumetê ta roja îroj ti belge pêşkêş nekirine, ku di wê demê de tenê Kurd bo wan armancan hatibûn Suriyê, nemaze ku Erebên ji Iraq û Tirkiyê (herêma Mêrdînê) û herweha ji parêzgehên Suriyê yên din jî bo baştirkirina rewşa xwe ya aborî xwe li parêzgeha Hisiçayê bi cî kir. Ku di 1962ê de nasname tenê ji Kurdan hatin kişandin, eşkere dike, ku mebesta hikumetê ne ew bû, ku nasnameyê ji wan kesan bikşîne, yên ku bi şêweyekî qedexe li herêmê diman. Hikumetê tevaya mafên sîvîl ji beşekî mezin ê gelê kurd û bi wê jî derfeta beşdarbûna di jiyana siyasî û civakî de kişandin. Herweha wê li ser qaxezan hejmara Ereb û Kurdan li parêzgeha Hisiçayê kir wekhev, da ku wê rastiyê winda bike, ku ew herêm ji aliyê Kurdan ve di destên Kurdan de bû. Ev yek ji wî alî ve tê piştrastkirin, ku jmara 120.000 ji Kurdên ku nasname ji wan hate kişandin, heman jmara cudahiya di navbera hejmara gelî di sala 1954ê (240.000) û 1961ê (340.000) de ye. Bi vê yekê, hikumeta Suriyê zêdebûna rêjeya jidayikbûnê piştguh kir û îdîa kir, ku zêdebûna jimara hemwelatiyan 100% bi hatina Kurdên derveyî Suriyê ve girêdayî ye. Herweha wê tucarî hewil nedaye, ku wan Kurdan vegerîne "welatên wan", ger ew bi rastî ne ji Suriyê bin.

Li aliyekî din, pêkanîna serjimartinê di rojeke tenê de diyar dike, ku mebesteke rasteqînyane bo eşkerekirina kesên ku piştî 1945ê koçberî Suriyê bûbûn, qet tune bû. Ger mirov bizanibe, ku piraniya Kurdên li parêzgeha Hisiçayê wê demê nexwende bûn û kêm caran têkiliyên wan bi dezgehên hikumetê re hebûn, derfeta ku ew di çend seetan de belgeyên nivîskî derbarê hemwelatîbûna xwe pêşkêşî karmendên dewletê bikin. Herweha gelek ji wan belgeyên bi vî rengî tucarî bi dest nexwestibûn.

Raportên komek ji şahidan eşkere dikin, ku serjimartin bi şêweyekî pir tevlihev pêk hat. Gelek caran karmendên dewletê nediçûn cem hemwelatiyan bi xwe, lê belê agahdariyên xwe ji muxtaran distandin. Hin muxtaran "hesabên xwe yên kevin" bi gelek kesan re "serast kirin" û ew mîna biyaniyan di lîsteyên dewletê de dan qeydkirin.

Nedurustbûna vê serjimarê di wê yekê de jî eşkere dibe, ku di gelek malbatan de braderek ma hemwelatiyê Suriyê, lê birayekî wî yê din ji nişkê ve bê nasname ma û mîna gelekan bû mirovekî biyanî. Herweha hin dê û bavan man welatî, lê nasnameya surî ji zarokên wan hate kişandin. Gelek kesên ku leşkeriya surî kiribûn, ecêbmayî man ku di rojekê de nasnameya Suriyê ji wan hate standin. Li Suriyê tenê hemwelatiyên xwedî nasname mecbur in herin leşkeriyê. Serokê leşkeriya surî yê salên pênceyî General Tewfîq Nîzamedîn jî ji ber kurdbûna xwe nasnameya xwe "winda kir". Human Right Watch behsa Kurdekî dike, ku ji ber qehremaniya wî ya di şerê erebî-israîlî de ji bo xelatkirinê hatibû destnîşankirin, lê dema vegerê rastî kişandina nasnameya xwe ya surî hat.

Berdewam dibe

** Navê wî ji aliyê redaksyonê ve hatiye guhertin.*

sirwan@amude.com

Kurdên li Ewropayê dê rêjîma Suriyê protesto bikin

Bi helkeftina salvegera paşvegirtina hemwelatiya çend sed hezar kurd li Suriyê, li Swêd û Holandayê dê du xwepêşandan li dijî rêjîma Suriyê pêk werin.



STOCKHOLM/DEN HAAG (PK) – Bi helkeftina salvegera paşvegirtina hemwelatiya çend sed hezar kurd li Suriyê di 05.10.1963ê de û bêparhiştina wan ji hemû mafên sîvîl û mirovan, li Swêd û Holandayê dê du xwepêşandan li dijî rêjîma Suriyê pêk werin. Kurdên li Ewropayê dê doza çareserkirina Pirsa Kurdî bikin û ji Yekîtiya Ewtopayê bixwazin, ku di vê yekê alîkar be.

"Çavsoriya karbidestên Suriyê rawestînin"

Revenda kurd li Swêdê dê sibe xwepêşandaneke protestoyê li hemberî balyozxaneya Suriyê li Stockholmê pêk bîne. Dirûşmên çalakiyê dê „Vegerandina hemwelatî û mafên hemû Kurdan", „azadkirina girtiyên kurd û hemû girtiyên siyasî yên din ji zindanên Suriyê de" û „çareserkirina pirsa kurd û paraztina mafên mirovan li seranserî Suriyê" bin. Insyatîva Kurdên Suriyê li Swêdê vê xwepêşandanê bi piştevaniya hêzên kurdistanî li Swêdê amade dike. Amadekarên vê xwepêşandanê "bangî hemû nîştîmanperweran dikin, ku tevlî vê çalakiyê bibin", da bikaribin bi hev re „çavsoriya karbidestên Suriyê, nemaze ya piştî serhildana adara 2004ê, rawestînin."

Xwepêşandan dê li Karla Plan/ Narvavägen li dar keve û demjimêr 12.00 dest pê bike.

Pirsa Kurdî mijareke Yekîtiya Ewropayê

Li aliyekî din, rêxistinên kurd yên li Ewropayê dê 05.10ê li bajarê Den Haag li Holandayê xwepêşandaneke protestoyê ya navendî pêk bînin. Amadekarên vê xwepêşandanê dixwazin "berdewamiya siyaseta rêjîma Suriyê ya şovenî li dijî gelê kurd û herweha inkarkirina normaltirîn mafên neteweyî yên rewa" protesto bikin û herweha ji hikumeta holandî, ku serokatiya Yekîtiya Ewropayê dike, doza pêkanîna zorê li ser hikumeta Suriyê bikin, da ku "dev ji van praktîkên nijadperest li dijî gelê kurd mîna Serjimartina Awarte û Kembera Erebî" berde. Herweha ew doza serbestberdana girtiyên siyasî û yên nerînê dikin. Rêxistinên kurdî ji Hikumeta Holandayê dixwazin, ku Pirsa Kurdî bixîne nav guftûgoyên Yekîtiya Ewropayê û "çareserkirina wê bike şerteke bingehîn bo hevkariya di navbera Ewropa û Suriyê de."

Xwepêşandan dê demjimêr 12.00 ji rawestgeha tirênê ya Den Haagê dest pê bike û ber bi Parlamana Holandayê ve biçe.

Prodoksyona petrola surî bi pas ve diçe

SAM (PK) – Prodûksyona petrolê ya Firmeya el-Furat a surî vegeriya 212 hezar bermîl di roje de li hemberî 400 hezaran berî deh salan. Li gor raganiyên nûçenameya "Middle East Economy Survey", tevaya prodûksyona Suryayê ya petrol û encamên we vegere, yanê 470 hezar bermîl di roje de li hemberî 600 hezar bermîl di sala 1996ê de.

Suriyê roje 220 hezar bermîlên petrolê bo xwe bi kar tîne. Bi ve yekê, nivê prodûksyona we derdikeve derveyî welat. Hejmara bermîlên petrolê yên rezervê digihê 2.2 milyaran. Firmeya el-Furat di destê hikumeta Suriyê de ye.

Li aliyekî din diyar bû, ku Suriyê rojane 16 milyon m3 ji xaza sirûştî derdixîne. Tevaya wê ji bo hundirê welatî tê bikaranîn.

Tê texmînkirin, ku Suriyê dê ji sala bê û pê ve rojane 1.5 milyon m3 ji xaza xwe bifiroşe Lubnanê. Herweha tê texmînkirin, ku prodûksyona xazê di sala 2006ê de dê bigihê 22 milyon m3 di rojê de, û 25 milyon m3 di sala 2007ê de û 28 milyon m3 di 2008ê de.

Hêjayî gotinê ye, ku piraniya petrola Suriyê ji herêma kurdî li bakurê welêt derdikeve. Lê gel vê yekê jî, piraniya xebatkarên di vî wari de ne kurd in.

Serokê Turkmenistanê 40 helbestên xwe xwendin



Serokê dewleta Turkmenistanê Saparmurat Niyazov (Türkmenbaşi) weşana televizyona dewletê ya fermî qut kir û 40 helbest ji pirtûka xwe ya dawî li pey hev xwendin. Helbestên vê pirtûkê dê mîna pirtûka wî ya berê "Ruhname" di dibistanan de were xwendin. Türkmenbaşi bi piraniya dengan (99.9%) di sala 1992ê de bû serokê Turkmenistanê. *(Avesta)*

Hak-Par da ser riya Brûkselê

Mihemed Eren – Amed

Partiya Maf û Azadiyan (Hak-Par) 28ê îlonê li Amedê bi daxwuyaniyeke ji bo çapemeniye dest pê kir û ber bi Brûkselê ve ketin rê. Daxwuyaniya ji aliyê cîgirê gîştî yê partiyê Hesen Daxtekîn ve li ser Kuçeya Hunerê hat pêşkêşkirin.

Pişêtre nûner û endamên Hak-Parê yên bi otobusan ber bi Enqereyê ve ketin rê û 29ê mehê ji wê derê li gel serokê gîştî yê partiyê A. Melîk Fırat ber bi Brûkselê ve çûn. Siyasetvanên Hak-Parê dê roja 03.10ê li gel Kurdên Ewropayê li Brûkselê xwepêşandanekê li dar xînin. Nûnerên Hak-Parê wê di çarê mehê de li gel berpirsiyar û nûnerên Yekîtiya Ewropayê hevdîtinekê pêk bînin.



Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav: .....

Navnîşan: .....

Elmanya:
6 mehan: 50,00 €
Salekê: 70,00 €

Welatên Yekîtiya Ewropa
6 mehan: 60,00 €
Salekê: 80,00 €

Commerzbank Bonn
Konto: 1007947
BLZ: 38040007

Konto:
IBAN DE 36 38040007001007947
BIC: COBADEFF380

ji bo welatên din têkiliyê bi rojnameyê re deynin:
Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany
Tel.: +49 (228) 18 00 654 – 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656
www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com

Ismaîl Beşikçî destek da kampanyaya Ruşen Aslan



Profesorê tirk û dostê Kurdan Ismaîl Beşikçî piştgiriya xwe ya ji bo kampanyaya "Komara Tirk (KT) divê lêborîna xwe ji min, ji hemû kesên ku işkence dîtine û ji gelê kurd bixwaze" anî zimên. Beşikçî di peyama xwe ya bo malpera gelawej.com de bêdengiya çapamenî û rewşenbîrên tirk rexne dike û dibêje ku li Tirkiyê biçûkkirina Kurdan serbest e. Beşikçî weha berdewam dike: "Işkenceyên li Iraqê di rojname, telewizyon û radyoyan de gelekî hatin behskirin û rexnekirin, lê kampanyaya ji aliyê siyasetvan û mafnasê kurd Ruşen Aslan ve hatiye destpêkirin, ji bilî du nivîsan di çapameniya tirk de tu deng veneda."

Beşikçî di peyama xwe de carek din diyar dike, ku bingeha pîvana rewşenbîriyê ew e, ku li himber neheqiya dewleta xwe bêdeng nemîne.

Gulistan Perwer çû welêt



Hunermend Gulistan Perwer vegeriya Kurdistanê. Gulistan wê beşdarî Festîvala Batmanê bibe. Festîval 27ê îlonê dest pê kir û dê 3ê vê mehê bi dawî bibe. *(Avesta)*

12emîn Festîvala „Kongra-Gel" pêk hat

Di 25.09ê de, li bajarê Gelsenkirchen li Elmanyayê 12emîn Festîvala Kongra-Gel pêk hat. Komek ji hunermendên kurd mîna Necmidîn Xulamî û Dilşad Seîd beşdarî vê festîvalê bûn. Li gorî agahiyên polîsan, dora 40 hezar kes beşdar bûne.

Li Elmanyayê hevdîtina pijîşkên kurd

BERLÎN (PK) – Komeleya Pijîşkên Kurd li Elmanyayê dê di rojên 2/3.10ê de kongreya xwe ya salane li dar xîne. Pijîşkên kurd ji seranserî Elmanyayê dê li bajarê Bad Grund bigihên hev û pirsgirêkên xwe guftûgo bikin. [„Haus des Gastes", Elisabethstr. 1, 37539 Bad Grund/Harz]

Partiyên kurdî doza mafên kurdan dikin



QAMIŞLO (PK) – Partiyên kurdî li Suriyê doza serbestberdana girtiyên kurd ên piştî bûyerên serhildana adara borî dikin. Ew ji hikumeta Suriyê dixwazin, ku careke din "rola xwe ya paraztina hemwelatiyan û milkên wan û herweha çavdêriya rûmeta wan vegerîne." Di daxuyaniyekê de, partiyên kurdî herweha ji hikumeta surî doza tawîda kurdên ku di wan bûyeran de dikan û milkên wan ji aliyê ereban ve hatibûn dizî û xerakirin, bike û "dev ji siyaseta xwe ya çewisandinê li dijî mafên gelê kurd berde."

Kujerê Şewketê Hacî Muşîr hat girtin

KURDISTAN(PK/taybetî) - Jêdereki berpirs li Asayişa Herêma Kurdistanê di peywendiyeke taybetî de bo Pêyama Kurd ragihand, ku kujerê endamê Parlamenta Kurdistanê û serkirdayetiya Yekêtiya Nîştimanî Kurdistan şewket Hacî Muşîr di hewleke serketiyane ya parêzvanên aramî dû tenahiyê li Kurdistanê de hat girtin.

Jêdereê berpirs di dirêjiya axaftina xwe de got, ku ew kujer endamê desteka teroristî ya "Ensar el-Islam" bû û dan be vê çendê daye û çendîn car serdana Feluce kiriye û li wir çav bi terorist Ebu Museb el-Zerqawî" ketiye. Jêdereê berpirs ku qayil nebû navê wî eşkere bibe, eşkere kir ku vekolîn di gel vî teroristî berdewam in.

Hejayî gotinê ye, ku par û di kiryarke teroristî de Şewketê Hacî Muşîr ku ji bo berqerarbûna aşitiyê xebat dikir hat terorkirin.

Kurdistan di mezintirîn pêşangeha pirtûkan de

FRANKFURT (PK) - Kurdistan dê îsal beşdarî Pêşangeha Pirtûkan a Frankfurtê bibe. Wezareta Rewşenbîrî ya Hikumeta Herêma Kurdistanê dê bi alîkariya Navenda Zanîn û Rewşenbîrî ya Kurdî-Elmanî kovar û pirtûkên ji Kurdistanê li mezintirîn pêşangeha pirtûkan a li cîhanê pêşkêş kin. Ev pêşangeh dê ji 6-10ê meha 10ê li dar keve. Maseyên Kurdistanê dê li „Halle 6.1 Stand E940" bin. Demên vekirinê: şemî: 09:00-18:30, yekşem: 09:00-15:30.

Nivîskarên Duhokê li bakurê Kurdistanê ne



AMED (DÎHA/PK) – Şandek ji Yekîtiya Nivîskarên Kurdistan - Duhok ji bo Festîvala Qoser û Êlihê çûne bakurê welêt. Ew bo serdanekê çûn Amedê û serdana PENa KURD a Amedê û kursa zimanê kurdî kirin. Cigirê serokê Yekîtiya Nivîskaran Mihemed Ebdela Ehmet, bijîşk û nivîskar Arif Hîto, Fadil Omer, nivîskar Selam Salih Balayî, Beşir Mizûrî, Nacî Taha Berwarî, Layiq Korêmeyî, bijîşkê beşê mêjûyê M. Salih Zêbarî û Selah M. Selim li avahiya PENa KURD hevdîtinek li gel serokê PENa KURD Sedat Yurttaş, cîgir Yildiz Çakar û nivîskarên din pêk anîn. Nivîskar pêşî çûn serdana kursa zimanê kurdî ya Amedê û li polan geriyan.

Serokê PENa KURD Sedat Yurttaş di pêşwazîkirinê de da zanîn, ku zimanê kurdî li Tirkiyê di rewşeke nebaş de ye û bi avakirina komeleyê ew dê xizmeta zimanê kurdî bikin. Yurtaş got: „Komeleya me komeleyek nû ye. Ji we jî diyar e ku li Tirkiyê zimanê kurdî di rewşeke baş de nîn e. Me xwest ku em bi avakirina vê komeleyê, hindik be jî, xizmeta zimên bikin. Her çiqas karê me zehmet be jî, me carekê dest bi vê riyê kiriye û êdî ji vê riyê veger tune ye. Em hêvî dikin ku emê bi ser bikevin. Kêmasiyek me ya din jî ew e ku di navbera komele û saziyên perçeyên Kurdistanê yên din de têkilî û pêwendî kêm in. Ez hêvîdar im ku dê ji niha û pê ve di nava van saziyan de ev têkilî çêbibin."

"Sînorên di navbera erdnîgariya me de em ji hev dûr xistine"

Piştî axaftina Yurttaş, li ser navê Yekîtiya Nivîskaran Dr. Arif Hîto axivî. Nivîskar Hîto diyar kir ku ew tevlî afxavtina Yurtaşî dibe. Hîto berdewam kir û got: „Cara yekem e ku em bi vê minasebetê hatin Amedê. Em pê gelek kêfxweş bûn. Ev rastiyek e, ku bê dilê me kurdan sînor danîn navbera me. Van sînoran em ji hev dûr xistin. Him di warê zimên de him jî di warê civakî û siyasî de cudatî hene. Em hêvîdar in ku dê bi ragihandin û pêwendiyên van komeleyan ev yek kêmtir bibe."

Piştî axavtinê, serokê PENa Kurd a Amedê Sedat Yurttaş û cîgira wî Yildiz Çakar pirtûk diyarî nivîskarên Duhokê kirin.

Li Swêdê kongreya rewşenbîran û festîvaleke çandî

SANDVÎKEN (PK) - Li bajarê Sandvîken li Swêdê, dê ji 08-10.10ê kongreya damezirandinê ya „Yekîtiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê" li dar keve. Di heman demê de, Inîsyatîva Rewşenbîran û Komeleya Kurdên Sandvîkenê dê festîvaleke çandî pêk werînin. Di vê festîvalê de, hunermendên kurd Beytocan, Xweşnav Têlo û Gulîstan Sobarî dê beşdarî ahenga muzikê bibin. Herweha dê pêşangeheke bo hunermendan Dilo Mêqerî, Rehîmo, Zûbêr Yûsiv û Reşîd Hiso li dar keve. Şanogerê kurd Murat Batgî dê stand-upa xwe ya bi navê "Ziman Dirêj" pêşkêş ke. [Program: www.tirej.net/helbestan/12adar.htm]

Hêzên Komara Îranî du ciwanên kurd kuştin

Di sê beyannamên cuda cuda yên Yekîtiya Üoreşgêrên Kurdistanê de, ku li 27,28,29.9.2004ê derçûne, eşkira bû ku hêzên Komara Islamî ya Îranê ev kiryar encamdayne:

1. Spêdeya yekşems 26.09.2004 û li ser rêka bajarê Sine-Merîwan, hêzên Komara Islamî ya Îranê teqe li tirombêleke ji corê "Peykan Bico" kir û di encam de yek ji wan kesên ku di tirombêlê de bû bi navê Cemîl Ibrahîmî giyanê xwe ji dest da.
2. Di heman yekşemê de, hêzên berevaniya Komara Islamiya ya Îran kirêgitiyek bi navê Ehmed Qereçî bi dijwarî birîndar kir û di barekî tendirustî yê xerab daye.
3. Herweha piştî nîvroya heman rojê û ji sedema teqekirina ji aliyê hêzên taybetî yên Komara Islamî ve li ser sînorê Pîranşar-Hacî Omeran di cî de Kurdek hate kuştin.

Hêviyên ji guhertinên li Suriyê û ciyê Pirsa Kurdî di nav de (3/3)



Dr. Ebdulbasit Seyda*

Civata kurd li Suriyê bi tevayî û li Kurdistana Surî bi taybettî civateke geş û çalak (aktîv) e, girêdana xwe ya neteweyî ji mêj de fêhm kiriye, ne mumkun e ji niha û pê de li gor tiştê ku em niha dibînin, nemaze paşî hatina şoreşa kompyutêr û internetê, kesek karibe kesayetiya wê ya neteweyî tune bike.

Lê belê şiyarbûna vê civatê li vir nasekine, lê ew ê di warê têgihiştina rewşa îro û hêviyên ku tên de, her berdewam be. Ev bi xwe jî di dîtin û nerînên hêzên kurdî yên çalak de - çi li hundirê partiyan û çi li derveyî wan - tê xuyanî kirin. Ev hezên han têdighên ku girêdaneke posîtiv û aktîv di navbera girêdana bi Surî ve wek welat (dewlet) û bi Kurdistan ve wek netewe (milet) heye.

Hevdîtin û diyalog û karê hevbeş bi hêzên ereb ên demokrat re pêwîst in, ji ber ku tada heyî bi giştî li ser tevayiya kesan - çi ereb be çi kurd be - dibe, ji bo pêşerojeke baştir ji Suriyê re di çarçewa sîstemeke demokratîk de, ku baweriyê bi cêwaziyê (teedûdî) tîne û rêzê bi bîr û bawerî jê re dike, wekheviyê di navbera hemiyan de di warê maf û daxwaziyan de bi cî tîne, bêyî ku li koka wan a neteweyî, olî û siyasî bê pirsîn.

Hêzên kurd ji bo ku wêneyekî rast ji êşa ku Kurd dikşînin, bigihînin hêzên ereb, kar dikin, da ku ew jî piştgirî û alîkariya pirsa kurd li Suriyê bikin. Lî gel zehmetiyên vî karê han, ji ber ku rêjîma surî şopa xwe ya negatîv di hiş û nerînên xelkê de bi salan bi cî kiriye, em dibînin ku gelek ên ku ciyên sereke di opozîsyonê de digirin, nikarin heta roja îro jî wan bîr û baweriyên ku îdyolojiya serdest bi kar tîne, ji ser pirsa kurd li Suriyê bide alî. Lê li gel vî gişî jî, em dibînin ku danûstandin di navbera hêzên kurd û ereb de, yên di warê opozîsyona surî de - çi wek partî û çi gelerî be –çalak û baştir bûye. Li vir divê bê nîşandan ku nerîn ji pirsa kurd li Suriyê bûye pîvanek û signalek ji bo naskirina rastbûna dîtin û daxwazên guhertinê û demokratiyê li Suriyê.

Pirs ne ew e, ku li vir an li wir nerînek insanî di warê xweşkirinê de bê nîşandan an gotin. Pirs ji wilo bêtir kûr e, ji ber ku îro problêma kurd li Suriyê yek ji wan problêmên sereke ye; mirov nikare di ser re derbas be. Ne guhdanek an çavgirtinek jê re ji alî vê hêzê yan wê hêzê ve hebe, ew bi xwe isbatek necidiyetê yan jî netêgihiştinê ye. Ev bi xwe jî tirs û pirsnîşanan di nava miletê kurd de tîne meydanê.

Tiştê ku îro tê xuyakirin, ti hêviyê nade mirov ku rêjîm wê reformeke rast û durust bike. Tenê mirov sloganan ji wan dibhîze, ew sloganên ku dixwazin rewşê têxin bin kontrola xwe.

Rêjîmê heta îro yekîtiyekê di navbera tiştên heyî û tiştê meşrûe çêdike. Ew rêjîm xwe xwediyê maf dibîne, ji ber ku hêzeke diravî di dest de heye, ku alikariya wê di berdewambûna desthilatdariyê de dike. Ev hêza han a di destê rêjîmê de, ne li ser bingeheke demokratîk hatiye damezirandin û ji ber vê yekê jî mirov nikare li Suriyê behsa parvekirina karûbar di nav dezgehên desthilatdariyê de - parleman, hikumet û dadmendî - bike. Pirsên di vî warî de heyî, dikevin nav xalên hêviyan de, nemaze dibin siya rêjîmeke istixbaratî, ku tu tiştekî ji bilî zagonên awarte pê ve nas nake û ev zagon bi xwe qamikek in, da ku istixbarat çi bixwaze bike û bêyî jê were pirsyarkirin. Ev zagon bi xwe termeke modêrn e ji bo veşartina kirinên dezgehên istixbaratî, yên ku xwe di ser zagonan re dibînin.

Rêjîm li xwe dinere ku ew berê jî û yan niha jî li ser rastiyê e. Yekîtiya neteweyî di nerîna wê de li ser bingehê tobekirina oposîsyonê ava dibe, bi qebûlkirina wê bi gunehê xwe.

Qebûlkirina wê bi durustbuna xala 8ê ya desturê tê, ya ku me li jor behs kir, ew xala ku dibêje Partiya Bees rêbera dewlet û civatê ye.

Rêjîma surî dibîne ku neleqandina siyasî ya bi zor ferz bûye, nîşaneke serketina wê rêjîmê dide xuyakirin. Lê belê yên ku hayê wan ji nêzîk ve ji van tiştan heye, dizanin ku rewşa civakî bi xwe bingeha rûniştina rewşa siyasî ye. Ev tiştê han jî pêk nayê, ille di çarçeweyek demokratîk de bi qîmeta însan, wek insan berî her tiştî din rûdine, maf dide yê ku bîr û baweriyên xwe bi azadî bibêje ji berhemên welatê xwe fêde bike, dûrî wan dezgehên istixbaretî yên ji bilî tirs û nerehetiyê tiştekî jê re nahêle.

Li dawî ez dixwazim bibêjim, li gel hemî tiştî jî, nexş bi carekê ne tarî ye. Em tevde di wê baweriyê de ne, ku guhertinek di rê de ye, lê pirs ew e ku kengî, çawa û heta bi kû ye!?

* Ji Kurdistana Suriyê ye. Dektoraya felsefeyê ji Zanîngeha Şamê wergirtiye û li du zanîngehên Libyayê mamosteyetî kiriye. Ew niha li Li Swêdê dijî û li Zanîngeha Uppsalayê xwendina xwe berdewam dike.

abdulbasets@hotmail.com

Xuşxuşok

Mişel Temo - Qamişlo

Di xeleka derbasbûyî d, me danasîna yasayên awarte anî holê û di vê xelekê de emê li ser hin encamên pêkanîna yasayên awarte di civata Sûriyê de rawestin .

Gava yasaeyek hebe ku destên dezgehên parztinê azad bike, helbet mirov wê di civatê de li bobelatan rast bê. Wisa jî destberdana paraztinên Suriyê li şûna xwe civatek şikestî û windayî hiştiye û hîn jî di pêvajoya zordariyê de berdewam e. Tevlî ku dem hatiye guhertin û gelek guhertinên siyasî di cîhanê û Rojhilata Navîn de çêbûne, lê dezgehîn paraztinên welatê me her û her berhemên mejiyê xwe yê girtî dubare dikin.

Hêjayî gotinê ye, ku xerabiya paraztinê bi fermandariyeke rewabûyî têne paraztin, da-ku endamên dezgehan neyên tawanbarkirin û li gel çi bikin jî, bê guneh derkevin. Loma jî bi nimra 14ê di 15.01.1969ê de, fermandariyek rewabûyî belav bû û di benda wê ya 16ê de wisa hatiye nivîsandin: "Pirsiyan ji endamên dezgehên paraztinê qedexe ye û çênabe ew ji bo gunehkariyên bi wan re çêdibin gava hardariyan pêk tînin, bêne dadgehkirin."

Bi vî awayî jî bobelatên parztinê têtin paraztin. Ji xwe gava pirsiyan tune be û azadiya gunehan paraztî be, helbet wê rahatinên zordariyê li ber çav bin.

Ji blî wisa jî, dadgehên awarte hatin avakirin, ji wan jî dadiya paraztina dewletê ya ku tenê bi dezgehên paraztinê ve girêdayî ye û tu destûr an jî yasa li ser pêk nayê.

Ev dadgeha awarte armanca wê çewisandina mirovên hevrekî ye, yên ne wek rêjîmê diramin an jî dixebitin an jî bi baweriyê li dij Bees dijîn. Wisa jî mirov dikare bêje, ku ji encamên yasayên awarte û dûvên wê, belavkirina çanda tirsê di civata Suriyê de ye. Ev çand jî mirov heta karibe jiyana xwe biparêze yan jî berdewam bike, divêt ku çavgirtî be û mejîsekinî be û guhxetimî be!?

xetire@yahoo.com

Em siya kerê ber bi hêla we ve naşînin



Rojan

Bi rastî pêşketinên li başûrê Kurdistanê wê rojekê bibin sedema rawestandina dilên rayedarên Tirkiyê. Her ku gaveke nû ber bi avakirina Kurdistanê ve tê avêtin, hup radibin hup rûdinin, fobiya Kurdistanê sinir û esebên wan tarûmar dike. Îcar jî alaya li ser balafirên Kurdistanê bûye kelem di dilê wan de. Serokwezîrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî di serdana xwe ya Tirkiyê de ji rayedaran re mijara Tîloyeke balafirên rêwiyan ên Kurdistanê vekir û daxwaz kir ku pêwistiyên lênêrîn, îkmal û rawestandinê yên balafiran li balafirgehên bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bên bersivdayin.

Rayedarên Tirkan ev bersiv da: "Em erênî dibînin, dikanin destûrê bidin, lê divê alaya Kurdistanê ne li ser wan be; em jinajeke ku xerakirina yekgirtîbûna Iraqê armanc bike, naxwazin."

Heyran, em zanin hûn naxwazin û ku ji destê we bê, hûnê ne tenê alayê, lê hemû tiştên kurdî ji rûyê erdê rakin. De were gotineke pêşiyan heye: "Dinya siya kerê ye; geh li vî alî, geh li wî alî ye."

Ma qey hûn nabînin, carekê ji ber bi hêla me ve hatiye ev siya kerê, û tu nêta me tune ye ku em disa ber bi hêla we ve bişînin.

ji nasname.com

Terorîstan welatiyekî kurd li Musilê kuşt

Li bajara Musilê, sêşema borî danê êvarê terorîstan welatiyekî kurd bi navê Mihemed Kurdî kuşt. Kurdî karmendê rêkxiraweke biyanî bû li Musilê. Jêderên li Musilê diyar kir, ku ev bûyer li kazîneya zanîngehê pêk hat. Terorîstên çekdan ji tirimbêlekê peya bûn û çar gule avêtin li seriyê welatiyê kurd.

Hevpeyvîn bi dîrektorê "Theater an der Ruhr" Roberto Ciulli

„Ji ber ku Kurd destan dişewitînin, kes naxwaze dest bide wan"

Komeke şanogerên ji Kurdistanê bo pêşkêşkirina şanoya xwe ya bi navê „Welatî Seriyan" hatine Elmanyayê. Ev şano ku ji aliyê Niyaz Letîf ve hatiye nivisandin, dê roja 05.10.2004ê derbarê festîvala şanoyan a bajarê MŞlheim an der Ruhr bête pêşkêşkirin. Ev şano xebateke xwendekarên Akademieya Hunerê li Başûrê Kurdistanê ye. Bi taybetî bi xebata dîrektorê "Theater an der Ruhr" Roberto Ciulli* û herweha şanogerê kurd Ferhadê Feqî şanogerên kurd dikarbûn werin Elmanyayê. Li ser xebata hunerî ya Roberto Ciulli, şanoya kurdî û pirsgirêkên dan û standinê bi Kurdan re, Peyama Kurd ev hevpeyvîn li gel Roberto Ciulli pêk anî.

Hevpeyvîn: Seyîdxan Kurij



Peyama Kurd: ***Ezjiyektemaşewanên Theater an der Ruhr im. Di tiyatroiya we de şanoyên li ser pirsên koçberan têne pêşkêşkirin. Li Elmanyayê bi taybetî di tiyatroyên bajaran de pirsa koçberan pir nakeve rojevê. Bi çi motîvasyonê û filozofiyê hûn vî karî dikin?***

Roberto Ciullî: Ez bi xwe îtalî me. Ez li Mailandê hatim dinyayê û bi salan e ku li Elmanyayê kar dikim. Ez zimanê dayika xwe dipeyivim, elmanî dipeyivim û bi salan leystikên xwe bi elmanî çêdikim. Ez xwediye nasnameyeke interkulturêl im û pirsên ku li vir biyaniyan alaqadar dikin, kêm-zedê min jî alaqadar dikin. Li ser vê dinyayê kesî qaîm tune, her kes biyanî ye. Divê ku Ji ber wê ez li ser pirsên koçberan disekinim. Di binê wan leystikên min de filozofiyek wisa heye.

Ji bo mirovên ku ji netewe, çand, ol û fikrên cihê tên, ji hevûdu nas bikin, ji hevûdu fam bikin, ji bo dan û standinên di navbera gelan de, çanda şanoyê dikare roleke çawa bilîze?

Zimanê şano înternasyonal (navneteweyî) e. Çimkî zimanê şano zimanê hebûnê we. Şano pirek e di navbera dîskurs û helbestvaniyê de. Ji bo min înternasyonalîbûna şanoyê pir pêwîst e. Divê derhêner û şanoger leystikên xwe bi rihekî înternasyonal pêk bînin û bilizîn. Helbêt çîrokên leystikan dikarin neteweyî bin, bi çanda neteweyekê hatibin hunandin. Lê leystik di dawiyê de bi hebûnê, bi mîmikan tên lîstin. Zimanê mîmikan tune, zimanê mîmikan zimanê hemû mirovan e. Tu leystikekê bi elmanî jî bilizî, hemû mirov dikarin wê fam bikin, peyama leystikê têbigihêjin. Me gelek leystik bi elmanî li Elmanya û li welatine din jî lîstine. Heman leystik li Enqere, Stenbol, Tehran û Baxdayê ji MŞlheimê baştir hatine famkirin. Ji ber wê şano dikare ji bo dan û standina gel û çandan roleke pir erenî bilîze. Pir caran siyasetvan navbera gelan xira dikin, lê hunermend wê dijminayetiya di nav gelan de vediguhezînin dostaniyê.

Taybetiyek şanoya we heye. Hûn pir caran karên ku kes cesaret nake bike, dikin. Wek mînak: dewletên nedemokrat û ji aliyê dîktatoran ve têne birêvebirin, mafê mirovan binpê dikin, gelê xwe diçewisînin û mafê netewe û kêmneteweyan nas nakin, hûn diçin li wan devwletan şanoyan dilîzîn. Hûn bi çi armancê vî karî dikin?

Rast e, em pir caran çûn hin welatan ku li ser wan boykoteke navneteweyî hebû. Wek mînak, em di sala 1980ê de çûn Tirkiyê û me li Stenbol, Enkara û Mersînê leystikên xwe pêşkêşî temaşenanan kirin. Em 1998ê çûn Îranê û 2002ê çûn Iraqê.

Divê mirov dewlet û gelan ji hev cihê ke. Boykot pir caran dethilatdariya dîktatoran pît dikin, lê zerar didin gelî. Bi boykoteke politikî dîsa jî mîrov dikare hin tiştan pêk bîne, lê boykotên çandî bê wate û bê armanc in. Gava li ser dewletekê boykota çandî hebe, gelên ku di nav sînorên wan dewletan de dijîn, ji dinyaya derveyê bê xeber diminîn, îzole dibin, ji pêşveçûnên aliyên polîtîk, sosyal û çandî bê xeber dimînin. Bi vî awayî, dîktator dikarin bi hesanî desthilatdariya xwe bidomînin. Welatên komonîst ên berê wisa bûn, Îran û Iraq wisa bûn.

Ez nabêjim me si riya şanoyê re guhertinên mezin di wan dewletan de pêk anîne, lê ji bo guhertin rola me jî hebû. Me li wan dewletan hemû leystikên xwe bê sansor pêşkêş kirin û pir caran jî me bi leystikên xwe sîstemên ne demokratîk rexne kirin.

Niha jî kes naxwaze bi Kurdistana başûr re dan û standinan çêke, lê me hewil da ku komeke şanoyê bînîn Elmanyayê û derfetê bidin wan ku ew hunera xwe pêşkeşî temaşevanan bikin.

Ezê werim wê pirsê, lê berê ez dixwazim ji we hîn bibim, bê we çawa Kurd û pirsgirêka Kurdistan nas kirin.

Weku min berê jî got, em di salên 1980ê de çûn Tirkiyê. Carekê me leystikeke Jean-Paul Sartreyî bi navê "Miriyên bê gor", ku li ser işkenceyê bû, lîst. Ez tu car nehatime girtin û nehatime işkencekirin. Ji bo ku ez vê leystikê baş çêkim, min li ser işkenceyê lêkolîn kirin. Di wê demê de, li Tirkiyê û Şilî işkence pêk dihatin. Min di weşanên Amneyty International de li ser Tirkiyê pir tişt xwendin. Gava tu li Tirkiyê li ser işkenceyê rawestî, tu rastî Kurdan tê. Çimkî kesên ku li Tirkiyê dihatin işkencekirin, piraniya wan Kurd bûn. Min berê Kurd û pirsgirêka Kurdistan wisa nas kir. Gava me di salên 1980ê de ew leystika Kafkayê lîst, ew li Tirkiyê bû skandal. Di wê demê de, ku li Tirkiyê işkence wek karekî normal dihat hesibandin, pêkanîna leystikeke wisa ne hêsan bû. Lê me bê sansor leystika xwe pêşkêş kir.

Gava em wek koma şanoyê diçûn Tirkiyê, min li wir gelek întelektuêl nas kirin. Lê li Tirkiyê Kurd veşartî ne. Tu mirovekî mîna Tirk nas dikî, piştre derdikeve ku ew Kurd e. Piraniya intelektuêl, nivîskar, helbestvan, leystikvan û derhênerên navdar kurd in, lê mîna tirk tên naskirin. Min berê Kurd wisa naskirin, lê di van salên dawî de eêdî ne gengaz e ku kesekî rewşenbîr li ser pirsgirêka Kurdistanê ne agahdar be.

Hûn çawa û bi çi armancê dest bi dan û standinên bi Kurdan re kirin?

Ez hîn bûme ku karên bi rîsîko bikim; bi gotinên din: dest bavêjim patatayên şewîtî. Ji ber ku îroj Kurd destan dişewitînin, kes naxwaze dest bide wan. Niha pirsgirêka Iraqê di rojevê de ye, lê Kurdistana başûr hatiye îsolekirin. Em dixwazin bi riya hunerê wê îsolasyona li ser Kurdan rakin. Bi alîkariya hin Kurdên ku bi salan li Theater an der Ruhr dilîzin, bi me ji Kurdistana başûr du kes vexwendinî Elmanyayê kirin. Di zivistana vê salê de ji Hewlêrê derhêner, leystikvan û parlamenter Ehmet Salar û ji Silêmaniyê derhêner û leystikvan Gezîze Umer Elî hatin Elmanyayê. Me li vir bi hev re biryar stand, ku em biçin Kurdistana başûr. Di bihara vê salê de, ez û leystikvanê şanoya me Ferhad Feqî çûn Şamê. Lê mixabin em piştî bûyerên Qamişloyê çûn û ji aliyê din jî di heman demê de Benî Sadr serî hildabû. Ji ber şerê navbera hêzên hevpeyman û mirovên Benî Sadr, serleşkerê hêzên hevpeyman ji Suriyê xwastibû ku sînorên xwe kontrol bike. Çimkî Emerîka îddîa dikir, ku terorîst ji Suriyê diçûn Iraqê. Suriyê ew kir hincet û nehişt em biçin Kurdistanê. Em ji Şamê heta li ser sînorê Kurdistanê bi qasî 1000 km çûn, lê em dîsa vegeriyan hatin Şamê. Me dixwast biçin Hewlêr û Silêmaniyê. Ji bo me bernameyeke pir dewlemend hatibû amadekirin. Em ji aliyê serokê hikumeta Kurdistanê birêz Nêçîrvan Barzanî ve hatibûn vexwendin. Me dixwast em hunermend û rewşenbirên Kurdistanê nas bikin û bi wan re li ser hin projeyan kar bikin. Lê dîsa jî wan ji Kurdistanê ji bo me çend DVD şandin. Me li vir li ser DVDyan temaşeya çend leystik kir. Me ji wan leystikan a ku ji aliyê Akademiya Hunerê ve hatiye amadekirin, ji bo vexwendina festîvala xwe hilbijart.

Dîsa em dixwazin vê leystikê di çend dibistanan de pêşkêşî xwendevanên ciwan jî bikin û bi vê munasebetê navbera ciwanên elman û Kurdan de peywendiyan pêk bînin.

Hûne bi gelêk şanoyên biyaniyan re kar dikin. Gava hûn wan bi Kurdan re bidin ber hev, çi pirsgirêkên Kurdan hene?

Kurd li başûrê Kurdistanê de facto dewlet in, lê ew dewlet di qada navneteweyî de fermî nehatiye pejirandin. Ji aliyê din, derûdora Kurdan girtî ye. Em li vir li balafiran siwar dibin, li Stenbolê, li Tehranê peya dibin. Lê Kurd ewqas rehet nikarin derkevin. Tirkî, Îran û Suriyê problêman derdixînîn. Weku min berê jî got, me dixwast biçin Kurdistanê, lê em bi ser neketin. Ez bawer im ew pirsgirêk dê çareser bibin.

Ji bo pêşerojê çi planên we hene?

Ez dixwazim carekê biçim Kurdistanê û li cîh bibînim bê hunera şano di kîjan qonaxê de ye. Em dixwazin li wê derê ji bo ciwanan projeyan çêkin. Ez dixwazim êdî ji Kurdistanê şanogeran vexwendî her festîvala me yên şanoyê bikim. Ya giring ew e, ku ez hewil didim ku şanogerên Kurdistanê bikim endamên International Theater Institut (ITI). ITI rêxistineke girêdayî UNESCO ye. Heta niha tenê dewlet endamên ITI ne, lê ez dixwazim ITI bibe rêxistineke çandan. Ez hewil didim ku şanogerên ji gelên ne xwedî dewlet bikaribin bibin endamên ITI.

Û

** Roberto Ciulli (1934) li Mailandê ji dayik bû. Wî xwendina filozofiyê de dektora wergirtiye û bi 26 saliya xwe "Thetare II Globe" li Mailandê damezirandiye.*

Divê em ji bo pêşerojê amade bin

Keya Îzol*



Keya Îzol

Pewendiya Tirkiyê û Yekîtiya Ewropayê (YE) nêzîkî 40 sal in berdewam e. Îsal bi ihtîmaleke mezin cara pêşî wê YE ji bo destpêka pêvajoya endametiya Tirkiyê ji bo YE demê destnîşan bike. Di nav van 40 salan de, Tirkiyê bi hemû hêzên xwe (siyasî-dîplomasî-tîcarî-kulturî) ji bo realîzekirina daxwazên xwe di nav hewildaneke xurt de bû. Bi taybetî piştî sala 1999ê û vêde, xebata wan zêdetir ber bi armancên xwe meşiya. Heta sala 1999ê, opozîsyona Tirkiyê di warê demokrasî, mafê mirovan, pirsa kurdan û Qibrisê de, gelek qels bû. Piştî civîna Helsinkî di 1999ê de, ku di bin serokatiya Finlandayê de pêk hat, rewşa Tirkiyê ket merheleyeke nû. Salên paş, opozîsyona wan her çû xurtir bû.

Li hemberî wê, opozîsyona kurdan her çû qelstir bû. Nebûna "dengê yekgirtî yê siyasî" yê kurdan sebebê herî esasî yê vê yekê bû. Ev rewş hê jî berdewam e. Yek ji xebatên balkêş ku Tirkiyê derveyî tesîrlêkirina dewletên YE danîbû pêşiya xwe, xebata guhertina helwestên hin muxalefetên kurdan bû. Du armancên vê yekê hebûn: qelsxistina muxalefeta kurdan û kêmkirina bandora wan li cem ewropiyan. Diyar e xebata wan encam da. PKK, HADEP û derdora wan bi awayeke eşkere bê qeyd û şert piştgiriya endametiya Tirkiyê ji bo YE kir.

Xebatên lobî û muxalefetên ku derveyî van gurûpan her çend li gor berjewendiya kurdan dihat meşandin, wek xebat Platforma Kurdên Ewropa, Hak-Par û gelek dezgeh û rêxistinên sîvîl û demokratîk li hundir û derveyî welêt, dîsa jî ji ber bêkoordînasyonbûna di navbera wan bi xwe de, rê neda ku ew bikaribin bi xurtî li ser raya giştî ya YEyê tesîr bikin.

Nuqteyeke esasî di peywendîya YE û Tirkiyê de, krîterên siyasî yên Kopenhagenê ne. Tirkiyê ji destpêkê heta roja îro jî muqabilê şertên YEyê wan xwestiye ku dîtinên xwe li ser YEyê ferz bikin. Wek nimûne, li her derên YE navên hemû gelan, zimanan an jî kêmneteweyan bi nav û bi awayekî eşkere tê behskirin, wek gelê bask û Baskien, Katalan û Katalanya li Îspanyayê. Bi zextên Tirkiyê navê kurd, kurdî, gelê kurd an jî Kurdistan ji hemû belgeyên YE hat derxistin. Yanî bi gotineke din, Tirkiyê şertên xwe bi YE da qebûlkirin. Lobiya Kurdan (siyasî-sîvîl û demokratîk) nikaribû pêşiya vê yekê bigire, ji ber ku hêzeke xurt a siyasî ku bikaribe bi xurtî mudaxeleyî pêvajoyê bike yan jî berdevkiya gelê kurd bike, nebû. Ev naye wê maneyê ku qet tu xebat û hewildan çênebûne. Bilekîs, rêxistinên siyasî, sîvîl û demokratîk ên kurdan di nav xebateke hêja û giranbiha de bûne, lê hêza wan têrê nekir ku ew bikaribin qasê ku pêwîst bû, tesîrê li ser raya giştî ya YE bikin.

Îro hemû hevdîtin, bazarî û planên ku di navbeyna Tirkiyê û YE tê meşandin, derveyî îradeya Kurdan pêk tên. Kurd li wir temsîl nabin, loma jî lihevhatina wan wê bê guman li hember berjewendiya kurdan be. Ji ber ku îro mecala me ya mudaxeleyê gelek qels e, divê em xwe ji bo pêşerojê amade bikin. Ji zerarê veger, kar e.

Pêvajoya YE û Tirkiyê wê berdewam bike û wextekî dûrûdirêj li pêşiya me ye. Kurd divê di vê şirîkatiyê de wek xwediyê malê, xwedî gotin be. Ji sisiya yek nifûsa Tirkiyê kurd in. Herweha ji aliyê din ve jî wek nêzîkî milyonekî kurdên Ewropayê em di nav vê pirsê de ne. Li gor vê rastiyê divê kurd xwedî gotin bin. Lê ew maf bi destê dewleteke ku hebûna me 82 salan înkar kiriye, nakeve dest. Divê em bi xwe hêzên xwe yên siyasî li ser bingeha muşterekên xwe yek bikin û bi plan û bername bikevin nav xebatê.

Xebatên Platforma Kurdên Ewropayê, Hak-Par û gelek dezgehên demokratîk ku di van rojan de wê pêk werin, giring in. Dereng be jî, divê em piştgiriyeke xurt bidin van xebatan û tu car nekevin rewşeke bêhêvîtiyê. Kurd di warê siyasî de qels bin jî, wek realîte û pirsgirêkeke siyasî îro di rojeva dinyayê de ne. Tu hêz an dewlet wê nikaribe li ser înkara Kurdan siyasetê bimeşîne yan jî wê li ser gelê me bide ferzkirin. Divê Kurd di pirsa YE û Tirkiyê de heta biçûktirîn şertên xwe jî gavên xwe paşde neavêjin. Hemû mafên Kurdan divê di yasaya esasî ya Tirkiyê de cî bigirin. Ev pêvajoya bazariyê ye. Divê em argumentên xwe yên rast û rewa bînin ziman û li gor wê bikevin nav xebateke xurt. Tirkiyê wê li gor xebat û helwesta Kurdan mecbûr be dev ji siyaseta xwe ya înkarê berde.

* Serokê Federasyona Komeleyên Kurd li Swêdê yê berê

Ji mirovên nefam re dibêjin "Kurd"!



Silêman Alîxanî

Erebên iraqî, belkî bêtiriya ereban bi şêweyeki berfireh çirok û pêkenînan li ser nefamiya kurdan divehînin. Herwesa di civîn û rûniştinên nav xêzanên wan de, dema yek ji wan ji mijarekê fêm neke, ew jê re dibêjin: "Ma qey to kurd î?", yan dibêjin: "Dev ji vî berdin; ev kurd e!", anku nefam e. Wateya peyva kurd di ferhenga van ereban de li şûna peyva nefam tê bikaranîn.

Ez naxwazim li vir pesnê ereban bidim an bêjim ku ereb neteweyeke têgehiştî ye, belkû temamen berevajî vê çendê ne. Lê di heman dem de, ez dibêjim ku rast e kurd nefam e!

Helbet ev nêzîkî 14 salan e li başûrê Kurdistanê azadî heye û kurd bi xwe fermanrewatiyê li xwe dikin û mirovên jêhatî û xudan xebat û qurbanîdan serkêşiya partiyên kurdistanî yên desthilatdar dikin. Lê wan ta niha nekariye bi hev re û bi ruhekî birayane kar bikin û arîşeyên xwe yên partîyetî û yên taybetî ji bo demeke kurt û kêm bidin alîkî, ta pirsa federalîzm an dewletbûna Kurdistanê misoger bikin û wê ji gefên dijminan biparêzin.

Mixabin li şûna hevgirtinê û pêkve karkirinê di bereyekî de li beramberî dijminan, "partiyên kurdistanî yên desthilatdar li hemberî yek dirawestin û rêkê li hevdu digirin û eger li Hewlêrê, ku Partî Demokratî Kurdistan desthilatdariyê lê dike, endamekî Yekîtî Niştîmanî Kurdistan hate girtin, li beramber li Silêmaniyê jî, ku Yekîtî desthilatdariyê lê dike, wê endamekî Partî bête girtin, çi tawanbar be yan ne! Yan dema komîteyên hevbeş ên herdu partiyan biryaran didin, zû bi zû wan biryaran bi cî naînin û her partiyek dimîne li hêviya partiya din ji bo ku pêngava yekem bavêje, da ew jî li beramber pêngavekê pavêje."*

Bi rastî ev rikeberiya di navbera van partiyan de, tiştekî gelekî xirap û bi tirs e li ser doza kurdî, çunkî wek em hemî dizanin, şerê birakujiyê li sala 1994ê bi van kiryarên biçûk û bê raman dest pê kir, ta li dawiyê bûye şerekî mezin û xwîna bi hezaran lawên kurd rijiya.

Li vir ez dibêjim: Eger serekanî zelal be, co û berco bi xwe zelal dibin. Lê eger serekanî şêlî be, co û berco tu carî zelal nabin, anku eger serkirdayetiya van partiyan li hev bikin, endamên wan otomatîkî wê li hev bikin. Lê mixabin ev tişt nebûye.

Meric nîne ku serkêşên van partiyan li ser arkanên Tv derkevin, bi hev re rûdinên, digirnijin û dibêjin "peyv û biryara me yek e", çunkî bi kiryar tu tişt diyar nîne. Bo nimûne dibêjim, di demekê de ku birêz Mesud Barzanî biryar daye ku êdî alaya dewleta Sedamê kurdkuj li Kurdistanê nayê hildan û ev biryar li Hewlêr û Duhok bi cî tê, li Silêmaniyê ta niha ev ala li tenişt alaya pîroz a Kurdistanê hîn bilind e. Her çende ku hikumeta Silêmaniyê sed der sed dizane ku ev tiştekî di ciyê xwe de nîne û beriya niha jî, anku li ser dema Sedamê dîktator wan ev ala nerakirye, lê diyar e ji ber ku biryar ya Partî ye, divê Yekîtî berevajî bike, çunkî kurd wesa hizir dikin, ku eger wan bi ya birayê xwe kir, tê wê wateyê ku birayê wan ji wan xurtir e û ev di hizra wan de kêmatî û şermeke mezin e.

Gelo mane tiştekî seyr e ku bêtiriya endamên serkirdayetiya van herdu partiyan jiyan û xwendina xwe li Ewropa demokrat derbas kiribin, lê berevajî yasa û sîstemên ewropiyan kar dikin û li şûna sindoqên dengdanê ji bo bidestveanîna serketinê dijwariyê bi kar tînin, di hevrikiyekê de ku tenê dijminê kurd tê de serketî ye!?

Gelo ma eva me li serî gotî ne nefamî ye? Ma nefamiya bi şax e?

** Rojnameya Hawlatî, hejmar 191 û 192.*

silemani_alixani@yahoo.com

"Divê Tirkiyê Pirsa Kurdî çarser bike û piştre bibe endama Yekîtiya Ewropayê"

Wek tê zanîn, di 12ê çileya pêşîn de wê di navbera Tirkiyê û Yekîtiya
Ewropayê de bo endametiyê pêvajoya dan û standinan dest pê bike. Berî destpêkirina guftûgoyan di meha çiriya pêşîn de, Yekîtiya Ewropayê dê li ser rewşa Tirkiyê raportekê biweşîne. Tirkiyê lobiyên xwe yên li
welatên ewropî bi hemû hêzên xwe bi kar tîne. Rojên pêşiya me ji bo
Tirkiyê û bi taybetî ji bo Kurdan gelekî giring in.
Kurd jî dixwazin tev li pêvajoya endametiya Tirkiyê bo YEyê bibin. Li Tirkiyê HAK-PAR dixwaze daxwazên Kurdan di dezgehên YEyê de bîne ziman.
Peyama Kurd xwest ku bîr û baweriyên rêxistin û kesaytiyên
Kurdan bigihînin raya giştî ya Kurdan. Pirsên ku me ji wan re şandin, ev in:

1. Hûn ketina Tirkiyê nav Yekîtiya Ewropayê çawa dinirxînin? Wateya wê ji bo kurdan çi ye? Ji bo kurdan aliyên vê yekê yên erênî û nerênî çi ne?

2. HAK-PAR û Platforma Kurdên Ewropayê di derheqa vê mijarê de raport weşandine. HAK-PAR dê 25ê vê mehê bi navê „Ji Amedê ber bi Brûkselê ve" çalakiyekê li dar xîne. Hûn vê çalakiyê çawa dibînin û divê kurd çi bikin?

Ta niha bersivên PADEK, RSDK û PIKê gihiştin me.

Partiya Azadî û Demokrasiya Kurdistanê (PADEK):

Divê mirov ne li dijî endametiya Tirkiyê be!

Helbet gava endametiya Tirkiyê ji bo Yekîtiya Ewropayê tê rojevê û îro jî di rojevê de ye, em Kurd di pencereya xwe de li meselê dinêrin. Em dibêjin, divê nasnameya Kurdan a neteweyî û hemû maf û azadiyên ku bi vê nasnameyê ve girêdayî ne, di Qanûna Esasî ya Komara Tirkiyê de weke mafên kolektîf bên bicîhkirin û garantîkirin. Em pê re ne ku "Pîvanên Kopenhagenê" bi temamî û bê kêmasî bi cî bên. Lê di eslê xwe de pirsa Kurdan ne li gorî "Pîvanên Kopenhagenê" ye, ne em xwe wek kêmnetewe dibînin û ne jî dewlet û hikumeta Tirkiyê me kêmnetewe qebûl dikin. Pirsa kurdî pirseke komplêt e, meseleya mileteki ye. Beriya ku Tirkiyê bibe endama YEyê, divê ew bi azadî û bi riyeke demokratîk
biryara xwe li ser duweroja xwe bide.
Pîvanên Kopenhangê yên siyasî ji demokratî, serdestiya huqûqî, mafê mirovî û paraztina mafê kêmnetewe-yan pêk tên; divê her berendamên vê yekîtiyê van şertan bi cî bîne. Li gorî baweriya me, dema ev şert ji aliyê
Tirkiyê ve bê kêmasî pêk bên û demokratiya Tirkiyê bigihêje radaya
demokratiya Swêdê yan jî Belcikayê, dê riyeke demokratîk ji bo
çareserkirina Pirsa Kurdî vebe û ev rê wek çirûskek be jî, divê em vê
çirûskê bi kar bînin û gurr bikin. Di vê çerçeweyê de, divê meriv ne li
dijî endametiya YEyê be. Em ji bîr nekin, ku îro 1/3 nifûsa Kurdan li
metropolê dijîn an jî bi cî bûne û pêkanîna Pîvanên Kopenhagenê dê
rewşa wan baştir bike.
Rewşa siyaset û siyasetvanên Kurdên Bakur ber çavan e; ew potansiyaleke mezin in, lê ne li ser hev in. Ji xwe em wek rêxistin endama Platforma Kurdên Li Ewropayê ne. Divê him Platform him jî HAK-PAR li gorî bang û programa ku ji bo endametiya Tirkeyê pêşkêşî YEyê kirine, li gorî wê jî bikevin nav hewildanan. Lê çendekî berê, berpirsê firehkirina YEyê çû Enqere û Diyarbekirê. Serok an jî berpirsên HAK-PARê dikarîbû daxwazên xwe yên ku wek raport kiribûn ingilîzî, pêşkêşî Gunter Verheugen kiribana û dikarîbû biketina rojevê jî. Lê wan ev tişt nekir û dê bi otobusekê herin Belcikayê. Di encamê de, yên ku bi dîtinên wan re ne, divê piştgiriya xwe nîşanî wan bidin û hewil bidin ku beşdarî çalakiya wan bibin.

Partîya Îslamiya Kurdistan (PÎK):

Pêwîste ku miletê Kurd temsîleke neteweyî çebike!

Endametiya Tirkiyê ya Yekîtiya Ewropayê ji bo gelê kurd pirseke giring e. Miletê kurd bi sedsalan têkoşînê ji bo mafên xwe yên insanî û fitrî bi bedelên gelekî mezin dane û didin. Ev bedelana ji bo gelê heremê jî bû ronahî. Divê Kurd bi hemû gelên cihanê bidin zananîn, ku kurd jî wekî hemû gelan mafên wan ên insanî û fitrî heye û divê qedera xwe bi azadî tayîn bikin.
Hetanê nuha YE derbarê endametiya Tirkiyê miletê kurd wekî teref muhatep negirtiye. Ji bo çareseriya Pirsa Kurdî pêwîst e ku miletê kurd temsileki neteweyî çebikê. Divê ew temsîliya neteweyî bi program û projektekî siyasî ya neteweyî xwe bigihîne YE û bikaribe xwe wek teref bi YEyê bide qebulkirin.
Endametiya Tirkiyê ya YE ji bo pêşketinek di warê siyasî, demokratî, aborî û insanî de bona gelê me û hemû gelên Tirkiyê baş dibe.
Em wek Partiya Îslamî ya Kurdistan tirsa me derbarê endametiya Tirkiyê ya YE ew e, ku mafên kurdan wek mafên insanî werin qebulkirin, ne wekî mafên siyasî û neteweyî.
Pêwîste ku kurd di zûtirîn demê de temsîlekê derxînin, ku mafên miletê Kurd yên neteweyî bi YEyê bide qebulkirin.
Em wekî PÎK çalakiya HAK-PARê baş dibînin û piştgirtiya wê dikin.

Rêxistina Sosyalist a Demokrat a Kurdistan (RSDK):

Divê em li dijî endametiya Tirkiyê derkevin!

Ev demek dirêj e, ku Yekîtiya Ewropayê di tu rapor û weşanên xwe de navê kurd naxebitîne. Navê Kurdistan ji xwe ji berê de di nav dokumentên fermî de weke ku hatibe qedexekirin, nedihat xebitandin, lê niha wanê ye ku navê kurd jî hatiye qedexekirin.
Ev aliyekî rewşê ye ku ji bona YE pirsgirêka Kurd û Kurdistanê tune ye,
yan jî ji rojevê gelek dûr e.
Tiştekî din heye ku gelekî girîng e û pêwîst e, divê her Kurdek li ser pir
baş bifikire: Ji bona Ewropiyan an jî hêzên êmperyalîst pirsgirêka
neteweyî nema ye. Daxwaza pirsa neteweyî bêyî ku fêda wan ya di warê aborî, leşkerî û siyasî de tune be, daxwazek kevneperestî û şûnda
kişandina dîrokê ye. Ji ber ku sermaye ber bi globalîzmê ve diçe, ji
bona wan dem ber bi yekîtiyan ve, yekîtiyên berjewendiyên sermayedariyê ve diçe. Dem ber bi firekirin û xurtkirina bazarê ve diçe. Ev di warê propaganda û bi her rêyên perwerdekirina civakê de jî gelek xurt pêş dikeve. Her ku diçe, neteweyên di rewşa me de nikarin derdên xwe bi gelên van welatan jî bidin pejirandin, û her diçe ev jî bona me ber bi xirabûniyê ve diçe. Gava ev mêtinkaranan têkevin nav YE, yanî bibin endamê hêzek ewçend mezin, pirsgirêka me jî pê re ewçend mezintir dibe. Em niha nikarin derdên xwe bigihînin kesî. Gelo wê gavê emê karibin derdê xwe bigigîhinin kê? (Rewşa bernameya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ji bona guhertina Rojhilata Navîn ji ber rewşa berjewendiyên cuda pêwîst e ku li derveyî vê rewşê, ji ber taybetmendiyan pêwîst e, bi taybetî jî li ber çav bê girtin û cuda bê şirovekirin.)
Gelo heta ku Kurdistan mêtîngeh be, parvekirî be, tu mafekî wî yê neteweyî tune be, bi vê rewşê re mêtinkarên Kurdistanê di nav pêwendî û hevpeymanên berfire de bin baş e, yan têkiliyên wan teng bin,
hevpeymanên wan kêmtir bin baş e? Yanî dostên dijminên me gelek bin,
an hindik bin çêtir e? Ji aliyê din ve, ji çar perçeyên Kurdistanê tenê
perçeyekî Kurdistanê, ew jî bi rêya Tirkan û di bin destên wan de têkeve nav Yekîtiya Ewropa, gelo ev nayê wateya perçebûyîna bêdawî ya Kurdistanê û neteweya kurd?
Bê guman gava Tirkiye têkeve nav YE, di warê kesayetî de wê pêşketinek, hêsaniyek bi xwe re bîne, di warê aborî de pêşxistinek bi xwe re bîne.
Lê di warê neteweyî de xwanê ye ku tu pêşdexistinan bi xwe re nayne, lê
bêtir dikare windabûneke dûr û dirêj bi xwe re bîne. Em Kurd nikarin
berjewendiyên xwe yên kesayetî bidin pêşiya berjewendiyên neteweyî. Em nikarin bêjin ku endametîbûna YE, ku dê ji me re di warê aborî û mafê kesayetî de destxistinan bîne, têxin pêşiya berjewendiya neteweyî, ku xwanêye wê endametiya wan astengên mezin derxe pêşiya tevgera doza azadîxwaz a neteweyî ya kurd.
Em dibêjin bi vî rengî endametiya Tirkiyeyê li dijî berjewendiya neteweyî ya kurd e. Ji ber vê jî pêwîst e ku em kurd li dij derkevin.

Hohshnav Sleman

MUHASEBE
(Buchführung)

Von Guericke Alle 21, 53125 Bonn
Tel.: 0228 – 29 83 07 • Mobil: 0170 – 32 44 831
eMail: sleman@web.de



HAIR
fine cut
Media

Sertaşê te yê kurd li bajarê Essen

Δ Hemû şêweyên porjêkirinê.
Δ Ji bo mêr û jinan.
Δ Em amadekariya bûkan jî dikin.

Kreuzeskirschstraße 21
(Ecke I. Weberstr.)
45127 Essen
Tel: (0201) 4375734

Kesê ku vê reklamê bi xwe re bîne, porê wî 40% erzantir tê jêkirin.

Tiliya dewleta tirk di bûyerên Kerkûkê de

Lokman Polat

Di hijdehê îlonê de, li bajarê Kerkukê terorîstekî bombeya bi laşê xwe ve girêdayî teqand û bi xwe re 23 rûniştvanên kerkukî kuştin û 20 kes jî birîndar kirin. Teqandina vê bombeyê weke destpêka tevliheviyê ya li Kerkukê ye. Dewleta tirk dixwaze ku li Kerkukê tevlihevî çêbibe.

Çend hefte berê, Ebdela Ocalan di hevdîtina bi avokatên xwe re gotibû: "Dê li Kerkukê tevlihevî çêbibe." Ew li girava Îmraliyê ye û heger "genel kurmay"a Tirkan agahdarî nede pê, ew ê çi zanibe ku dê li Kerkukê tevlihevî pêk bê. Ji beyana wî jî diyar e, ku dewleta tirk dixwaze li Kerkukê tevlihevîyê pêk bîne û Tirkmenên wir li dijî Kurdan bi kar bîne. E. Ocalan ji di rêça "genel kurmay"a tirk de dimeşe û ew jî bi tundî li dijî Kurdistana federal e.

Tevlihevî û kaosa ku li seranserê Iraqê pêk hatiye, bi tiliyên dewleta Îran, Tirkî û Sûriyê tê meşandin. Ev her sê dewlet li dijî hêzên emerîkî û li dijî Kurdan –Kurdistana federal- bi hev re itifaq çêkirine û alikariya teroristan dikin. Armanca van her sê dewletan ev e, ku li Iraqê kaos pêk bê, projeya dewleta Emerîkayê bi ser nekeve û kurd di qada navneteweyî de nebin dewleteke fermî. Lewre ji çi xirabî ji destê van her sê dewletan tê, texsîr nakin û tiliyên xwe dixin nav Iraqê û li wir roleke xirab, roleke li dijî mafên însanî û demokratiyê dilîzin.

Teroristên ku çalakiyên intiharî dikin û bombeyan di laşên xwe de diteqînin, kesên xwefiroş in. Rêxistinên teroristyane yên islamî û ev her sê dewlet zarokên malbatên feqîr bi pereyan dikirin û kurên wan di çalakiyên intiharî de bi kar tînin. Li Filistînê jî ev metoda kirina zarokên malbatên feqîr tê bikaranîn. Hinek rêxistinên filistînî jî malbatên feqîr ku pênc, şeş zarokên wan hene, kureki dikirin, pere didin malbatê û kuriki di çalakiya intiharî de bi kar tînin.

Dewleta dagirker a tirk di pêvajoya şerê qirêj ê li dijî gelê kurd de Hizbûllahê û Apoçiyên îtirafker bi kar anîn. Dewletê bi destê wan gelek kurdên welatparêz dan kuştin. Niha jî dewleta tirk dixwaze minafiqên Hizbûllahê, Apoçiyên îtirafker û bi fermana E. Ocalanî mirûdên wî – hêza çekdar a Apoçiyan- li başûrê Kurdistanê li dijî Dewleta Kurdistanê ya Federal bi kar bîne. Kontra û JITEMa dewleta tirk Tirkmenan jî dikin û bi destên wan tevliheviyê pêk tînin.

Rewşa başûrê Kurdistanê niha baş e. Heger dewletên cîran û bi taybetî jî dewleta tirk tiliyên xwe nexe wir û li wir tevlihevîyê çêneke, dê rewşa wan hîn baştir bibe. Lê weki tê zanîn, dewleta tirk naxwaze li wir istîqrar hebe. Bûyerên ku li Kerkukê pêk hatin, bi tiliya ajanên Tirkan rûdan. JÎTEM li Kerkukê provakasyonan pêk tîne.

Lê dewleta tirk çi bike ji, li Başûr bi ser nakeve. Kurdên Başûr ji salên notî ta îro tehma azadiyê ditîne, bi xêra hêza çekûç a navneteweyî serbest jiyane. Ew êdî bi reheti dev ji azadî û serbestiya xwe-bernadin û xwe di bin lingên dagirkeriya dewleta tirk de napelixinin. Heger dewleta tirk bixwaze wir dagir bike, kurdên wir dê bi tundî ber xwe bidin, êrîşî hêzên dewleta tirk bikin. Yanî ew wisa bi hêsanî xwe teslîmî dewleta tirk a dagirker nakin.

Divê Kurdên welatparêz ên her çar perçeyên Kurdistanê li hemberî leyistîkên her sê dewletên dagirker dengê xwe bilind bikin, piştgiriya Kurdistana Federal bikin û leyistikên dagîrkeran û hevkarên wan ji raya gîştî ya kurd û ji raya gelê cîhanê re eşkere bikin. Divê hemû Kurdên welatparêz hêzên xwe bikin yek û li hemberî leystik û êrîşên dewletên dagîrker bisekinin.



Xweda şahid e, ku ez ne şerxwaz im,
ji ber ku şer ne çareseriye
Lê rêjîma Bees
tu riyeke din ji me re nehişt.
Maneya dax vazên wan wazleênina
me ji Kerkukê ye, ev jî ne mumkin e.
Em hemû di vê riyê de bi dil û can
amadeyê mirinê ne.
Ez naxwazim ku rojekê Kurd werin
ser gora min, tif bikin û înbejin:
"Bo çi te Kerkuk firot?"

Mele Mistefa Barzanî



Keleha Kerkûkê *Wêne: Zagros Mehmud-Hewlêr*

Mesud Barzanî: Em nahêlin ku Kerkûk dagirkirî bimîne

SELAHEDÎN (KK/PK) - Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî li Selahedînê di gel hunermendên kurd civiya û di axaftina xwe de behsa rewşa Kerkukê kir. Barzanî got, ku "bila ti kes wisa nehesibîne ku Kerkuk dê li derveyî Kurdistanê bi awayekî dagirkirî bimîne". Herweha wî ku Kurd dixwazin problêma Kerkukê li gor qanûna bingehîn a Iraqê ya demî bête çareserkirin.

Ev cara pêşî ye, ku Mesud Barzanî bêjeya „dagîrkirinê" ji bo statûya Kerkukê bi kar tîne. Wî eşkere kir, ku Kurd amade ne ku ji bo çareserkirina pirsa Kerkukê têbikoşin û heta destketiyên xwe yên îroyîn bo Kerkukê feda bikin.

Li aliyekî din, wezîrê derve yê Tirkiyê Ebdullah Gul li New Yorkê di gel wezîrê derve yê Iraqê Hoşyar Zîbarî kom bû û jê xwest, ku Kurd demografiya Kerkukê û statûya wê neguherin.

Li Stockholm û Londonê xwepêşandan bo Kerkukê



STOCKHOLM/LONDON (PK) - Komîteyên Swêdê û Brîtanyayê yên Referenduma bo Kurdistanê dê sibe li Stockholm û Londonê ji bo tevlîbûna Kerkukê di nav sînorên Herêma Kurdistanê de xwepêşandanan li dar xînin.

Xwepêşandana li Stockholmê dê demjimêr 15.00 ji meydana Sîrs Torî dest pê bike. Çalakiya li Londonê dê ji 12:00 ta 14:00 li pêşiya "10 Downing Street" pêk were.

Dirûşma herdu xwepêşandanan dê "Kerkuk dilê Kurdistanê" be.

(Berdewema rûpela 3)

Di dîroka Kurdan a serdema nû de, ev roj rojeke dîroki ye. Cara duyemîn damezirîna dewleteke kurd hat îlankirin. Bûyera dîroki ya yekemîn îlana Komara Kurdistan li Mahabadê ye. Ya duyemîn îlana Dewleta Kurdistanê ya Federal li başurê welatê me, li Hewlêra paytext e.

Dewleta me ya yekemîn bû goriya encamên şerê Duyemîn ê Cîhanê û lihevhatina herdu sisteman. Rûxandina komara kurd di dilê her kurdekî neteweperwer de kuleke giran e.

Destkeftiyên van donzdeh salên dawî li başurê welatê me hineki derd û kulên kurdperweran dikewîne. şehîd pêşewa Qadî Muhamed berî ku bête şehîdkirin, ala Kurd û Kurdistanê tesîlmî Barzaniyê nemir kir. Û îro, alaya Kurdistanê wek sembola aşitiyê, azadiyê, demokratiyê û mirovayetiyê li seranserê başurê welatê me, li dest û çiyan, li bajar û gundan pêl dide. Ji bo Kurd û Kurdistaniyên xwedî namûs û xîret, gelo ji vê xweştir li vê dinyayê tiştekî din heye?

Pêwîstiya her welat û neteweyekê bi dewletekê heye û ji miletê kurd û Kurdistanê re jî dewleteke neteweyî, demokrat, dadmend û medenî pêwîst e. Niha dewleteke me heye! Divê em wê weki ronahiya çavên xwe biparêzin û weki evîna dilê xwe xweyî bikin û lê şiyar bin. Bi taybetî keç û xortên nûgihayî divê xerevanê dewleta xwe bin. Pêşeroja miletê kurd ciwanên wî û dewleta wî ye.

www.kurdistan.org

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr .
Fatê Were Civatê



Şêxbat

Xaltîka Fatê, şikir ji xwedê re, me dengê te bihîst. Ez xortekî 17 salî me dikevim 18'an. Kamil bûme, aqlê min li hewa ye, sere min çelqûbelq bûye, çavlider' im, tolaz'im, serxweş'im. 10 gram aqlê min mabû, pîştî min hevpeyvîna te xwend ew 10 gram jî firya. Li ser pêşniyaza te min dest bi diziyê kir, hatim girtin 6 mehan razam. Zinêkarî kir, 6 mehan razam. Niha min dest bi derew, dek û dolaban kiriye, hîna nizanim ezê çend mehan ji bo wê jî razêm. Şîretên te ji Eroînê jî jehrî'tir in. Ji bo xwedê ez dixwazim ji te xilasbim û te ji mêjî û xwîna xwe bavêjim. Aqilekî bide min!..

Dîno / Alamanya

Hey ehmeqo, dîno, ker kurê kerê !. Ma yên ku şîretên min xwendin karin ji min xilas bibin?..Eroîn, Morfîn, jehrîn, ziqumîn li ber şîretên min gû xwarine. Ma ez bi rehetî dev ji we berdidim !. Tiro xortekî 17-18 saliye, çelqûbelq e, serxweş e, 10 gram aqil pê re maye û aqil ji min dixwaze !.De yabo ezê çi mala xwe xirabikim û serê xwe pê bêşînim!. Qey yekî bi aqil bi ser min venabe bavo, yan ez dîn'im yan ew!. Lao madem 10 gram aqil bi te re nemaye, bombekê bi xwe ve girê de, here malê hinek araq vexwe, pîma wê bikşîne û yekî sax di malê de nehêle. Heger aqlê te 10 gram be, ê Dê û Bavê te çend gram'in gelo!? Ji bîra neke, xwe bikuje! Xwe biteqîne!.. Tschus !...

*** *** ***

Xaltîka Fatê, hey belqitiyê, Stuşkestê, Porkurê, Xwedê mal xirakirê! Tu çi bû bela serê me!? Ji ruyê te dê û bavê min hevdû berdan. Bavê min hema digo: „Ha Fatê û ha fatê, here Fatê û were fatê".Rebena diya min jî dihesidî û bi hev diketin, hetanî ku hevdû berdan. Te em sêwî, bê kes û kûs hiştin, li ber dîwaran hiştin, hey agir bi mala te ketê!..

Kindar/ Fransa.

Belqitî tu û bavê xwe ne lao!.. 11'ê Îlon'ê min çêkir, Bîn Ladîn, Talîban min rakirin, Filîstînî min rakirin ser tapana, Çeçen, Ira, Eta, Ensar û mensar min avakirin. Errrrrrrrekkkk!...Lao ma ez bûm çi!?...Kî hevdû bikuje sûcê Fatê ye, kî hevdû berde sûcê Fatê ye, kî dizyê, zinêkaryê bike sûcê fatê ye. Kî dest bi şer bike Fatê ye, kî here ezmanan Fatê ye, Cennetî dibêjim Fatê û Cehnemî dibêjin Fatê. Mirî dibêjin Fatê û zindî dibêjin Fatê. Îsa dibêje Fatê û Miheme dibêje Fatê!. Ma lao; go diya te jinek ne spehî û lihevhatî be, li ber çavê bavê te wek tenta binê beroşê reş be, bêdilî bavê te be, mîna kerekê serhişk û bêaqil be, ji xwe wê bavê te wê berde ma wê çibike jê!.Bavê te aşiqî min bûbe ma sûncê min çiye Kurik!?. Tu zanî ! A baş ka tu telefona bavê xwe bide min !.. Au Revoir!.....

*** *** ***

Berêzekan Prof.Doç.Dr Fatê Xanim, çavekem, canekem! Min keçeke zor ciwan'im, temenim 14 sal e. Min li Deutschland dijîm. Min bi xom nîm Kurd im nîm Deutsch im. Min ta êste hez li 14 xortekan kirdim, belam têr ji xoşekanî jiyanekem nabem, min her dixwazem ve her dixwazem. Ditirsim ji ev dinyaye bêmiraz biçwem ew dinyaye. Tu bo min çend şîretekan pêşkêş nakî ?

Bêmiraz Leyla/ Munich

Çavekem, bêmirazekem!. Bexom nadzanim temenim çend e, belam ta êste min qehpekeçek wekû tû nedîtiwa. Tû dilê min hez li 14 xortekan kirdim, bi ew xortekan ra îş kirdim, belam têr ji xoşiyekanî jiyanekem nabem. Hey qehpexanim! Min bi ew temenê xom hez li 14 xortekan ve mêrekan nekirdiwa. Temenê tû 14 ve 14 mêrekan! Maşelleh!.. Çavekem, ev kiryara êste Lêlê ye belam di dahatû da lolo mawe. Qewlekanî Yezdanekan 101 mêrekan e. Ta tû hez li 101 xort ve mêrekan nekirdiwe, natiwanî bêmiraz biro ew dinyaye. Her berdewamî karekanî xot bike!.. Tschus!.

fate@peyama-kurd.com

Bersivên xaçerêza hejmara 2

Çeperast

1.) Kurdistan / es 2-) Ararat / tevşo 3-) Radar / serdar 4-) Brîn / pî 5-) Itv / partizan 6-) Duello 7-) Alîkirin 8-) sa / otomatîk 9-) Trîko / anel 10-) Tnt / êsa 11-) Qiyametek / ev 12-) Amerika / buha.

Serejêr

1-)Karbidest / qa 2-) Urartu / artim 3-) Radîvêh / înya 4-) Dran / oktar 5-) Iar / plato 6-) St / paolo/ yek 7-) Sîr / îma / ta 8-) Ate / tika / re 9-) Nermî / ita / kb 10-) Vd / zêrînê 11-) Eşala / ikeseh 12-) Sor / nan / lava

Remildank

Beran (21.03-20.04)
Nûçeya ku hûnê ji heykiriyê/ya xwe bigrin wê kêfa we bîne. Hûn Karin bi hevre derkevin seyrangehan û têkiliyên xwe germtir bikin. Li himberî hev erênî bifikirin, hesûdî û zikreşiyê navêjin hev.

Gamêş (21.04-20.05)
Hûnê rojekê xweş û bi kêf biborînin û hewl bidin ku ji bo pêşketina karê xwe şêweyên xebatek nuh biceribînin. Hûn di demekê zîz de ne, pêşewazî û pêşniyazên nuh karin derkevin pêşiya we. Hûn Karin li ser van pêşniyazan bifikirin.

Cêwî (21.05-21.06)
His û giyanê we nerm dibin. Hûnê giraniyê bidin ser karê xwe. Wê rûdana hinek bûyeran moral û kêfa we bîne cîh. Hûn Karin piştgiriyê ji dost û hevalên xwe bigrin û têkiliyên xwe xurttir bikin.

Kevjal (22.06-22.07)
Ji bo we rojek bi heyecan û germ e. Lê hûnê heyecana xwe têxin bin kontrola xwe. Hûn Karin carek din têkiliyên xwe û hezkiriyê/ya xwe di ber çav re derbas bikin. Lê zû biryarê nedin.

Şêr (23.07-22.08)
Xwestek û daxwazên we berz û xurt in. Hûnê ji bo pêşeroja xwe fikrên baş bikin û têkevin nav lêgerînekê nuh. Zêde xeyalperest nebin û karê zêdeyî hêza xwe nekin. Berpirsiyariyên giran negrin ser milên xwe

Simbil (23.08-22.09)
Hûnê îro xwedî biryar bin û serê xwe zêde bi bûyeran neêşînin. Bi aram û giraniya xwe hûnê bandore li derûdora xwe bikin. Wê têkiliyên we û hezkiriyê/ya we têkeve pêvajokek nuh, dudilî nebin.

Mêzên (23.09-22.10)
Dibe hûn îro têkevin nava dudilî û sergêjiyê. Hûnê bifikirin ku mezinên malê zorê li we dikin û we dijdinin. Lê bi arambin û li ber xwe bidin. Di serê xwe de alozî û gengeşiyê çênekin.

Dûpişk (23.10-21.11)
Wê pêşewazî û pêşniyazên balkêş ji we re bên û hûnê di nava heyecanekê de bin. Dibe ku vexwendnameyek têkeve destê we û hûn vê êvarê biçin vexwendiyekê.

Kevan (22.11-21.12)
Hûnê tê derxin ku hûn îro bêdeng û cansivik in. Bûyerên îro Karin we têxin bin bandore xwe. Hûnê di nava hêvî û daxwazên cûrbecûr debin. Ji bo hûn ji vê alozî û dudiliyê riygar bibin, têkevin nav civatek xweşreng.

Kovî (22.12-19.01)
Wê hinek bûyer we têxin heyecanê. Fersendên derkevin pêşiya we nerevînin û heta ji we bê wan bidestxin. Serhişkî û ezeziyê nekin, serê xwe bi tiştên nehêja neêşînin.

Satil (20.01-18.02)
Daxwazên we zêdetir dibin û hûn lezûbezê didin karê xwe. Lê kûn karin têkevin nav bêaramî û bêhntengiyê. Zor û zehmetiyê nedin xwe û derûdora xwe, ji xwe haydar bin.

Masî (19.02-20.03)
Bi geşî û henekên xwe, hûnê karibin bandorê li derûdora xwe bikin û xwe têxin çavê wan. Dudilî û aloziya di serê xwe de bavêjin û bi sernermî û bi biryar berdewamiya karê xwe bikin.

Xaçerêz



Çeperast

1.Pirtûka Zerdeşt pêxember. 2.Min, ne tû / çiyayeki bilind. 3.Mezel, gor (paşûpê) / temînat, sened. 4.Leqleqok, zimandirêj, lafazan / comerd, destvekirî. 5.Naveki jinan / jê bira û nan çêdibe. 6.Reşgirêdan, taziye / korî, nebînî. 7.Kevneheywanek mezin / di qelemaçan de yek. 8.Li bakur navê gundekî / navbera çav û ser. 9.Ne germ, hênik /xela bûkê, qelen (paşûpê). 10.Reşik, qemer, Afrîqî / kêmxwînî. 11.Ser û çav, hinark /ne qelandî (paşûpê). 12.Tê re derbasbûn / prenses, banû.

Serejêr

1.Pêxemberê qewmê Arî / ne nerm, hişk. 2.Ez xulam, ez benî / çemekî Kurdistanê. 3.Aşiqî, dilgirtinî. 4.Nîşankirin, belekkirin / ruh, giyan, can. 5.Vexwarinek sereke / bilez anîn / du tîp. 6.Naveki mêran / bi Soranî anî (paşûpê). 7.Naçe, nayê (paşûpê) / navê eşirek Kurd /nex, ben(paşûpê). 8.Ne li bin, jor / ne normal, ecêb. 9.Ji şîr çêdibe (paşûpê) / bi Erebî ez. 10.şirketên simsar (paşûpê) / yek ax e, yek erd e. 11.Nekes, destgirtî, xesîs (paşûpê). 12.Nexweşiyek (paşûpê) /pişavtin, ji bir kirin.

EU

YES

NO

to IGNORANCE

OF KURDISTAN QUESTION

peyama Kurd

Kurdish weekly newspaper

Thomas-Mann Str. 22, 53111 Bonn, Germany

Tel.: +49 (228) 18 00 654

+49 (228) 18 00 655

Fax: +49 (228) 18 00 656

eMail: info@peyama-kurd.com

www.peyama-kurd.com

www.iran-archive.com

Heyama Nû

Di romanan de wextê bûyeran û yê vegotinê

Ibrahîm S. Aydogan



Di romanan de, di gel avakirîbûna cîhana nava çîrokên wan, ji ber ku bûyer, lehèng û vegotinên wan şibandinekê jî di nava cîhana rastîn û ya avakirî de pêk tînin, xwendevan jî tim bi rastiya bûyerên wan bawer dibe. Dema ku bûyer lê derbas dibe û ya xwendevên çi qas dûrî hev bin jî, ev bandor her heye. Carl Vetters di berhema xwe ya li ser bikaranîna wextan ya di nava tekstên edebî de (Temps, Aspect et Narration – bi kurdî: Wext, Rewş û Vegotin, 1996, Rodopi.) di gel gelek hêlên vegotina tekstên edebî, li ser dema wan jî nirxandinên zanîstî yên ku heta niha hatine kirin, rave dike û weha bi encam dike: "Çawa em di cîhana xwe û derdora xwe de rast bin, di nava cîhana avakirî de, lehengên romanê jî di nava derdora xwe de ewqasî rast in."

Di gel baweriya bi rastîbûna bûyerên berhema edebî, ku bivê nevê bi xwendevên re peyda dibe, wextên berheman jî bi karektera xwe ya ku xwe dide sepandin, xwe bi xwendevên dide qebûlkirin. Ev sepandin di berhemên edebî de fonksiyoneke wan a bingehîn e. Dema bûyerên romanê demeke bihurî be jî, xwendevan bi vebêjer û lehengên romanê re di nava dema romanê de dide pey bûyeran. Ev dema ku em jê re dibêjin "dema bûyerên romanê", dibe ku demeke pêş be jî. Weke mînak, romana 1984 (George Orwell), an jî romana Bêmal (Ursula K. Leguin) an jî Cîhana Meymûnan (Pierre Boulle) li gora dema ku hatiye nivîsandin, behsa pêşerojê dike; romana Notre-Dame de Paris (Victor Hugo) nêzîkî çarsed salan bi şûn de diçe û behsa demeke bihurî dike; romana Madame Bovary (Flaubert) û Doz (Kafka) jî behsa dema ku nivîskarên wan tê de dijîn, dikin, lê belê ev hemû berhem jî bi dema bihurî hatine nivîsandin. Kate Hamburger (Die Logik der Dichtung, bi kurdî Jirbêjiya Celebên Edebî) dibêje, ku dema bihurî dema vegotinên edebî ya bingehîn e. Ji xwe ji ber wê ye, ku Benvenist û Weinrich wext li gora bikaranîna wan a di vegotinên edebî û axaftinan de kirine du beş.

Mirov dikare ji xwe bipirse: ka gelo çima bûyereke dema pêş bi "dema bihurî" tê vegotin?

Di berhemên edebî de, ji bilî nivîskêr tim vebêjerek heye û ne pêwîst e ku vebêjer û nivîskar yek bin. Mînakek dê ji bo têgihîştinê alî me bike: Ger em vebêjerê (kesê ku vedibêje) romana Cîhana Meymûnan weke nivîskarê wê bihesibînin, em ê bikevin nava xeletiyê. Lewra, ji bo ku ew vebêjer bikare behsa bûyereke sedsala 25ê bike, divê ew vebêjer berî her tiştî wê bûyerê pêkhatî û bidawîbûyî bihesibîne.

Mirov bixwaze romaneke bi "dema niha" binivîsîne jî, mirov bûyeran bidawîbûyî dihesibîne. Em bi awayekî din bibêjin: di nava tekstên edebî de, weke ku Marcel Vuillaume di berhema xwe ya bi navê "Grammaire temporelle des récits" (Gramera tekstan a wextsaziyê) de dibêje: bûyer berî nivîsandina xwe pêk tên û xelas dibin. Ev nêziktêdayin jî dê me bibe gotina ku roman bi xwe re gelek wextên din jî bi xwendevên dide sepandin: 1) Wexta bûyeran, 2) Wexta vebêjêr.

Ger em nivîskar û xwendevanê wê berhemê jî, ku beyî wan nabe, lê zêde bikin, 1) Wexta nivîskêr, 2) Wexta xwendevên, hingê di hemû tekstên edebî de çar wext, weke çar pêvajoyên afirandina berhemekê, diyar dibin. Divê mirov ji bîr neke ku di navbera van wextan de sînorên zelal nîn in. Di rewşeke weha de, ew ê xeletî be ku destnîşankirina dema bûyerên romanekê li gora dema xwendevên an jî ya nivîskêr were kirin. Ji ber ku her çar endamên pêvajoya vegotineke edebî, her yek di demeke din de û hingê di cîhaneke din de dijîn. Weke mînak, bûyerên romana Ulyssesa James Joyce di rojekê de derbas dibin, vebêjerê wan piştî xelasbûna wê rojê behsa wan dike û nivîskar jî di wexteke din de, piştî vê pêvajoyê, dinivîsîne. Lê di berhemekê de, dema serdest dema bûyeran e û tevlêbûyina demên din a bi awayekî eşkere dikare konsantrasyona berhemê jî xera bike.

ibrahimseydo@hotmail.com



Pirtûka Prof. M.R. Îzady li Stanbolê hat çapkirin

Pirtûka Mehrdad R. Izady ya bi navê "Kurd" ji aliyê weşanên Doz ve hatiye weşandin. Cemal Atîla ev pirtûk ji ingilîzî wergerandiye zimanê tirkî û ji deh beşan pêk tê. Pirtûk bi erdnîgariya Kurdistanê dest pê dike û bi beşên wek Kurd, ol, civat û aborî dom dike û bi beşê çand û hunermendan diqede.

Mehrdad R. Izady li Zanîngeha Harvardê mamosteyê beşê ziman û şarmendiya Rojhilata Nêzîk e. Izady du caran li komîteya jêr a ku bi Kurdan re têkeder dibe û girêdayî Kongrêsa Emerîkayê ye, wek pisporê Pirsa Kurdî hatiye guhdarkirin.

Gotinên pêşiyan

Pêşgotin

Perwîz Cîhanî



Gotinên pêşiyan yek ji şaxên here berfire û zengînê gencîne ya neteweyî ya her gelekî ye. Zengînîya gotinên pêşiyan nîşana zengînî ya ziman û şaristanîyeta wî gelî ye. Mirov li ber gotinên pêşiyan yê her gelekî dikare li ser çawanîya jîyana wî gelî li demên bihorî û niha da vekole. Bi giştî bi arîkarîya gotinên pêşiyan mirov dikare agadarîyên baş li ser rewşa jîyana gelan dest xwe ve bîne. Bo nimûne mirov dikare binecî bike, ku ewî gelî li dan û sitandina xwe ya rojane da ji kîşk amîr û pêdestkên jîyanê wec wergirtîye, jîyana wî ya rojane û karê wî yê rojane û pêjîyana wî çi bûye. Gelo ewî gelî li rêka werzgarîyê da jîyana xwe ya rojane birîye seri, yan li rêka koçerî û terşdarîyê, yan jî li rêka nêçîrvanîyê da. Yan jî ew gel gelekî bazirgan û bajarî bûye. Bi lêkolîna li ser gotinên pêşiyan mirov dikare navê dehan amîr û pêdestkên jîyanê yê rojane li demên bihorî û niha da binase. Herwisan li nav gotinên pêşiyan da mirov rastî navên cî, gund, bajar, çîya û deştên ku ew gela li dirêjaya mêjûyê da tê da jîyaye, tê.

Bi lêkolîna li ser gotinên pêşiyan, mirov dikare binecî bike ku ew gela xudanê çi bîr û hizrekî ayînî û ramîyarî û komelatîyê bûye û mirov li wê rêkê pê dihese ka ewî gelî li dirêjaya mêjûyê da di gel kîşk gel û neteweyî derbas kirîy û cîranên wî yên dîrokî kî bûne û dan û sitandina wî bi kîjan cîranî ra baş û bi kîjanê ra jî nebaş bûye û berûvajî wê. Bi giştî mirov dikare li rêka lêkolînan li ser gotinên pêşiyan bi xû û xide û urf û adetên her gelî agadar be.

Bi şanazî va dikarim bêjim ku gencîneya gotinên pêşiyan li zimanê me da, yek ji genîneyên here zengîn ê gelên Rojhelata Navîn e, ku kar li ser toreya zarkî ya gelên dev û dora xwe jî kirîye.

Gotinên pêşiyan ji bilî wê hindê ku neynûka jîyana rojane û bihorîya gel e, herwisan yek ji şaxên here giring ê toreya gelîrî ye jî.

Li gotinên pêşiyan ên kurdî da taybetmendîyek heye ku ew taybetmendîya jî serratîyê dide van gotinane. Pişka zore gotinên pêşiyan yên kurdî xudanê kêş û serwayê ne. Eger mirov bi çavê cuwankarîyên toreyî bera xwe bide gotinên pêşiyan, mirov dibîne ku li pişka zore wan da wek helbestekê cuwankarîyên toreyê yên weke teşbîh wate wekandin, cinas wate hevregezî, îham wate gumandarî, teraduf wate hevwateyî tezzad wate dijberî û dehan cuwankarîyên dî bi curekî ber bi çav xwe dinivînin. Li nav komelê da jî gava kesek li nav axiftinên xwe da ji gotinên pêşiyan wecê werdigire, kartêkirana gotinên axêverî zortir dibe. Li nav nivîskaran da jî ew nivîskar û bi taybetî nivîskarên ku li babetên toreyî da serketî ne, ku li nivîsînên xwe da wecê ji vê pişka toreya gelîrî bibe.

Her gotinek pêşiyan bi xwe dikare bibe şîret û rênîşanderek jîyanê. Her li ber vê hindê ye ku li hindek navçe û devokan da ji gotinên pêşiyan ra şîretên kal û bavan û xeberên mezinan û pendên pêşînan jî dibêjin.

Gotinên pêşiyan bi xwe dibin çend desteyan. Hindek gotinên pêşiyan he rasterast şîret in û kal û bav û dapîr û dayên me tê koşîne tecrube û serhatîyên xwe yên jîyanê li qalibê gotinên kurt û pir wate, da ji me ra bêjin û li rêka jîyanê da arîkarîya me bikin, weke: ziman darkokê serê xudanî ye. Hindek gotinên pêşiyan jî he weke helbestekê ye ku li ser qewimînek taybetî hátine gotinê û şîret û nesîhet di wan da zor kêmreng in., weke: Adare dew li dar e, vira nîne li berrîya şengar e. Diqewime ev curre gotinane he seretaya helbestekê li bara dan û heyva salê da jî bûbin, ku li ber nexwandewarîya gel û berbelavbûna zimanê kurdî berbere helbest ji binêşeya xwe dûr ketibe, û tenê malikek ji wê mabe. Hindek gotinên pêşiyan jî he rengê axiftinek asayî û rojane didin, ku çi taybetmendîyê gotinek pêşiyan li wan da nayê dîtinê û mirov wê hizir dike ku mirovekî/e duh na pêr bi te ra rûniştîye û li bara rewşa jîyanê û abûrîyê da di gel te axiftîye, weke: abûrî bi razan û zikmizdanê nabe, bi xebat û xûyîdanê/xwêdanê dibe. Gelek caran jî gotinên pêşiyan û îdyom wate bwêjên toreyî wisan têkelî hev dibin, ku mirov bi sanahî nikare wana ji hev du veqetîne. Eve ye ku vavartina gotinên pêşiyan ji îdyoman li zor cîyan da karekî dijwar e, wek: bi gemê va av xwarin/vexwarin. Ewî/ê hê bi gemê va av nexwarîye.

Li vê quncikê da ezê têbikoşim ku li her jimarê da gotinek yan çend gotinên pêşiyan bi hûrgilî şirove bikim û ta cîhê ku ji destê min bê, ezê wan gotinane li bara cuwankarîyê toreyî û wate û karbirda wan da veçirrim. Lê her wekî ku hûn xandevanên hêja jî dizanin, melewanî di vê deriyaya bê ser û bin da ne karê mirovekî tenê ye. Li ber wê hindê daxwaza min ew e ku hûn xandevanên hêja me ji her curre rênimûnî û rexneyên xwe bê par nehêlin. Herwisan li ber mezinbûna Kurdistanê û cur be cur bûna zarave û devokên zimanê me pişka zore gotinên pêşiyan xudanê çendîn celeb wate variyantan in. Hûn xandevanên rêzdar dikarin li wê barê da jî keda xwe tevî vî karî bikin û bibn hevalê vê rêkê û me li meydanê da tenê nehêlin. Emê têbikoşin ku wan gotinên pêşiyan ku li destê me da hene, û hejmara wan zêde ji panzde hezarî ye, bi rêza alfabê yê di vê quncikê da şirove bikin.

perwiz3@hotmail.com

www.kurd.net



Ew der

Enwer Karahan

Li wê derê, roj mîna nanekî genimî ku nuh ji tenurê derketibe, bi nazdarî ji paş çiyayî derdikeve. Tîrêjên rojê dibin şûr û qame, xwe li serê darên gûz û hewran dibezikîne. Şêniyên wê derê, bi dengê dîkan, bi marîna berxan û bi vingîniya mozqirtikan şiyar dibin. Bi dengê zenqendîlan re dibe tepetepa mişmişan; ew dikevin binê daran. Bi hilatina Qorixê re avî dikeve, nîşanî dikeve hijîran. Serê sibehan helebelek li maliyan dadikeve. Dibe qêrîna tifalekî li ser banê xênî, ku ew ji bona hatina dewê meşkên çiyayiyan bang dike: "Ha wer dew, ha werin...". Pîrejin xarê dibin devê kîsên zexîreyê, da tasek bilxurî bidin bi du tas dewî. Teqeteqa dengê bêrên keraxan dibe fermana dengpêketina ker û golikan.

Li wê derê, di rojên teng de her kes mîna xweh û bira ne, lê di halê rehetî de, ew bi dijayetî û berberî ne. Dibe cingecinga qîz û jinan, ji bona kewtîn û du ewtînan. Car heye ku mêr jî li ser dikevinê, a wê gavê dibe roja qiyametê ku navê vê cengê dibe "çelesiriya Mala Kuncî". Dîsa bar dikeve hustuyên du rîhsipiyan ku bê qeda û bela avekê li wî agirî bikin.

Şêniyên wê derê xweş mahzûban in ji bona xaritê dost û hevaltiyê. Heger li mala wan tune be kurtîlê nên jî, ew bazdidin ser teşta cîrên da memnûn bikin xweşmêvên.

Her yek ji wan xwedî war û baxçeyekî ne, ku derî di deriyî de ne. Êvaran dibe vizeviza dengê pêlên radiyoyan mîna ku meriv bi hev re têkeve qayîşê, bê ya kê berê dike gazî bi denê Eyşe Şanê û Kawîs Axayî re, li ser pêlên Radyoya Kurdî ya Dengê Bexdayê.

Qurrîniya dengê baqan dibilîne dengên wan zarokên histêrka wan di ezmên de tune ye; paşmêlik xwe li pêlên avê dixin bi teşbîtên bazê nêçîrvan; heger zarok tamsariyan bikin, ji wan re tê gotin ku gurê mancolê dê we bixwe. Bi wê gotinê re ew dibin mîna kurkurkan.

Ji êvar de her kes dikevin xewa şêrîn bi xema roja paşîn. Bi destê sibehan re dibe banga êzingvaniyan, da li wan nebe derengî ku ew berî çirûsandina rojê xwe bigihînin Hustukurê. Dibe borteborta zamoteyan, tu sond bixwî ku ew berên xwe didin seyran û dîlanê. Ew bi wê eşqê xwe digihînin çiyayî, da bikin du bar êzingên mazî ku ew bibe debra belengazan, ji bona şevên kanûnan.

Li wê derê, ji heftê carekê betal dimînin zilamên malê; yextiyarên wan diherin xutbeyê û xortên wan diherin sînemayê. Heger hebe dahwet û şahiyek, qîz û bûk xwe dixemilînin bi kirasên sor û mohrzemînî, bi kitanên dêrikanî; li xwe dikin bîhna misk û emberê, kilî dikin çavên xezalî; ew bejin zirav in mîna karxezalan in ku li ser zar û zimanê alemê ne; meşa wan ji meşa qitikan e; hêja ne ew, her yek bi welatan in.

Heta ku ji wan bê, ew qîzên xwe nadin xerîban; ev jî adetek malavayan e, em çi bikin; Xwedê mala wan ava bike... Wan berê ceribandine bi hin tûle û toltajiyan re, loma jî devê wan ji şîrî şewitiye, ku ew pifî dewî dikin. Qelenên wan giran in, cihîzên wan ji barên deveyan in. Paşderî, peza aziban, xelata xalê heye ku ew ne kêmî tivingeke çapilî ye. Ew bedew in, bejinbilind in, mîna şiva hezîranî ne; xwedî qudret in; car heye ku zilaman bi pênc pereyan nahesibînin, loma jî -Xwedê neke- bi şaşî dawa we li ya wan nekeve!

Li wê derê kanî hene, delav hene ku seyrangehên xortan in. Ji ber germa havînê dibe virevira xortên bajarî, bi ser wan deran de derdibin mîna kulmoza mozan in. Mêrgên binefel û birkdiortê de û golên di çeman de, mîna cîhûwarê teyrikên Bihuştê ne.

Êvaran li ser mêrgan vedihewin rîhsipî, ji hev re dikin qala dem û wextên berê. Çîroka eskeriya wan bi hilatina Komik û Mêzînê re dawî nayê; ew ê çi bikim, ma hindik kişandinin ji destê romiyên bêrohnî?... Kirîvê Çêço xwe li wan digire di her rojên şemiyê de, ku ew roja avdana zeytûnên wî ye; ew jî bi wan re dike gilî û gazinên fermana bapîrên xwe, heta bi destê sibehê. Di wan şevan de, li mala dotmama xwe ya ku di dema fermanê de bûye ji dînê qewmê wî ahlî dimîne, bi awayekî bêminetî.

Demsala debara wan bi tûyên xemlî û bajarî dest pê dike, berî ku mişmişên zer û sor di hewara wan de bên. Li ba wan elektirîk tune ye ku bikarin biparêzin kîloyek goştê pezî, lê mala wan ava be, mirîşkên sorbirdikî ji wan re dike rojê çend hêkên zêrînî, da bibe taştiya zarokên zebenî. Xwarina wan kundir û pirpar in hata ku dernekeve bahcan, îsot û firingî; hewara wan hijîr in ku bikarin du çekuran bifiroşin, da ji zarokan re bikirin cotek sol û du qerpolên rengîn. Heta ku neba payîz, wexta dawşandina gûzan û dema ser mahsereyan, ew li xwe danînin ku berê xwe bidin cem qesaban da bikirin serûpiyan ku zarok li dorê bidin lotikan. Wexta ser masereyan li hêlekê dibe virîna gebûl û şalên bastîqê, li hêla din beroşa şîreyê, dibe repîna rewtan ji sersimûçikên guliyên gûzan. Ew beniyan çêdikin ji bona haziriya şevên serkose û berkoseyan; li wan vedihewin omîdiyên wan ên li derveyî warê wan, bêyî ku ew ferqê têxin navbera nêr û mêyan, radixin mitêlan.

Di barkirina payîzê de, ew li hev helal dikin heta bi salvegereke sala dinê; dibe terebhoşa zarokan mîna cewrikên li dû makan.

Zivistan bi ser wan de tê, ew baz didin xaniyên malê, himbêza xwe didin ber êzingên ji kêşiyê, bêyî ku ew minetê hilînin, dadidin sobeyeke ji darên êzingên hizîzkê da li ser bikielînin şorbenîskê.

Serê sibehan, xort xarê dibin ser xaniyan da bavêjin berfa sor bi mifsiyan. Ji hember davêjin hevdu gulofîtkan, ew hemû bi hev re dibin nola zarokan. Bi azana meleyî re ew dibin sofiyên mizgeftê, piştî banga selelah û heyeelalselayê.

Li wê derê çarçî heye, qahwexane, sînema, meyxane hene; li wê derê dîhn hene, kufurbaz, diz, qumarbaz, sextekar, fesad hene; li wê derê egît hene, mêrxas, navdar, mîrek û beg û maqûl hene. Li wê derê dost hene, heval hene, samîmiyet û bext heye... Li wê derê jiyan heye... Ew der, cîhê te bi xwe ye, ezbenî.

Tebaxa 2003yan

enwerkarahan@hotmail.com

Kîselên Qobadî firiyan û xelat wergirt

Filmê derhênerê kurd Behmen Qobadî xelata Festîvala Filman a San Sebastian stand



Sîrwan Hecî Berko

Filmê "Kîsel dikarin bifirin" ê derhênerê kurd Behmen Qobadî, ku xelata îsal ya Festîvala Filman a San Sebastian wergirt, behsa jiyana zarokên kurd ên goriyên şerî dike. Çîroka filmî êvara şerê emerîkî-brîtanî li dijî rêjîma Iraqê li kampeke penaberên kurd li başûrê Kurdistanê dest pê dike û bi rûxandina dîkatorê Iraqê yê berê Sedam Hisênî bi dawî tê.

Leystikvanê sereke Kak e, ku bi navê "Heyva destkirt" tê naskirin. Kak ciwanekî kurd e ku serkêşiya artêşekê ji sêwiyan dike. Ev sêwî ji ber rewşa xwe ya xerab mînan didin hev û wan difiroşin, tevlî xetera teqandina wan, ku dikare bibe windakirina perçeyine ji canên wan. Kak hinekî bi ingilîzî dizane û dulabên-biskilêtan bi kar tîne, da ku di rêya heyvên destkirt de nûçeyan ji kanalên televizyonê yên navneteweyî bikişîne; tenê nûçeyên ji kanalên ku islam wan "qedexe" dike, nayên kişandin. Kak bawer dike ku welatê wî dê bi hatina Emerîkiyan bibe bihûşt.

Rojekê ji rojan, kurekî seqet li gel xwişka xwe ya piçûk û kurekî kwîr digihê kampa penaberan. Kak hêdî hêdî trajîdeya wan nas dike û xwe bi temamî mijûlî vê yekê dike.

Film bi şêweyekî komîdî dest pê dike û bi diyarkirina kuştin û trajîdeyan bi dawî tê. Behmen Qobadî di civîna bo çapemeniyê de diyar kir, ku "film behsa siyasetê nake, lê belê behsa jiyana rast a van kesan dike." Wî berdewam kir û got: "Min hewil da, ku dîmenên ku ji aliyê heyvên destkirt ve têne piştguhkirin, pêşkêş kim. George Bush û Sedam Hisên bûne du qehremanên televizyonê yên radeya yekem, lê qehremanên bi rastî ev zarok in."

Behmen Qobadî eşkere kir, ku wî di serdaneke xwe ya bo Iraqê de dît, ku "ev kes û bi taybetî zarok di çi trajîdeyê de ne, di wê demê de ku alavên ragihandinê dawiya şerê Emerîka li dijî Iraqê ragihand." Ji ber vê yekê, weha Qobadî, wî xwe mîna "berpirsyarekî goreyî" bo diyarkirina vê trajîdeyê hest kir.

Qobadî li ser siyasetê jî rawestiya û got: "Ji ber ku ez kurd im, çare tune ku ez behsa siyasetê nekim. Ez bi rûxandina Sedam Hisênî kêfxweş im, lê hebûna Emerîkiyan li herêmê min xemgîn dike; wan dikarî berî niha bi demeke dirêj hatibana."

Hêjayî gotinê ye, ku Festîvala Filman a San Sebastiàn giringtirîn festîvalên Ispanyayê û yek ji giringtirîn festîvalên Ewropayê ye.

Çavkanî: MIO

Dîmenek ji filmê "Kîsel dikarin bifirin"



www.arsiv.org

Kurdî dersê Demokrasî dûnî Rojhelatabinatîn



Seyîdxan Kurij

Duwes serî cuwa ver 4 aşmê octobre 1992 de Başûrî Kurdistan de Devleta federala Kurdistan nîyay rue. Ruenayiş na Devlet semedî pîyerê Kurdana yew serfîrazê ya. Ez wazena bi no nuştey xo bi kilmkî prosesî ruenayiş na devlet ser vindirî.

Qidok yenû zunayiş 1988 de devleta Iraq bi çekanî kîmyevî eşt Kurdîstana Başur ser. Bi namê hareketa enfal verba Kurdan yew xerbo zaf kerat rûmna. Dewî û bajarî Kurdistan bi çekanî kîmyevî vêşnayî, kerdî xirabe. Bi hezaran Kurd bî kueçbar şî Îran û Tirkiya. Na felaketa pey 8 partî Kurdîstana Başûr amê pîyehet bi namê „Cepheyî Kurdistan" yew cephe na rue. La hareketa Kurdîstana Başur zaf bibî zayif, kuwet ra kotibî. Kurdistan de zaf kêm Peşmerge mendibî.

Payîz 1990 de Saddam Huseyîn eşt Kuveyt ser, kuveyt îşgal kerd. Amerîka no îşgal qowil nikerd û Iraq ra waşt ke kuveyt ra vecîyû. Iraq Kuveyt ra nivecîya. Nê ser Amerîka verba Iraq herb îlan kerd. No waxt de Cepheyî Kurdîstan bi muhalefetî Iraq a zaf kombîyayiş viraştî.

Cepheyî Kurdistan her waxt va ; „ No herb , herb ma nîyû, ma tor nî herb nibenî". Na poltîka raşt bî. Per bîn ra Cepheyî Kurdistan kom bi kom peşmergê şawitî Kudistan û bajaranî Kurdistan de xo organize kerd.

Amerîka Iraq Kuveyt ra vet û firayîş teyaranî (Hawafir) Iraq kerd qedexe. No qerara pey şarî Kurdistan cesaret girot û qic a pîl, cînî û camîyerd viriştî pay, sare darit we. No dem (Esri seserra vîstin) sarewedartişî înayin nidî. şarî Kurdistan % 80-90 myan no şoreş de ca girot. Serre Aşme nîsan 1991 de dest ci kerd, hîrye hefte de Kurdan pîyerê Kurdistan xelisna.

Raya giştî dinya de yew xeletî bîya vila. Heta zaf Kurd zi ge-ge îna nusenî ke George Bush va sare wedarîyen, Kurdan saredarit we. Zaf enteletuelanî çepan zi Kurd sey ajanî emperyalistan nîşan dayî. No vînaye xelet o. Ço milet bi qalê yew merdim sarewenidarena. Rojnamewanê Alman Liesse Schmid o waxt Kurdîstan de bî. A kîtab xo ye bi namê „ Bedelî Azadî" de nusena ke Kurdan bajaran de Palkayan de, Mehlayan de, mekteban d,e Zaningehan de kom û komîtê naybî rue û nê komîteyan sarewedartişî 1991 organîze kerd.

Amerîka firayiş hawafiranî Iraq qedexe kerdib, la Iraq Hawafirok(Helikopter) xo viriznayî û Kurdistan bomba kerd. Tersê çekanî kîmyevî veri şar Kurdistan bi milyonan hetî sinor Îran û Tirkîye şi. No zi yew sarewedartiş, yew protesto bi. Hîrye rojî televîzyonan Dinya na felaket sey xebera verîn da. Rexistinê Yewbîyaye Miletan (RYM) bi namê 688 yew qerar girot û niverda eskerî Iraq parelelê 36 in vyerî. Kurd koyan ra tepîya gêray a şî bajaran.

Iraq îdarê xo Kurdistan ra ûnt û ambargo na Kurdistan ser. Îdarê Kurdistan kot destî Cepheyî Kurdistan. Cepheyî Kurdistan 8 aşmê Nisan 1992 de qerar vîcnayiş parlementoyî Kurdistan girot.19 aşmê Gulan 1992 de semedî Parlemento ya vîcnayiş virazîya. No vîcnayiş rojhelatabinatîn de vîcnayişo tor demokratîk bi. Partîya kominst ra heta partîya islamî kotî no vîcnayiş. Her partî bi azadî propagandayî xo rumna, program û projeyî xo şarî Kurdistan re eşkira kerdî. Semedî parlemento de ca girotiş % 7 bend (baraj) bi, la no bend semedî kêmnetewan (azinlik) nivyertîyen. Cepheyî Kurdîstan yasayî vîcnayiş de semedî kêmnetewan 5 kulsî belli kerd. Heta ewro zi 3 mebus ke bi no usul amê vîcnayiş parlementoyî Kurdistan de Asurîyan temsîl kenî.

Zaf devletanî Ewropa ra temsîlkarî devletan, dezgeyanî sivîlan û poltikwan semed ke bi çimanî xo ca de vîcnayiş vînî, şî Kurdîstan. Vîcnayiş sey yew şenayî vyert. Kurdan bi keyf û eşq, bi şenayîya rayî xo eştî sandiqan. şoreşgeranî 1968 ra yew Fransiz va; „ Ez vîcnayiş ra nefret kena, la mi heta nika emir xo de îna yew vîcnayiş o bi heyecan nidîb" şarî kuristan ho tarix nusenû.

Parlemtoyî Kurdîstan 5 aşme Temuz de hukmato verîn na rue. Cuwa pey 4 aşmê Octobre 1992 de Parlementoyî Kurdîstan qerar xo yo tarîxî da û Devleta Federala Kurdistan na rue.

Pîyerê Kurdî dinya bi no vîcnayişî, ruenayiş Parlementoyî û ruenayiş Devleta Federala Kurdîstana zaf bî şa. Pîyerê Kurdan no parlemento û hukmat sey temsilkar şarî Kurdistana Başûr qebul kerd. La têna yew Partî (PKK) no parlemento nisinasna, verba nê parlementoyî û hukmatî Kurdîstan şer kerd. Mesûlanî PKK ey Ewropa serbajaranî devletanî Ewropa de konferansî rojnamewanî viraşt û no parlemnto sey parlementoyî di eşîran nîşan da. Înan verba no parlmentoyî bi namê Meclisa Netewîya Kurdistan (KUM) yew meclîs na rue.

Bi no qerarî Parlementoyî Kurdistan makus taleh Kurdan bedilya. Kurdan utopyayaî xo ya 200 ser qe nîyeb yew parçe de û qismî ard ca. Kurdan tarix de raya verîn bi rîyê o demokratik yew parlemento vîcna û no parlemento ra yew hukmat vecîya. Kurd ke dinya de sey yew milet neamenî qebul kerdiş. Zaf Devletanî dinya de bi resmî amê qebul kerdiş. Serekî Kurdan bi serek devletana amê yew ca, pîya nişt rue. şar Kurdistan 200 sera pey raya verin erd xo ser bi azad û serbest. No parçey Kurdistan de hezî xerîb nimendî, şarî Kurdistan bîye tersî esker, polîs û cendiraman cuwe xo rumnena.

Ez 1994 de bi 3 ambazana sey yew turist şîya Kurdîstan. O waxt hal aborî zaf xirab bi. Iraq ser amborgoyî dinya bi, Kurdistan ser him amborgoyî dinya, him ey Iraq, hîm zi ey Tirkiya bi. Ceryan çiniyebi, palkê, karxanê qicik zi nixebitîyayn; çimkî rid ambargo ra Kurd neşkayn parçeyanî makînan biernî. La hancî zi Kurdan dest ci kerdib dewan de banî xo newe ra viraştîyen. Partîya BAAS 4500 dewê Kurdîstan kerdibî xirabe. Kurd ke şibî Îran û Tirkîya tepîya amenî û şinî dewanî xo. Cemaat de dînamîzm bî. Roşnvîran, mexlîman, wendoxan, Cînîyan, hiristîyanan, Ezdîyan komelî xo sazkerdib azad û serbest kar û xebatê xo rûmnayn. şarî Kurdistan mesûd bi, hal xo ra zaf menûn bi, çimani înan de roşnayî ya mesûdey bî.

1996 de RYM yew qerar girot, namê no qerar Oil for Food (Semdî nana Petrol) bi. Goreyi no qerar peranî petroli Iraq ra yew miktar pere dîya Kurdan. Kurdan bi no peran Kurdistan de zaf çîyê weş kerdî. No 10-12 ser de hama hama dewî xirabîyayê hêna virazîyay, kê şehîdan re banî virazîyay û meaş dîyay înan. Pîyerê dewan de mektebî virazîyay, Hîrye zaningehî girdan de bi Kurdî ders diyena. Rîyê Kurdistan heta dewan virazîyay. Semdî xortan û cînîyana projeyî virazîyay. Di telvîzyoni satelît û bi dehan televizyon heremî bi Kurdî bernaman virazenî. Bi sedan kovar û rojnamey vecîyenî. Weşanxanê bî a, bi hezaran kîtab vêcîyayi. Hukmat Kurdistan bacî xo ra semedî guranî kultur û zanistî peran dûnû.

Nê seranî peyinan bi Tirkiye de masmedya heqaret kena Kurdan. Medya Tirkan bi hususî zi Stalinistî Tirkan Devleta Kurd sey devleta Kukla, Îsraîl o didin nîşan dûnî. Ê serekanî Kurdîstana Başûr zi sey serek eşiran nam kenî. Çi gûne ke yew qisim Kurd zi kotî myan nê koro.

Nê bi eşkira Kurdan re duşmeney kenî. Nê Tayn partî û serekanî Kurdan name kenî û qaso têna înan rexne kenî. La gereka kî na ya mexapîyû, ê niwazenî Kurd qederî xo bigirî destî xo, niwazenî Kurd obje bî. Rojhelata binatîn de Tirkîya û Îsraîl zi pa ço devlet sey Devleta Kurd demokratîk nîya. Ewro têna Kurdîstan de her qide fakir serbestû, her qide Partî rahat karî xo ye sîyasî kena. Têna Kurdîstan de kêmnetew mektebban de bi ziwanî xo winenî, bi ziwanî xo vilakerdişî radio û televîzyon virazenî. Hanc têna Kurdistan de kêmnetew parlemento de bi name xo ca genî.



Qicî Uveyş hê se vûnî?



Selim Çürükaya

Şima zûnî Avdila ho Imrali di o, O qitalek Osman ho Suleymaniye di o.

Avdila vûnû: Dekê (dadî) mi Tirk a

Osman vûnû: Dekêmi Kurd a.

Avdila vûnû ez Mustfa Kemal ra zaf hes kena.

O qitalek Osman vûnû: Ez Mala Mustfa Berzanî ra zaf hes kena.

Avdilavûnû: Ez Amerika ra xui kena.

Osman vûnû: Amerika zaf hola

Avdila vûnû: Eskerî Tirkan û Mustafa Kemal zaf başî.

O qitalek vûnû: Nê, eskerî Kurdan, Mesut Barzanî û Celal Talabanî hîna başî.

Avdila vûnû: Kurdan re devlet lazim niya, devleta Tirkan ma ri zi besa.

O qitalek vûnû: Biray mi ho bin emir eskerî Tirkan di o.

Avdila vûnû: Osman ma kotû vararde Talabanî.

O qitalek vûnû: Avdilay ma kotû vararde eskerî Tirkan.

Avdila vûnû; " Ez Ala Tirkan ra",

Osman vûnû; " nê ez ala Kurdan ra hes kena.

Ma zi şaş bi mendî, ma nizûnî ke kam ho rast vûnû, ma ey dima şimî?

Eg şima mi ra pers kenî, ez vûna wird zi hey zuir kenî. Bo ma no qide bikir her çî belû benû:

Kî Avdile berû Suleymaniya û ey qîtaleki berû Îmralî

O wext Avdila vûnû: Mala Mustafa Balzanî ra girdier na dinya de Kes çinû.

O qitalek vûnû : Ez qirbûnî to bi Mustafa Kemal.

Yanî şima fehmi bikirî nyan yew saat de Osman benû Avdila, Avdila benû Osman.

Kurdistan ra şanoger yenî Almanya



Yew komê tîyatro semedî kaykerdiş kay xo yî bi name „Welatî sereyan" yenî bajarî Almanya Mulheim an der Ruhr.

Wendoxî Akademî Hûner no kay kaykenî. Kay Nîyaz Letîf nuştû û Rubar Ehmed semdî sahne ya hedre kerdû. Bajarî Mulheim an der Ruhr de festîvaley şanoyan esta, na komê tîyatro zi Kudistana Başûr ra no semed ameya. Raya verina ke Kurdîstan ra yew kom yena Almanya û kayî xo peşkeşî temaşoxan kena.

No Kay 05.10.2004 de roja sêşeme sehet 8:00 şand de kaybenû.

Kurdî Ewropa rejîmî Suriyê protesto kenî

STOCKHOLM/DEN HAAG (PK) – Kurdî Ewropa Swêd û Holanda de bi di xonîşandayişa (mîting) wazenî hukmat Surîye protesto bikirî. Devleta Surîye 05.10.1963 de bi hezaran Kurd hemwelatîyê (Vatandaşê) ra eştib. Nê Kurd ke hemwelatîye ra erzîyayî, Surîye de qet yew heqî înan ey însanî û sivîl çînû. Kurd Ewropa dozê çarekerdiş persa Kurd kenî û Yewbîyayê Ewropa ra wazenî ke paştê Kurdan bigîrû.

Kurdî Swêd roja 2 aşmê Octobre de xonîşandayişî protestoverî konsolosxanê Surîye ey Stockholm de virazenî. Diruşmê (Parola) no xonîşandayiş îna yî : "tepîya cidayiş hemwelatî û heqî pîyerê Kurdan", " Serbest veradyiş piyerê hepsî ke hepisxaneyanî Surîye di ê", "çarekerdiş persa Kurd û piyerê Surîye de querikerdiş heqî merdiman".

Însîyatîf Kurdanî Surîye ey Swed no xonîşandayiş amade kenû û heme rexistanî Kurdistanî zi paşt dûnî na xebat.

Per bîn ra rexistînî Ewropa ey partî Kurdan 5 aşmê Octobre de bajar Holanda Den Haag de yew xonîwandayişî protesto ey navendî virazenî.

Hedrekerdoxî nê xonişandayişanî protesto Kurdanî ewropa ra wazenî ke paşt bidî nê xebatan ke pîyer pîya "Çimsorey memûranî Surîye vindarnî" Çimkî devleta Surîye sarewedartiş şarî Qamişloya pey Kurdan ser ziwar xo hêna kerdû zixm.

Dersim Vêşenû



Roja 20 aşmê Elûl de Pulur(Ovacik) de mabeynî Kusluca û Bilgeç de binatê eskeranî Tirkan û şerwananî Kongragel de şer vecîya. No Pîyerdayişa pey adir koti birr, no çend roja ke birr ho vêşenû. Gegane va o pît yenû û no rid ra adir benû geş.

Goreyî agahdarîya şefîya daristanî ey Pulur heta nika 200 hektar yanî 2ooo donûm erdî daristan vêşawû. Vanî heta nika Dersîm de hend birr nêveşawû.

100 serre nat nesî no birr nêbirnawû, zafê cayan de tayê darî heta 20 metro biyê derg.

Kalan de dezgeyanî sîvîlan û partîyanî sîyasîyan pîya bi yew waştenameya (dilekçe) sare da sawcîye Tuncelî re.

Serleşkerî Qerequelî bi xo birr vêşna

No waştename de îddîa benû ke birrî dar û domarey Qeerquekî Torunoba zi bi destî eskeran amewo vêşnayiş û waştename îna rûmenû: " Yew mûde cuwa ver dewê Xozat Akören de eskeranî Tirkan birr vêşnabi. Birrî nizdî qerequelî Karşilar zi bi emir serleşkerî qerequelî perî eskeran ra amebi vêşnayiş.

Politika Dewlete Dersım de Sobûnawa

Wext ke cayê Tırkiya de pırtıkê bırr bıvêşo, hawa ra, edr ra desinde (ca de) mudahale kenî. Hama Dersim de birr vêşenû kês herinde xo ra nêlewiyenû(nileqenû). Tirkîya de ke bırr vêşa dewlete vûna "servetê ma dariya we", hama Dersim de ke bırr vêşa dewlete ey servet nêvînena, mudahale nêkena.

Goreyî vateyî Memuranê Bırri; ê dihîrye ray şî ke adir hûnakirî (wesaynê), la cendirman ridî "emniyeti" ra niverda. şarê Pulr zi wazenû ke adir hûnakirû,la eskerî niverdenî.

Bi serano ke devleta Tirk bırrê Dersımi vêşnena, lete o zêde 1994 de vêsna. Bırrê Dersimî servet nîyo çiko? Waqfê TEMA, sobîna komelê sivîlî kotiê? Çira vengê xo nêvecênî?

Munzur Haber/ sesonline

BİLBİLO

Gawanê Welatî

Bilbil ho mîyon bax gulon do
Çim yi ho sed bàxûn bînon do
Çim ki ina dunya di
Ho yo gule henaron do

Surgullere surgulona
Çey haline bulbulona
Çim û biryeu tiyeser dona
Zere û ciger mi tadona

Engure baxon sursurî ya
Ez gileb gile tirakirî
Aşme ruejî remezon di
Pey fitare xwi akirî

Keyne ma şumi pey Golawo
Susareke ware mawo ~
Kar û guire rindon onawo
Naz û nuzî tim pîyawo

Werdege guale hedirâ
Gueme ye ho perî serâ

Sey hingmin hebe şekira
Ya nişta mi ser cigera

Zermonike mîyon baxçana
Vile daron alinçuna
Zero ciger mi taduna
Gilguaşare gilbarîya
Yo çim siya ya qum barîya
Ser refe keynun warîya
Vunî oma ya şîya mi nidîya
şoq zerdone na dilbero
Rueşt xwi dawo ni suqbero
Vile ver ruej mîyon keybero
Adir ye vist mi cigero

Yay xwi dawo verariuejo
Ya çim siya ya gile kejo
şoq ye dawo aşm u ruejo
Nivindena zera gejo

Kevunu vile ni kueyona
Şeş vaş albik ya buly dona
Bi sund mishef ha suez dona
Waştî Huseni key axona

www.arsiv.org

پاشماوەی سەردار دۆسکی ...

لە هەمرۆ براوەکاندا بۆ ناو کوردستان "

پ: ڕاپۆرتی خۆتان سەبارەت بە سەردانەکەتان بۆ کوردستان؟

و: پاش گەڕانەوەم لە کوردستان ڕاپۆرتێکمان نووسیوە کە بڕیتیە لە شەست لاپەڕە ، دەربارەی گەشتەکەمان بۆ کوردستان ، هەر کەسێک هەر حیزبێک یان ڕێکخراوێک یان لایەنێک دواکاریەکی هەبووبێت لەو ڕاپۆرتەدا ناومان بزدووە ، هەروەها شێوەو چۆنیەتی هاریکاری کردنی کوردستان ، داوامانتە دەست وەزارەتەکانی ناوخۆ و دەرەوە و ئابووری ، ژووری یەک و دووی پەرلەمانی هۆڵەندی ، ئەنجومەنی پیران و هەروەها زۆر لە ڕێکخراوە خێرخوازەکانی هۆڵەندی ، ئێستا سەرقاڵی ئەوەین ئەو ڕاپورتەی نووسیومانە و بەزرمان کردۆتەوە کاری باشی بۆ بکەین بۆ ئەوەی ئەو داواکارییانەی تیایدا هاتوون بە زووترین کات جێبەجێ بین ، هەروەها دەیدەینە خەڵکی تریش وەک مامۆستاکانی زانکۆ و پڕۆفیسۆرەکان و ئاگاداریان دەکەینەوە لە بار و دۆخی کوردستان و داوایان لێدەکەین بچن لە کوردستان کاربکەن و هەروەها دەیخەینە بەرچاوی ڕێکخراوە هۆڵەندیەکان و پێیان دەڵێین ئەوە بار و دۆخی عیراقە و هەروەها ئەوەش بار و دۆخی کوردستانە .

پ: بەرەنگاربوونەوە بە چالاکی وەک ڕاپێوان و ڕاپۆرت و داواکاری و پشتگیری دژ بە بڕیارەکەی خاتوو لیزدۆنک وەزیری کاروباری پەنابەران و گونجاندن.. کە دەڵێت ئەو پەنابەرانەی وەڵامی نێگەتیڤیان هەیە دەبێت بگەڕێنەوە بۆ کوردستان.. گەشتوونەتە چ ئاستێک؟

و: بەداوەری من هەر دەوڵەتێک دەتوانێت پەنابەر لە دوو حاڵەتدا بنێرێتەوە بۆ وڵاتی خۆی : یەکەم ئەگەر ناسنامەی ئەو کەسە جێگیر بوو واتا زانیاری تەواوت هەبێت ئەو کەسە ناوی چیە و لە چ دەوڵەتێکەوە هاتووە ، دووەمیش ئەگەر وڵاتەکەی باوەڕ بەو زانیارییە بهێنێت و پێشوازی لێبکات ، بۆ حاڵی یەکەم هیچ کێشەیەک نییە چونکە تۆ دەڵێیت من کوردم و خەڵکی کوردستانی عیراقم ، بەڵام کێشەی دووەم ئەوەیە کەوا عیراق نیستا ناتوانێت پێشوازی لەو پەنابەرانە بکاتەوە و هەڵوێستی خۆشی لەو بارەیەوە بە ئاشکرا ڕاگەیاندووە ، هەردوو ئیدارەی کوردی لە هەولێر و سلێمانی ئەوەیان ڕاگەیاندووە.. ئەمەو بێگومان بەڕای من ئەوە شتێکی واقاسان نییە بتوانرێت ئەو هەموو پەنابەرە بگەڕێنرێنەوە ، ئێمەش وەکو پارتی سۆسیالیستی هۆڵەندی لەگەڵ چەند حیزبێکی تری بچووک و لەگەڵ نزیکەی ٢٧٠ ڕێکخراوی مرۆڤی لێرە لە هۆڵەندا قسەمان کردووە و لە ئاکامدا ڕێکخراوێکمان دروست کردووە لە دژی بڕیاری وەزیری پەنابەران و گونجاندن خاتوو (فیردۆنک) و هەروەها ڕێپوانێکمان سازدا و لەناو پەرلەمانیشدا زۆر پشتگیریمان لەو کەسانە کردووە و داوای پارەدۆنی گشتیمان کرد بۆ ئەو کەسانەی لە پێنج ساڵ زیاترە لێرەیە مافی پەنابەری پێبەخشرێت و ئەوەشی تازە دێتە ناو هۆڵەندەوە پاش سێ مانگ بڕیار لە داواکاریەکەی بدرێت و ڕاینەگرێن و نەک ٥ یان ٦ یان ٧ ساڵ لەناو تۆزدۆکاگانی گلدانەوەی پەنابەران بیانهێڵنەوە

بچوک بچوک دەنووسێ: من قێزم لە تۆ دەبێتەوە، واتە من تۆم خۆشناوێ، من تۆم خۆشناوێ واتە، قێزم لە تۆ دەبێتەوە. تا دەڕوا لە دوای خۆی قرتیان دەدا. سەرئەنجام سەدری بەعەزم پێندەزانێ و داوادەکا کە واز لە میرزا بێنن چیدیکە بەدوایدا نەڕۆن. میرزا بەهێزەوە هەر چەندە بەسەختی دەڕیا بەڵام هونەرەکەی لە شتی دیکە بەگەورەتر دەزانی. ئینجا باسەکە بەرەو ئەو لایەنە دەچێ کە میرزا مالەکەی لە کوێ بووە و خانوەکەی چۆن و چەند ژوور بووە و نووسیوێتی: مالی میرزا حەوشەیەکی هێندەی لە پێ دەستی تێدا بوو کە باخچۆکەیەک و کۆمەڵی مریشکی تێدا بووە کە بێ پەروا لەم ناوەدا خۆلاوتنەتەوە. هەر کاتێ لە ژوورەوە دەچووە حەوشە و مریشکەکان دەوریان دەدا و کە لە حەوشەدا چاوی غافڵ کردبا، مریشکەکان دەهاتنە هەیوان و دەستیان بە گارەگار دەکرد. کە مریشکەکان هێلکەمیان دەکرد دەهاتنە هەیوان و ژوورەکەی میرزاوە و گارەگاریان دە ناوە. میرزا لە ژوورەوە دەیگووت هێلکەت کرد، باشت کردا. میرزا لە ژیانی ڕۆژانەیدا جگە لە خۆی و هونەرەکەی پەیوەندی بە شتێکی دیکەوە نەبوو. کە شایانی باس بێ، هەموو وەختەکە هەر لە مەشق و کاردا بوو. زستانان بە هۆی درێژی شەو و هاوینان لە بەر هەوافێنکی، بەدرێژی ساڵ بەر لە خۆرکەوتن بیداربوو تا خەوتنان جگە لە مەشق کارێکی دیکەی نەدەکرد. نیوەڕۆی هاوینان سەعاتێک دەنووست و زستانان ١٠-٢٠ دەقە لە ناو کەوڵەکەی چاوی خۆی گەرم دەکرد. ڕێبازی ئەو، ئەو ڕێبازەبە کە لە پاشدا بە (هونەر بۆ هونەر) ناسرا. ژیانی کەڵەبوو زۆر سەخت گوزەراوە: لە "تاریخ اجتماعی و اداری قاجاریە"دا، دەخوێنینەوە: "ئەواوی خانەوادەکەی کە لە چوار کەس و کچۆلەیەک زێتر نەبوون، لەگەڵ ئەمشدا کە ئەو سەردەمە زۆرهەرزانی بوو، وارویدەدا تا دوو سەعاتیش دوای نیوەڕۆ کە قوتابیەکانی دەگەیشتن و چەند قرانێکیان یارمەتی دەدا، ئەم خانەوادەیە نانی نێوە ڕۆیان نەخواردبوو. نووسینەکە زێتر و زێتر باسی هەژاریە زۆرەکەی میرزا کەڵەبوڕ دەکا و بەراوردی دەکا لە گەڵ کەسانێک کە لەگەڵ پلە و پایەی ئەو دا بەزاوزد ناکرێن و لە سایەی نووسینەوەی چەند شیعرێکی مەدح، جۆرەها دیاریان بۆ چووە.

●●●●●●●●

خوێندەری بەڕێز، ئەم ووتارەم لە بڕای خۆشنووسم کاک بڕار پێگەیشت کە لە دەفتەرێکی "چاپکراوی قەبارە گەورەدایە بەناوی "مزقمات خط و چەند نووسەرێک لە شێوەی ووتار و لێکۆڵینەوەی درێژ لە سەر چەند خۆشنووسێکی گەورەی ئێرانیان نووسیوە. ئەوەی سەرنجی منی ڕاکێشا، وەک کاک بڕار بڕی پاس کردم، میرزا ڕەزای کەڵەبوڕ بوو. بەڵام لەبەر ئەوەی وێکیشمان بۆ دروست بکەن و پاشنیش بڵێن بڕۆرەوە بۆ لاتی خۆت ، جگە لە کێشەی ئەو منداڵانەی لێرە گەورە بوون و خوێندوویانە و ئێستا دەنێردرێنەوە ، ئەوەی من ئاگام لێیە هەموو میللەتی هۆڵەندا بە شەرمی دەزانێت ئەو بڕیارەی وەزیری پەنابەران بە ناردنەوەی ئەو پەنابەرانە ، نە ڕێکخراوە خێرخوازەکان نە حیزبەکانی ئۆپۆزوسیۆن لە هۆڵەندا و هەروەها پەنابەرەکان خۆیان و حکومەتی عیراقیش و هەردوو ئیدارەی کوردیش هیچی قایل نین بەو بڕیارە، بڕیە بە باوەڕی من ئەوە کارێکی ئاسان نییە و تەنها مەسەلەکە کاتە .

پ: لەبەر ئەوەی ژمارەیەکی زۆر گەورەی کورد لە دەرەوەی کوردستان ژیان بەسەر دەبەن هەبوونی لۆبییەکی کوردی لەدەرەوەی کوردستان تەمڕۆ بڕوێتە زەروورێتێک بۆ بەکخستنی دەنگی کورد و بەکخستنی دۆزو ئامانج و خواستە سیاسیەکانی کورد لەدەرەوە، لای ئێوەش هەر وایە؟

و: هەڵبەتە ئێمە ئەمڕۆ ئەتوانین بە شێوەیەکی شارستانیانە تر و پێشکەوتووانەتر داکۆکی لە دۆزی کورد بکەین و بیبەینە پێشێ لە کۆمەڵگای نێونەتەوەیی ، وەک دابین کردنی مافی سیاسی نەک تەنها مافی کۆمەڵایەتی و دۆزی کورد بە دۆزێکی سیاسی نەک مرۆڤایەتی بدرێتە قەڵەم ، ئەوەش زۆر زۆر گرنگە ، ئەوە وەستاوەتە سەر بەپەوەندی و دۆستایەتی ئەم وڵاتانە لەگەڵ حکومەتی هەرێم و حیزب و پارتە سیاسیەکانی ناو کوردستان ، هەروەها مەسەلە بازرگانی و کۆمپانیاکان و دروستکردنی لینک بۆ ناو کوردستان و لەو ڕێگەیەوە لۆبی کورد دروست دەبێت کە دەبێت کاری بۆ بکرێت چونکە ئەمڕۆ کورد هیچی لە میللەتانی ئەم زەمینە کەمتر نییە چ لەناو وڵاتەکەیدا چ لە تاراوگە ، هەبوونی لۆبییەکی پەکگرتووش ئەوە بەرجەستە دەکات. چونکە من ئێستا باوەڕم وایە ئێمە میللەتێکی ڕەزیل نین و تەنها ئەو میللەتە نین کە کێشەیی پیا کرا و نەنفالکرا و زوڵم و زۆرداری بینی ، ئەو قۆناغە ڕۆشت و بەسەر چوو ئێستە ئێمە میللەتێکی بەهێزین و پێشکەوتوو و پێشکەوتووخوازین و نەوتمان هەیە ، حەز بە دیموکراتی دەکەین و بەرقەراریشمان کردووە ، هەرئەوە ماوە وڵاتەکەمان زیاتر زەنگین بکەین بەباشترین دۆست لە جیهانی یەکەم و ئەورووپا و ئەمریکا، و باوەڕیشم وایە هیچ میللەتێکی تر نییە لەبڕۆژەڵاتی ناوەڕاستدا وەکو کورد توانا و ئامادەگی پێشکەوتن و دۆستایەتی هەبێت ، هەروەها کوردستان دەتوانێت ببێتە بازارێکی زۆر زۆر گەورە بۆ کۆمپانیا بیانی و ئەورووپیەکان لە ناوچەی ڕۆژهەلاتی ناوەڕاستدا ، ئێمە بازارێکی باش بۆ ئەوان دابین بکەین و ئەوان لەبەرامبەردا پشتگیری سیاسیمان بۆ دابین بکەن .

پ: دوا وتەی بەڕێزتان لەم دیمانە کورتەدا.. دەتانەوێت چی بڵێن؟

و: من لە هەر جێگەیەک بم ، هەر پلە و پایەیەکم هەبێت ، یان نەندامی هەر حیزبێکی هۆڵەندی بم یان نا ، من خزمەت و خەباتی خۆم دەکەم بە میللەتی کورد ، لەبەر ئەوەنا ئەوان ئەوە دەخوازن بەڵکە لەبەر ئەوەی من ئەوە دەخوازم و خۆم بە دڵسۆزی میللەتەکەم دەزانم .

باسەکە زۆر درێژ کراوەتەوە و زۆر جاران پێوەندی بەم هونەرمەندەوەنیە، بڕیارم دا لە شێوەی ئامادەکاریدا وەری گێڕم و وەک هیچ کارێک بێتکەم و کورتی نابێ بەڵام بێسوود نابێ. هیوادارم کەڵکتان بگرێ و سوپاسێکی جوانیش بۆ کاک بڕاری هونەرمەند، دەبێ لە پیرمان نەچێ کە ئەم لێکۆڵینەوە لەلایەن نایدین ئاغداشلو نووسراوە وئەو مۆزەخانەی هونەرە دا خوێندراوەتەوە. -گۆشاد-



کەلوپەلی ماڵەت

کاوڕ ٣.٢١ تا ٤.٢٠

دەنگریاسێک لە خوشەویستەکەتان وەردەگرن، دەبێتە جێگای دڵخۆشیتان. دەتوانن لە سەیرانگا پێکەوە دەرکەون و پەیوەندی خۆتان گەرمتر بکەن. لە بەرامبەر یەکتر بە شێوەیەک پۆزەتیڤانە بیربکەنەوە و ئێرەیی لە یەکتر نەکەن.



گا ٤.٢١ تا ٥.٢٠

ڕۆژێکی خۆش و شاد دەربازدەکەن. هەول بدەن بۆ پێشخستنی کارەکەتان شێوەی خەباتی تازە بەکاربێنن. لە کاتێکی هەستیاردا دەڕۆن و پێشنیاتی نوێتان بۆ دەردەکەون.



دوانە(جمک) ٥.٢١ تا ٦.٢١

هەستی ئێوە ناسک دەبێ. قورسایی خۆتان دەخەنە سەر کار. بە هەندێ ڕووداوی تازە دڵ و دەروونی ئێوە شاد دەبێت. پشتیوانی دۆست و هەڤاڵانی خۆتان بکەن و پەیوەندیتان قوڵتر بکەنەوە.



قرژاڵ ٦.٢٢ تا ٧.٢٢

ئەمڕۆ ڕۆژێکی پڕ لە ڕووداوە، دەتوانی کۆنترۆڵی هەست بکەیت. دووبارە پێندا‌چوونێک لە سەر پەیوەندی خۆت و خۆشەویستەکەت بکە. بەڵام بە پەلە بڕیار مەدە.



شێر ٧.٢٣ تا ٨.٢٢

هێوا و خواستی ئێوە بە هێزن و بۆ پاشەڕۆژی خۆتان بیری باش دەکەنەوە. بەڵام زێدە بەندی خەیاڵ نەبن و لە دەرەوەی توانای خۆتان نیش مەکەن و بەرپرسیاری گەورە مەخەنە ئەستۆی خۆتان.



فەریک ٨.٢٣ تا ٩.٢٢

ئەمڕۆ ئێوە خاوەن بڕیارن، سەری خۆتان بە ڕووداو مەنێشین. بە ئارامی و گرانبەهایی خۆتان کار لە سەر دەورووبەر دەکەن. پەیوەندی ئێوە و خوشەویستەکەتان دەکەوێتە قۆناغێکی تازە، دوودڵ مەبن.



تەرازو ٩.٢٣ تا ١٠.٢٢

پێندەچێت ئەمڕۆ بکەونە ناو دوودڵی و سەرگێژاوەدا. وا بیربکەنەوە کە کەسانی دیکەی بالا دەستی خۆتان فشارتان بۆ دێنن، بەڵام ئارام بن و خۆتان ڕاگرن بۆ ئەوەی تووشی ئالۆزی و سەرلێشێوان مەبن.



دوو پشک ١٠.٢٣ تا ١١.٢١

هەندێ پێشهاتی تازە و سەرنجراکێش بۆتان دەردەکەون و دەکەونە بارێکی هەستیارەوە، پێندەچێت داوەتنامەیەک بۆتان بێت و ئەمڕۆ ئێوارە بچنە ئەو داوەکردنە.



کەوان ١١.٢٢ تا ١٢.٢١

ئەمڕۆ ئێوە ئاسک سۆکن. دەکەونە ژێر کارتێکردنی هێوا و هەزی جۆربەجۆردا. بۆ ئەوەی لەم دووڵێیە ڕزگاربین. هاوڕێیەتی مرۆڤی گەشبین بکەن.



گیسک ١٢.٢٢ تا ١.١٩

بە هۆی هەندێ ڕووداوی تازە دەکەونە بارێکی ئاناسایی. ئەو دەزگەتانەی کە بۆتان دەزدەکەون لە دەست مەدەن و بە هەر شێوەیەک بێت هەوڵی دەستبەرکردنیان بدەن. سەرڕەق و خۆبەرست مەبن و سەری خۆتان بە شتی بێ بەها مەنێشێنن.



ستڵ ١.٢٠ تا ٢.١٨

داخوازی ئێوە لە زیادبوونداں و پەلە لە ئیش وکارتاندا دەکەن. پێندەچێت بکەونە ناو ناڕاحەتی و دڵتەنگیەوە. خۆتان و دەوروبەرتان ماندوو مەکەن. ئاگاداری خۆتان بن.



نەهەنگ ٢.١٩ تا ٣.٢٠

بە دڵخۆشی و دڵنیایی خۆتان، کارتێکردن لە دەوروبەری خۆتان دەکەن. دووڵی و ئالۆزی لە سەری خۆتان دەرکەن و بە ئارامی و بڕیاری بەردەوامی بە کارەکەتان بدەن.

لەگەڵ دڵخوشی سااڵدی دەوڵەتی کوردستان

دانراو نەبار

جارێکی تر گرنگی کێشەی وڵات، نەتەوە و دەوڵەت

کاتێ مرۆڤ لە مێژوو دەکۆڵێتەوە، دەبینی کە ئەو میللەتانەی ئێستا خاوەن دەوڵەتن، توانیانە هەبوونی خزیان بپارێزن و قۆناغی جۆر بەجۆر سەرکەوتووانە دەربازبکەن، تا گەیشتوونەتە ئەم سەردەمەی ئێمە تێیداین. بەپێچەوانەوە، ئەو گەلانەی کە دەوڵەتیان نەبوو، یان لە جەنگ تووشی شکست بوون، ئەو وڵاتە داگیرکراوانە زۆربەیان لە ناو گەلانی زلهێزدا، پووکانەوە و ون بوون. ئەمڕۆش جیاوازی نێوان وڵاتانی بە هێز و لاواز، لە دەسەڵاتدا بە دیاردەکەوێ. ئەو نەتەوانەی کە بە هێزن دەوڵەتیان هەیە و مێژووی هەر یەک لەم دەوڵەتانە بە رادەی کەم سەدوپەنجا، یان دووسەد ساڵە، بەاڵم ئەو گەلانەی کە بندەستن لە وڵاتی خزیان وەک دیل دەژین، نە دەوڵەتیان هەیە، نە دەسەاڵتی سیاسی. بە پێی زانیاری، ئەمڕۆ لە دونیا نزیکەی شەش هەزار زمان هەیە، هەزار و پەنجا و دوو زمان، زمانی نووسینە. لە جوگرافیای سیاسی دونیادا، ئەمڕۆ سەد و نەوەت و شەش دەوڵەت هەیە و حەفتا و پێنج زمان زمانی فەرمی ئەم دەوڵەتانەن. زمانی فەرمی زۆر وڵاتانیش وەک یەکە، بۆ نموونە (عەرەبی) زمانی فەرمی بیست و یەک دەوڵەتی عەرەبییە. ئەگەر تەماشای ئەو بیست زمانانەی کە بە شێوەیەکی فراوان بەکار دێن، بکەین. دەبینین کەوا زمانی فەرمی ئەو نەتەوانەن کە خاوەن دەوڵەتن و لە ناو ئەم حەفتا و پێنج زمانانەشدا، زمانی هەرە بە هێز و بەربڵاویش زمانی حەوت، هەشت وڵاتی زلهێزە. کاتێ لەم کێشەیە دەکۆڵینەوە، دەبینین پێشکەوتنی هەر وڵاتێک، نەتەوەیەک، زمانێک، کەلتورێک، بە هەبوونی دەوڵەتێکی نەتەوەیی گرێدراوە. نەتەوەکانی کە خاوەن دەوڵەت و دەسەاڵتدارن، هەم لە بواری زمان و ڕۆشنبیری و زانستیدا پێشکەوتوون، هەروەها خاوەن ئابوورییەکی بە هێزیشن. ئێنجا کاتێ ئەم ڕاستییە ئاشکرا دەبێ، مرۆڤ دەتوانێ تێبگات، بۆچی ئەم وڵاتانەی کە کوردستانیان بەسەردا دابەشکراوە، نایانەوێ کورد ببنە خاوەن دەوڵەت؟. چونکە ئەم دەوڵەتانە (تورکی، سوری، ئێران و عەرەبی شۆفینی عێراقی) هەر دەکەن هەمیشە کوردستان لە ژێر دەستی نەواندا بێت. ڕۆشنبیر و سیاسەتمەدارانی کوردیش لە مێژەوە گرنگی دەوڵەتیان هەست پێکردووە و لە نووسینەکانیاندا زەنگی داوەتەوە، لەوانە ئەحمەدی خانی پێش سێ سەدو پەنجا ساڵ بانگ و داوای دەوڵەتی کردووە و هۆکاری دواکەوتنی کوردیشی بە نەبوونی (تاج و دەوڵەت) گرێداوە. لە سەرەتای سەدەی حەفدە هیدی هیدی کارتێکردنی بیروباوەڕی نەتەوەپەروەری و هەزری دامەزراندنی دەوڵەتی نەتەوەیی لە ئەورووپاوە، دەربازی ڕۆژهەاڵتی ناوەڕاست بوو، هەروەها لە لای کوردیش ئەو هزرە پەیدا بوو. نزیکەی سەدوپەنجا ساڵە گەلی کورد بۆ ئازادی و دامەزراندنی دەوڵەتێکی کوردی لە تێکۆشاندایە، واتە ئەمڕۆ کێشەی کورد، ئازادی وڵات و دامەزراندنی دەوڵەتێکی نەتەوەییە. لە باشووری وڵاتمان، ئەگەرچی لە سەر ئاستی نیونەتەوەیی دانپێدانیش نەبووە، بەاڵم دەوڵەتێکی نەتەوەیی هەیە. ئەویش دەوڵەتی کوردستانی فیدراڵە، بۆیە پێویستە میللەتی کورد بە هەموو توانای لە هەوڵی پاراستنیدا بێت. کێشەی دەوڵەتبوون بۆ کۆمەڵگای کوردیش پێویستە بێتە بابەتێکی سەرەکی. چونکە کێشەی نەتەوەیەکی بندەست و وڵاتێکی داگیرکراو بەبێ دەوڵەت چارەسەرناکرێ و تا کورد لە سەر خاکی باب و باپیرانی واتە لە کوردستان نەبێتە خاوەن دەوڵەت، مەترسی سەرکوتکردنی بنەبڕناکرێ.بۆچی دەوڵەت؟ پێویست ناکات لێرە مێژووی دەوڵەت، بەدرێژی پێناسەی بکەین و لە سەری بنووسین. هەر لە دەوڵەتی نموونەی ئەفلاتون و تا مۆدێلی دەوڵەتی مودێرن و دیموکراتی ئەمڕۆ لە مێژووی مرۆڤایەتیدا، ئەو ڕاستیە ئاشکرابووە کە وڵات و کۆمەڵ- پێویستیان بە بەڕێوەبەرییەک هەیە ئەو بەڕێوەبردنەش (دەوڵەتە). لە سەدەکانی نۆزدە و بیستدا، دەوڵەتی نەتەوەیی دامەزران. گەلان بە پێشەنگی ڕۆشنبیران و سیاسەتمەدارانی خزیان، دەوڵەتی نەتەوەییان لە کۆمەڵگای خزیاندا دروستکرد و بەرەو پێشیان برد. ڕووداوی دەوڵەتی نەتەوەیی لە مێژوودا قۆناغێکی تایبەتییە، بەاڵم بەداخەوە گەلی کوردی لێ بێبەش ما و نەیانتوانی ببنە خاوەن دەوڵەتێکی نەتەوەیی. ئەم حاڵەتە تا ئەمڕۆش بەردەوامە. بابەتی وڵات و نەتەوە و دەوڵەت، هەز دەکەین بە وێنەیەکی سروشتی پێشکەش بکەین. وڵات وەک باخچەیێکی گەورە و فراوانە، نەتەوە و کۆمەڵ لە ناو ئەم باخچەیەدا گوڵن.. دارو دارستانن.. میوە و سەوزین.. دەوڵەتیش لە ناو ئەم باخچەیەدا، باخچەوان و دەرگەوانە. ئایا باخچەیەک بێ باخچەوان دەبێ؟ دەرگایەک بێ دەرگاوان دەبێ؟ ماڵێک بێ سەر و خاوەن دەبێ؟ ئەگەر وەاڵمی ئێمە بۆ ئەم پرسیارانە "نا" بێت. ئەو کاتە وڵات و میللەتێکیش بێ دەوڵەت نابن. بۆ کوردستانی شیرین و میللەتی کوردیش "باخچەوان و دەرگاوان" پێویستە. ئێستا ئێمە دوانزە ساڵە دەوڵەتێکمان هەیە. پێویستە بپارێزین، بە هێزی بکەین، گەورە و فراوانی بکەین. کاتێ دەڵێین ئەمڕۆ پێومری کوردەواری.. کوردستان پەروەری.. نەتەوەپەروەری.. بەرەوپێشچوون و دیموکراتی، پاراستنی دەوڵەتی کوردستانی فیدراڵە، ئامانجی ئێمە کێشەی باخچەوانی و دەرگەوانی میللەتی کورد و کوردستانە. بەڵی دەوڵەت و.. جارێکی تر دەوڵەت و.. جارێکی تر دەوڵەت... بەاڵم ئێمە دەوڵەتێکی دیموکرات، مودێرن، دادمەند و مەدەنیمان دەوێ، نەک دەوڵەتێکی تاکڕەو و دیکتاتۆر! میللەتی کورد ئازاری زۆری لە دەستی دیکتاتۆر و خوێن ڕژان کێشاوە. دەوڵەتمان دەبێ لە ڕۆژهەاڵتی ناوەڕاستدا نیشانەی دیموکراتی و سەردەمی بێ. ئەبێ دەوڵەت لە خزمەتی میللەتدا بێ، نەک میللەت خواردنی دەوڵەت بێت. کاتێ مرۆڤ لە دوانزە ساڵەی دەوڵەتی کوردستان تەماشا بکات، دڵگەش دەبێ، لە زاخۆ تا هەڵەبجەی شەهید، باخچەی کوردان و برایانی ئاشوری و کلدانی و تورکمانی ڕاستەقینە، واتە وڵاتی هەموومان کوردستانی شیرین بوومتە بەهەشت. پێی سەربڵندین و لە هەموومان پیرۆز بێت.

بۆ یەکەم جار حکومەتی هەرێمی کوردستان بەشداری لە پێشانگای کتێبی جیهانیدا دەکات



هەڵگورد عەبدولوەهاب بەڕێوەبەری گشتی ڕاگەیاندنی حکومەتی هەرێمی کوردستان، پێی ڕاگەیاندین کە وەزارەتی ڕۆشنبیری بە هاوکاری ناوەندی زانین و ڕۆشنبیری کوردی و ئەڵمانی بۆ یەکەمجار بەشداری لەپێشانگای کتێبی جیهانی دەکات کە لە سەرەتای مانگی ئۆکتۆبەری ئەمسال لە شاری فرانکفۆرتی ئەڵمانیا ساز دەکرێت. پێشانگای جیهانی فرانکفۆرت گرنگترین و مەزنترین پێشانگایە لە جیهاندا کە تایبەتە بەچاپ و بڵاوکردنەوە و ڕاستەوخۆ ٦٤ وڵات بەشداری تێدا دەکەن. ئەمسال هەرێمی کوردستانیش بەشانازی و سەربەرزییەوە بەشداری و بەشێکی دیاریکراوی لە پێشانگاکە بەکری گرتووە. هەروەها زۆرترین پەرتووک و چاپکراوی کوردی تێدا بڵاو دەکرێتەوە کە لە هەرێمی کوردستانیشدا بڵاوکراونەتەوە. لە درێژەی لێدوانەکەیدا ڕایگەیاند: بەشداریکردنی حکومەتی هەرێمی کوردستان هۆی ڕەهەندە وەک :

١- دیاریکردنی ڕووبەکی شارستانی و پێشکەوتنخوازی وڵاتەکەمان کە چاپ و بڵاوکردنەوەیە.

٢- ناشنابوونی هاونیشتمانیانمان لە هەندەران بە چاپکراوی کوردستانی.

٣-دۆزینەوەی بازارێکی تازە بۆ چاپکراوەکان.

٤- بەستنی گرێبەند و پرۆتۆکۆل لە نێوان شاندی کوردستان و وڵات و دەزگاکانی چاپ و بڵاوکردنەوەی جیهانی.

٥- سازدانی چەندین کۆڕی تایبەت بە چاپەمەنی و بواری ڕۆشنبیری کوردستان. هەروەها وەزارەتی ڕۆشنبیریی فیلمێکی دۆکۆمێنتی لەبارەیەوە ئامادە کردووە کە ڕاستەوخۆ لە کوردستانەوە لە پێشانگاکەدا بە سکرینی گەورە نیشان دەدرێت و فیلمەکەش بە زمانی ئینگلیزی دەبێت.

ئەمە و شاندی حکومەتی هەرێمی کوردستان بە سەرۆکایەتی بەڕێز فەتاح زاخۆیی وەزیری ڕۆشنبیری و چەندین بەرپرسێکی تر بەشداری ئەو پێشانگایە دەکەن، هەریەکە بەرنامە و چالاکی تایبەتیان هەیە.

پۆزش

لەگەڵ داوای لێبوردن لە خوێنەرانی بەڕێزی ڕۆژنامەکەمان و بۆ ئاگاداری "تاریق فایق مەحمود" نەمان توانی هەموو بەشەکانی "شۆڕشی ئەیلوڵی مەزن و ئیرانێنیک" لە یەک دێڕی بابەتەکە و تەوازەی چەرکی ڕووبەڕی ڕۆژنامەکەمان بڵاوبکەینەوە. لەگەڵ ڕێزماندا.

پەیامی کۆڕە

پاشماوی هونەر و چەکەڵەوەی ....

دەیانەوێت بە خۆیان بڵێن کە چیدی ئێمە جگە لە هیز پێناسەیەکی دیمان بۆ ژیان نییە.. بەاڵم تەنها هونەرمەندە دەتوانێت ئەو دەستەواژانە پێچەوانە بکاتەوە، دەتوانێت لە نێوان هێزو ئارامیدا هاوکێشەیەک دروست بکات.. دەتوانێت، تۆڕە بوون لە بەردەم خەندەیەکدا بخاتە جۆرێک لە شەرمەوە. هەر وەک ئازاری دەڵێت "داڤنشی هێندە بە هێز بوو لە ڕووی جەستەییەوە دەیتوانی ئاڵی ئەسپ بە دەست خوار بکاتەوە.. بەاڵم هێندەش ناسک بوو لەدڵدا.. دڵتەنگ ئەبوو بەبینینی باڵندە لەقەفزدا و .. نرخەکەی هەر چەندە بوایە دەیدا و ئازادی دەکرد.." سەرانی سەپەریش دەڵێت "ئاو لێخن نەکەیت نە وەک لەوپەری خەیاڵدا کۆترێک ئاو بخواتەوە.. یان دەستی دەروێشێک تانێکی پێ تەربکات.

بە چرپە..!

فینوس ...

پەیوەندی کورد و عەرب .. یەکێ لە (تابوو)ەکان..



خەلیل نووسەر و ڕۆژنامەوانی عەرەبی عێراق کە باسی لە مەسەلەی پەیوەندی نێوان کورد و عەرەب و ئایا ئەتوانین بەرامبەر یەک بە کراوەیی باس لەو مەسەلە هەستەومرە بکەین. ناپشارمەوە بۆ خۆم هێند بابەتەکەی سائیبم بەاڵوە گرنگ و هەستەومر بوو هێند دووچاری دڵەڕاوکێ بوومەوە لەوەی عەرەبێک بتوانێت باس لەمەسەلەیکی وا بکات و مافی خۆی پێبدات . بەهەر حاڵ باسەکان هەموو پێشکەش کران هەتا سەرە هاتە سەر سائیب باسەکەی پێشکەش بکات ، بەاڵم بەداخەوە دڵەڕاوکێکەم لە شوێنی خۆیدا دەرچوو ، ئەوەبوو هەر کە دەستی کرد بە قسە کردن دەمودەست بەستیەوە بە مەسەلەی ئیسرائیل و پەیوەندی نێوان کورد و ئیسرائیل ، وەک ئەوەی ئەو باسی لێوە دەکات یەکێک بێت لە تابووەکان ، بە ڕای من ئەمڕۆ هیچ شتێک نیە لە سیاسەتدا پێی بوترێت (تابوو) ، چونکە خۆی سیاسەت ئیدی تابوو نیە ، جاران دەوترا (ئاین و سێکس و سیاسەت) سێ تابوون نابێت باسیان لێوە بکرێت چونکە ئەو ڕژێمانەی داگیریان کردبووین دیکتاتۆری بوون ، بەاڵم خۆ لە وڵاتێکی وەکوو هۆڵەندا کە هیچ سنوورێک بۆ سەربەستیەکان ناناسێت ، دەکرێت بە ئاسایی باس لە مەسەلەیەکی وەکوو پەیوەندی کورد و ئیسرائیل بکرێت کە خۆی لە خۆیدا لە پلەماوە تابوو نیە . ئەمە لە کاتێکدا پەندێک هەیە دەڵێت ئەگەر ماڵت لە شووشە بوو نابێت بەرد بگرێتە پەنجەرەی کەس ، هەموو ئیدارەکانی دەوڵەتە عەرەبیەکان مامەڵەی تەواو لەگەڵ ئیسرائیلدا دەکەن لەسەر هەموو ئاستەکان ، بەاڵم کە باس لە کورد دەکرێت ئەوەی بۆ ئەوان ڕەوایە بۆ کورد ناڕەوایە .. ئەمە بەشێکە لە بیرکردنەوەی سیاسی سەقەت و بەستنەوەی مەسەلەکان بە نەگونجاوی بەیەکەوە ، دەنا گرژی نێوان عەرەب و ئیسرائیل چ کاریگەریکەی هەیە بۆسەر پەیوەندی بە کوردەوە .. نەک هەر سائیب خەلیل بەڵکە زۆری ڕۆشنبیری عەرەب بە گومانەوە دەڕوانە پەیوەندی کورد بە عەرەبەوە و بە گرژیەوە دەڕوانە پەیوەندی کورد بە ئیسرائیلەوە، لە کاتێکدا ئیسرائیلیش وەک میللەتێکی سەر ئەم ڕووی زەمینە بۆی هەیە خەباتی خۆی بکات لە پێناو بیناکردنی دەوڵەتی سەربەخۆی خۆیان هەروەها فەلەستینیەکانیش ، چونکە ئەگەر بە شێوەیەکی تر بیری لێبکەینەوە هەردوو گەلی فەلەستینی و ئیسرائیلی قوربانی دەستی سیاسەتی نێو دەوڵەتین. هەروەک چۆن کورد خۆی قوربانی ئەو سیاسەتەیە..

بە ڕێزەوە کەرەم پیاوی
Buchführungsbüro
خۆشناو سلێمان
بەڕێوەبەری گشتی ژمێریاری و داراییی
Von Guericke Alle 21 53125 Bonn
Tel. : 0228 / 29 83 07 Mobil : 0170 32 44 831
e-Mail : sleman@web.de

گەورە خۆشنووسی کورد میرزا محەمەد رەزا کەلهوڕ

بەشی دووهەم

لێکۆڵینەوەی شێوازی خۆشنووسی میرزا:

لێکۆڵینەوە و شیتەڵکردنی شێوازی خۆشنووسی میرزا رەزای کەلهوڕ کارێکی زۆرگرانە. ئەمش نەک لەبەر نەتوانینی لێکجیاکردنەوەی شێوازە تایبەتیەکەیەتی، بەڵکو، لە دەستدا نەبوونی پێوانەیەکی دیاریکراوە کە بە هۆی لە شێوازی خۆشنووسی ئەو یان کەسێکی دیکە بکۆڵرێتەوە. چونکە بۆ لێکۆڵینەوە لە نووسینی فارسی هیچ دەستورێکی دیاریکراومان لە بەردەستدانیە، لەم ڕووەوە هەمیشە هەڵسەنگاندنی ترخی هونەری لە ڕوانگەی ئەزموونی کەسیەوەبووە. خەتناسانی پێشو هیچ خاڵێکی دیاریکراویان بۆ جیاکردنەوەی خەتی خۆش لە هی ناخۆش دانەناوە. دەتوانین سادەتر بڵێین، ئەگەر کەسێک بپرسێ: بۆچی ئەم پارچە نووسینە لەوەی دیکە جوانتر نۆرسراوە؟ هەرگیز ناتوانرێ وڵامێکی ڕێک و پێکی بدرێتەوە کە پشت بە بیروڕای پێشینان ببەسترێ. ئەگەر سەیری بەڵگەنامە کۆنەکان بکەین دەبینین کە هەمیشە بە چەند وەسفێکی گشتی و جیاکردنەوەی چەند خاسیەتێک وازیان هێناوە و بە پێویستیان نەزانیوە لە ناوەڕۆک و شێوەی کارێکی هونەری بکۆڵنەوە. شێوازی خۆشنووسی میرزا ڕەزای کەلهوڕ هەمیشە جێگای مشت و مڕی زۆر بووە. کە گووتیانە (خۆشنووسێکی زەبەردەست بووە) هەڵبەیان نە گووتوە، دکتۆر مەهدی بیانی، کە تۆێژەوان و خەتناسێکی هاوچەرخ بووە، لە بەرگی سێیەمی (احوال وآثار خوشنویسان) دا دەنووسێ: لە بارەی پایەی هونەری و شێوازی خەتی میرزا. دەنگ وباسی زۆرم بیستوە و هەندێکیان زیادچوون و خەتی ئەویان لە "عیماد سەیف" پش وێدەتر دانەناوە. خوالێخۆشبوو (عەباس اقبال) لەو بارەوە دەڵێ: بەجۆرێکی واپوختە و مەحکەم نووسیوەتی لە وردەکاری وباشکردن و ڕازاندنەوەیدا زۆر کۆشاوە کە بۆتە ڕێگای سێیەم لە دوای میر عەلی هەرەوی و میر عیماد سەیفی قەزوین. بە بۆچونی هەندێ لە مامۆستایانی هونەر، لە هەندێ کاریدا پێشی ئەم دوو مامۆستا ناوبراوەش دەگرێتەوە (گۆڤاری یادگار. ژمارە7). یەکێک لە قوتابیەکانی مەبەست "عبدولا مستوفی" ە، لە "تاریخ اجتماعی و اداری قاجاریه" دا، نووسیوویەتی: شێوازی میرزا لە "نستعلیق" دا پێش شێوازی میر عیماد کەوتوتەوە. میرزا توانی بگاتە ئاستێکی وا کە ئێمڕۆ شێوازەکەی ببێتە پێشەنگ و سەرمەشقی خەتی "نستعلیق". بۆ ئەوەی سەرنجامێکی واقیعیانە ترسان لەو بیروڕایانەی پێشو دەستکەوێ دەبێ سەرنجی ئەم دوو خاڵە بدەین: یەکەمیان ئەمەیە، میرزا هونەرمەندێکی شۆڕشگێڕ یان بەلانی کەمەوە، دەنگ و شێوازگی هونەری تایبەتە. ئەو شێوازەی میرزا هەڵیبژاردوە، لە سنووری ڕێبازێکی تایبەت بە خۆی فراوانتر دەگرێتەوە. مامۆستا(ئەحمەد سوهەیلی خوانساری) لەو باوەڕەدایە کە شێوازی کەلهوڕ لە شێوازێکی تایبەتی بەولاوە شتێکی دیکە نییە. بەڵام دیسانەوە لەو باوەڕەدایە کە میرزا تا سەردەمی خۆی زۆر گۆڕانکاری بنچینەیی لە بنچینەی ئیستاتیکی خەتی (نستعلیق) دا کردوە وڵە ڕاستیدا هەمان کارو گۆڕانکاری کردووە کەوا (میر عەلی هەرەوی) یان (میر عیماد) لە ڕۆژگاری خۆیاندا کردوویانە. بێگومان نییە کە هەموو دەم ئەم سێ ناوە لە گەڵ یەکدا دێن. موستەوفی دەڵێ: کەلهوڕ گۆڕانکاری لەسەر تاپای پێنکهاتەی پێتی ئەم شێوە خەتەدا هێناوە. هەڵبەتە کارێکی ئاسان نەبووە کە شێوازی نوێ لای گشتی خەڵکەکە قبوڵ بکرێ، لەبەر ئەوەی زۆربەی خۆشنووسان بەشێوازی میر عیماد دەمانناووسی و بەربەرەکانی ئەم شێوە نوێیەیان دەکرد بەڵام میرزا کەلهوڕ سەری لە خۆی تێکنەدا و لە سەر شێوەکەی خۆی بەردەوام بوو سەرەنجام توانی خۆ بەو پلە و پایە بگەینێ کە ئێمڕۆ



یەکێک لە ڕەشنووسەکانی میرزا

شێوە وڕێبازەکەی بە پێشەنگی خەتی "نستعلیق" بناسرێ وهەر هەموو ئەوانی دیکەش پەیڕەوی ئەو ڕێبازەیەکەن و دەڵێن کە (عیماد الکتاب) (کە خۆشنووسی گەورەی دوا دوایەکانی سەردەمی قاجاری و سەرەتای سەردەمی پەهلەوی بووە) شێوازی ئەوی گرتەبەر و بۆ تەواوکردنی ئەو ڕێبازە هەوڵیدا و ناوەڕۆک و بنچینەی جواناسی خەتی (نستعلیق)ی هاوچەرخی لەوەوە داڕێژت. خاڵی دووەم ئەمەیە کە میرزا، بایەخی تایبەتی بە چاپنووسی (خۆشنووسی بۆچاپی بەردین) دا وشێوازەکەی خۆی لەم کارەدا پیادەکرد، وەک مستەوفی دەڵی: ڕەنگە کەس تا ئێستا خەتی بە چاکی وەک خەتی میرزای لە چاپی بەردیدا ڕێکنەهاتبێ کە قەڵەمی لە سەر کاغەز دادەنا یەک نەفەس ووشەی تەواو دەنووسی- هونەرمەندو هونەردۆستان دەزانن کە کەم کەسی وا هەیە لە نووسیندا توانای وای هەبێ، کە تێکڕای ووشە بە بێ هەڵگرتنی قەڵەم لە سەر ڕووی کاغەز هەڵگرێ، لە چاپنووسیدا ئەم کارە پێویستە، هەر لەبەر ئەمەشە خەتە چاپیەکانی میرزا لەگەڵ خەتە غەیرە چاپیەکانی جیاوازیەکی نییە. لە پاشدا ئەمە ڕوون دەکەینەوە کە ئەم شێوازەش تایبەتە بە شێوازی کەلهوڕ. بەر لە ئێستا باسی ئەوەمان کرد کە میرزا کەسێک بووە قەناعەتی بە پێشەکەی بووە و زۆر دوورە پەرێز ژیاوە. ئەو تاکە کەسێک بووە کە پارە و پولی ڕەتکردۆتەوە تا تەواوی توانا و بەهرەکانی لە ڕێگای هونەرەکەی خەرج بکا. زۆری دەکێشا تا میرزا قوتابیەکی نوێ وەرگرێ چونکە (قوتابیەکی نوێ بۆ ئەو مانای داهاتێکی زۆرترو گرنگتر لە هەموو شتێک بوو. قوتابی لای ئەو، وەک حوکمی باوک بۆ کوڕەکەی وابوو، لە هەموو لایەنێکەوە پەروەردە و ئامادەی دەکرد: دەیانگوت هەر کەسێک قوتابی ڕانەگرێ وەک وەجاغ کوێر وایە. بەڵام میرزا لەجۆرە قسانە بڕوە. خۆ ڕاهێنان و بەشقکردن و ڕۆژانە چەند سەعاتێک خەریک بوون بەم کارەوە، خاسیەتێکی تایبەتی خۆیەتی. هەڵبەتە بەر لەوێش بەشقکردن پێویستیەکی خۆشنووسی بەناوبانگی ڕۆژگای (شا ئەهماسب)ی سەفەوی دەگێڕنەوە کە گووتوبەتی: "ئارەزووی بەشقکردنم ئەوەندە بوو کە شەوانی هاوین سەر لە نیوارە تا بەیانی لە ژێر تریفەی مانگەشەودا دابنیشم و بەشق بکەم. میرزا بە پشوێکی سەر سوڕهێنەر کاری دەکرد وکارەکانی ئەنجامدەدا." مستەوفی دەڵێ: نەماندیوە میرزا کاغەز بگرێتە دەست و دێرێک بنووسێ بەهەر لەبەر ئەمەشە پارچەیەکی پاکنووسی لەدوا بەجێنەماوە. میرزا عاشقی بەشقکردن بوو. شەو و ڕۆژ جگە لە ٥-٦ سەعاتێک کە دەنووست و یەک دوو سەعاتێک کە بە نان خواردن و نوێژ کردنەوە خەریک دەبوو، هەر هەموو وەختەکانی دیکەی خەریکی بەشقکردن بوو. تا ماڵ خەفتنان جگە لە بەشق کارێکی دیکەی نەدەکرد. تا ئەو کاتەش کە قەڵەمی لە سەر کاغەز بایە میرزا هەناسەی خۆی ڕادەگرت، بۆیە لە کاتی بەشقکردندا وەک ئەوە وا بوو کارێکی زۆرگران ئەنجام بدا، دوای هەڵگرتنی قەڵەم ئینجا پشی دەخواردەوە. بەردەوامی لە کارو بەجێ کردنی بەرنگوستەکانی بەهرەندە لاگرنگ بوو کە لەکاتی سواربدا هەمیشە دەستی ڕاستی لە باخەڵیدا دەناوەلو باوەڕەدابوو کە ئەگەر ئازادبێ، ئەوا هێزی تێدا ئامێنێ. مستەوفی لەو باوەڕەدایە کە میرزا ڕەزای کەلهوڕ ڕێبازی میر عیمادی گرتە بەر. بەڵام سەلیقەهایەکی لە کورتکردنەوەی

هونەر و ڕەتکردنەوەی دەسەڵات.. لە بەردەم ستاتیکادا..!

سیروان شریف- بەرنامە



یەکێک لە کارە هونەرییەکانی سیروان

بەردەوام هونەر بەوە خۆی لە پێکهاتەکانی تری سروشت جیادەکاتەوە، کە تا دوا ئەندازە لە هەوڵی خۆ ئازادکردنداید.. لە هەموو ئەو شتانەی سنوورن لە بەردەم وسیتەکانیدا.. ئیدی بۆ بە دەست هێنانی ئەو سەرکەوتنە بەردەوام خۆی دەخاتە بەردەم پرسیار گەلێکەوە.. یان شیوەیەکی تر دەبێتە وروژێنەری کۆمەڵە پرسیارێک، کە زۆر جار هونەرمەندیش لە بەردەم وەڵامدانەوەیدا شکست دێنێ.. بەو پێیەی زۆرکات چاوگەی پرسیارەکان دەگەڕێتەوە بۆ ئەم یاسایانەی. هەیمەنەی دەسەڵاتی تاکەکان ئەکەن لە کۆمەڵگەدا. ئیدی ئەوە چ نەریتی کۆمەڵگەبێت یان سنووری یاساکانی دەسەڵاتێک یا خود پەیامەکانی مەزهەبێک بێت.. گرنگ ئەوەیە ئەو ئاستۆیەی پرسیارەکانی لێوە هەڵدێ گەورەترە لە ئیرادەی تاکەکانی ئەو کۆمەڵگەیە. لە ڕاستیدا سەرەتای گرفتی ئێمە لەوێوە لە دایک دەبێت کە لە بەردەم پرسیاردا هەست بە جۆرێک لە ترس بکەین.. ترسان لە پرسیار ترسانە لەوجودی خۆت، بەو مانایەی گەر من هەیم دەبێت هەڵگری کۆمەڵە پرسیارێک بم لە هەمان ساتیشدا وەلام دەرەوەش بم.. ئیدی ئەو پرسیارانە پێناسەی کیانی من ئەگۆڕن یان نا.. ئاراستەی کارکردنی من بۆ چ پێگەیەک ئەبەن گرنگ نییە. ئەوەی گرنگە دەبێت من لە دایک بووبم دواتر کەسێکی پرسیار لێکراوبم. چونکە ئەمە ئەو دەسەڵاتە ساماکیە لە کۆمەڵگەی ئێمەدا کە هەمرو دەستەواژە پیرۆزەکان ئەخاتە ژێر دەسەڵاتی گومانەوە. لە بیرکردنەوەی تاکەکانی کۆمەڵگەی ئێمەدا هەمیشە پرسیار خۆی لە گومان جیا ناکاتەوە ڕوونتر بڵێین بەردەوام پرسیارکردن جۆرێکە لە گومانکردن.. کاتێک تۆ یاسایەک دەخەیتە ژێر پرسیارەوە کەواتە بە گومانی لەوجودی ڕاستگۆیی لە سنووری ئامادەیی ئەو دەسەڵاتەدا.. کاتێک تۆ پیرۆز کراوێک دەخەیتە بەردەم پرسیارەوە کەواتە گومانت هەیە لە پیرۆزی ئەو پێکهاتەیە. بەڵام پێ ناچێت بیرکردنەوەی بچوکی من هەرگیز لەگەڵ ئەو شێوازی کارکردنەدا یەک نەگرێتەوە.. من وادەزانم دەکرێت لە شتێک بپرسین بەبێ ئەوەی هیچ گومانێک لە پشتیەوە ئامادەیی هەبێت .. بگرە بە پێچەوانەشەوە گەر هەڵمنبم بەردەوام پرسیارکردن واتایەکی تریشی هەیە ئەویش کوشتی گومانە.. یان ڕاستر بڵێم مەبەست لە کردنی پرسیار نەهێشتنی بەشێکە لە گومان. جا کارکردن بۆ گەشتن بەو دەسەڵاتە ڕەهایە لە پانتای هونەردا. بە تایبەت لە هونەری شیوەکاریدا گەیشتنە بە ئازادی ڕەنگ لە پانتایی تابلۆیەکدا.. لە ساتێکدا ڕەنگ دەتوانێت هەموو دەسەڵاتەکان لە خۆیدا کۆبکاتەوە و هەڵگری تەواوی ماناکان بێت.. ئەوەی دەبێتە مەبەستی من لێرەدا .. ئاشکرا کردنی ئەو دەسەڵاتە پڕ لە ئازادییەیە کە هونەر دەیەوێت بیبەخشێتە ژیان.. هەر چەندە ئەمە خۆی لە خۆیدا بەرپاکردنی جەنگێکی پڕ لە شکەستیشە لە گەڵ ژیاندا.. چونکە مرۆڤەکان چەندە پەرۆشی ئازادین بەڵام وەکو پێویست ناتوانن لەگەڵی بژین .. مرۆڤ هەمیشە لە جەنگدان بۆ دەستەبەرکردنی ئازادی.. بەڵام ئەوەشمان لە بیرنەچێت ئەوانەی ئازادیش ئەکوژن هەر مرۆڤەکانن. یان بە مانایەکی تر بڵێین مرۆڤەکان هێندە لە دەرەوەی ئازادی ژیاون کە چیدی وەکو پێویست توانای ئاوێتە بوونیان نییە لە گەڵیدا.. چونکە ئەوانەی ئازادی ئەکوژن بە تەنها دەسەڵاتێک یان یاسایەک یا گەلێک نین بە پێچەوانەوە هەموو گرووپێک .. هەموو یاسایەک .. هەموو دەسەڵاتێک.. هەموو نەریتێک.. دواجار هەموو مرۆڤێک بەشێک لە ئازادی ئەخنکێنیت تا ئەو ئەندازەیەی کە زۆر جار مرۆڤ خۆی بەشێک لە ئازادی ناخی خۆی دەکوژێت و هەر خۆشی دەیەوێت بڵێت ئەوەی کوشم ئازادی نەبوو.. بەڵکو سەرکەشی ولە سنوور دەرچوون بوو..! ڕەنگە هەر ئەمەش ئەو پاڵنەرەبێت کە "ئەریک فرۆم" ئەگەینێتە ئەو بڕیارەی کە دەڵێت: "مرۆڤەکان بە تەنها لەکاتی خەودا ئازادن.. بەو مانایەی تەنها لە کاتی خەودا بۆژیانێ تێناکۆشن .. بەڵام زۆرجار بە خەویش توانای دەستەبەرکردنی ئەو ئازادیەمان نییە بۆیە بە پەلە بە ئاگادێنەوە" دواتر یەکێکی تر لەو دەسەڵاتانەی هونەر دەبێتە دەسەڵاتێکی تەنها لە بە ئەنجام گەیاندنیدا.. ئەویش دەسەڵاتی ڕەتکردنەوەی ڕقە لە ژیاندا.. تۆ کاتێک دەتوانیت وەک هەناسەیەکی سەربەست بژیت کە دەبێتە مرۆڤێک بەدەر لە تۆڕەبوون.. مرۆڤێک مامەڵە لەگەڵ ستاتیکاکانگات. بە پێچەوانەشەوە. دەیەوێت خۆی بکاتە بکوژی غەریزەی جەنگ لە مرۆڤدا.. بێگومان هەموومان تا دوا ئەندازە لە بەردەم غەریزەی جەنگ دا هەست بە بێ دەسەڵاتی ئەکەین. ئیدی خۆ ڕەنگە هونەر لە هەموو شتەکانی دی زیاتر توانای ئەو جەنگەی هەبێت. جەنگێک بۆ نەهێشتنی جەنگ لە ناو خودی خۆتدا ڕەنگە نموونەیەکی بچوک بتوانێت تەواوی مەبەستەکەم بگەینێت.. کاتێک مرۆڤێک هەست بە بوونی دەسەڵاتێک دەکات لە ڕووی جەستەیەوە بەردەوام بەدوای بوونی ئەو دەسەڵاتەدا غەریزەی جەنگ ئامادەیی هەیە.. هەمیشە ئەوانەی خاوەنی دەسەڵاتی جەستەیین دەیانەوێت بەدووربن لە لێبوردن

بۆ لاپەڕەی ٦ ،



ئامادەکردنی دونەر و خزمەتگوزاری چێشتخانەکان

- باشترین کوالیتە
- پاک و خاوێن
- هەرزان بۆ سەرانسەری ئوروپا

Normannenstraße 17 , 51149 Köln Germany Tel: 0049 2203 925960
Fax: 0049 2203 29 086 73, Mobil 0049 173 904 19 18
eMail: koceramin@ hotmail.com

دابرانێک لە جۆرێکی نەستای کوردی

"ئەو کە ون بوو"

بەشی دووەەم

ناسر باباخانی - مەهاباد

ئەم لێکۆڵینەوەیە کە زۆرتر لەڕوانگەی ڤارشتخوازییەوە "بونیادگەریی Structuralism" دەڕوانێتە دەق ، بیانوویەک بوو بۆ باس لەفۆرم و فەزایەکی تازە لە چیرۆکی کوردی دا و دەستنیشانکردنی ئەم تایبەتمەندییانەی کەچیرۆکی مۆدێرن هەیەتی. واتە مەبەست لەم تۆێژینەوەیە ئاماژە بە جوغرافیایەکێ نوێیە لە چیرۆکی کوردی دا کە دەتوانێ خۆی بگەیەنێتە ئاستی چیرۆکی جیهانی.



دەبێ و خوێنەر بە باشی نازانی دەبێ لە کام ڕەوانگەوە (دنیای ئەفسانەیی یان ڕاستەقینە) بڕوانێتە ئاکار و کردەوەی کارەکتێرەکان، کە ئەمە یەکێکە لە تایبەتمەندییەکانی چیرۆکی پۆست مۆدێرن. هەروەها ڕەوتی گێڕانەوە هەر چەند لە داستانی مۆدێرن دا بە شێوەی تەواو هێلی نییە وبە هۆی فلاش بەکەکان لەم حاڵەتە دێتە دەرێ، بەڵام چیرۆکی پۆست مۆدێرن بە لادان لە نۆرمی خەتی گێڕانەوە، بە شێوەی لایە و تۆێژ دەگێردرێتەوە، عەتاش لە گێڕانەوەی چیرۆکەکەی دا هەندێ جار ڕێوایەتی پۆست مۆدێرنستی هەیە بۆ وێنە کاتێ لە ڕستەی موعتەرزە کەلک وەردەگرێ، هەر ئەم چەشنە گێڕانەوەیە دەبێتە هۆی ئەوە کە لە حاڵەتی هێلی بێتە دەر و ببێتە تۆێژ و لایە:

١- باسی پیرۆژنەکە دەکا.
٢- لە پڕ لە سەر پیرۆژنەکەڕا دێتە سەر ئەو.



بەڵام ئەوەی ڕاستی بێ لەم چیرۆکەدا تایبەتمەندییەکانی چیرۆکی پۆست مۆدێرنی تێیدا بەدی ناکرێ. بۆ وێنە: خۆ تێوەردانی ڕاستەوخۆی نووسەر بۆ نێو چیرۆک، بە تەعبیری دێیوید لاج "عریان سازی" نووسەر. وەک باسی گرفتەکانی تاکەکەسی، کردنەوەی پرێسکەی دڵ، دژوارییەکانی نووسین و دژوارییەکانی گێڕانەوە بۆ خوێنەر و .. یان سازدانی نابەسامانی زەمانی، واتە لە چیرۆکی پۆست مۆدێرن دا نە تەنیا ڕابردوو لەت و پەت دەکرێ بەڵکوو بە لادان لە نۆرمی خەتی گێڕانەوەدا وڵادان لە هەست کردن بە زەمان، ئێستاش تووشی دابڕان دەبێ.12 نووسەرانی ڕۆژهەڵاتی بە پشتیوانەی فەرهەنگی و سوننەتی خۆیان دایمە بە شوێن چەشنێک "کەمال گەرایی" ن عەتاش وەک چیرۆکنوسێکی ڕۆژهەڵاتی عەودالی کەمالاتێکە کە لە ئەفسانەی جەمالی دا شک دەبا. هەر چەند لە هەستی نابەئاگای خۆیشی دا ئەو کەمالاتەی پێ ئەفسانەیە. بۆیە جەمالی ئەو ون بووەی لێ بۆتە ئەفسانە وئەفسانەی ئەم ون بووەی لێ بۆتە جەمال و دەیەوێ لە جەمالەوە بەرەو کەمال بچێ، هەڵبەت بە کەرەسە وئامرازی تەنیاییەوە. شتێکی کە وەک کەلەبەر لەم چیرۆکەدا خۆ دەنوێنێ مامۆستای فەلسەفەیە. بە بڕوای من مامۆستای فەلسەفە زیادییە.

عەتا دەیەوێ بە هۆی مامۆستای فەلسەفە کە قسەی ئاساییش دەکا تام و بۆنێکی فەلسەفی بدا بە داستانەکەی ، بەڵام چون ئەمە دەسکردە، زوو خۆ بە دەستەوە دەدا. ئەگەر ڕۆمان و چیرۆکی مۆدێرن بە وتەی ویرجینیا ڤۆلف یانی شکستی مرۆڤی سەردەم و وەرزی جودایی یەکانی بە مانای گشتی لە تەواوی بوارەکانی ژیان دا، ئەوا عەتا نەهایی بە موو لە ڕێبازی چیرۆکی مۆدێرن لای نەداوە.

پەراوێزەکان:

١- سەبارەت بە سەلەفییەت و بە ناو نوێخوازی بڕوانە بۆ: گۆڤاری مەهاباد، باباخانی- ناسر، ئاناتۆمی گەڕیانی بە ناو نوێخوازی ئەدەبی کوردی، ژمارە ٢٠ ل ١٤-١٧ ، ١٣٨١.
٢- گۆڤاری ڕامان، سەڕاج — هاشم، تیۆری بنیاتنانی شاراوەی دەق و ئێکسپیرەکانی ئەڤۆریا، ژمارە ٥٦، ل ٤، ٢٠٠١.
٣- گۆڤاری ئایندە، نەهایی- عەتا، ئەو کە ون بوو، ژمارە ٨ و٩ ل ١٩٣ و١٩٧، ٢٠٠٠
٤- گۆڤاری سروە، باباخانی- ناسر، سووکە ئاوڕێک وەسەر قۆناغەکانی چیرۆکی سروە، ژمارە ١٦٧، ل ١٧-٢٢، ١٣٧٩.
٥- گۆڤاری مەهاباد، ڕزگار، خوشناو، دەقی وتاری گائو شینگ جیان لە کاتی وەرگرتنی خەلاتی نۆبێلی ئەدەبی سالی ٢٠٠٠، ژمارە ٢، ل ٤، ١٣٨٠.
٦ ساراماگو- ژوزە، کوری، ترجمة اسداله امرایی.
٧- گۆڤاری ڕامان، قادر- هیوا، ڕۆمانی ئیوارەی پەروانە لە نێوان جەنگی عەشق و جەنگی فیکردا، ژمارە ١٥، ل ٩٨، ٢٠٠٠.
٨- جویس- جیمز، دوبلینی ها، ترجمه محمد علی صفریان، انتشارات نیلوفر، چاپ دوم ، ص ٣١، ١٣٧٨.
٩- عەلی- بەختیار، مەرگی تاقانەی دووەم، ناوەندی ڕەهەند، ل ٦ ٢٠٠١، سوید.
١٠- زید- یان، داستان کوتاه، ترجمه فرزانه.. هری، نشر مرکز، چاپ دو، ص ٣٨، ١٣٧٩.
١١- ماهنامه.. دینه،شماره ١٩، دی ماه، ص ٤٦-٤٧، ١٣٦٦.
١٢- نامه کانون نویسندگان ایران، انتشارات.. گه، چاپ یکم، ص، ٣٥٠-٣٥١ ، ١٣٨٠.



A- ماتیلد و میردەکەی هەژارن
B- ماتیلد و میردەکەی بانگێشتن دەکرێن.
C- ملوانکەی ئەڵماس بە ئەمانەت وەردەگرن
D- ملوانکەکە ون دەبێ
E- گرێی چیرۆکەکە دەکرێتەوە
G- ماتیلد ومێردەکە هەر هەژارن

بەڵام داستانی مۆدێرن شێوە گێڕانەوەکەی تەواو هێلی نییە و زۆر جاران فلاش بەک وبە دەگمەنیش فلاش فۆروارد دێتە گۆڕێ. خوێنەری ئەم کورتە چیرۆکە چون لە ڕەوتی ڕێوایەتدا، گێڕانەوەیەکی پۆست مۆدێرنیستی دەبینێ، زەینی لە حاڵەتی هێلی دێتە دەرێ وتووشی جەرەیانێکی ڕێوایەتی لایەلایە دەبێ. لە بەشی کۆتایی دا بەڵگەی ئەم بۆچوونەی خۆمان دێنینەوە.

فۆرم و فەزا

فۆرمی چیرۆکێک لە سێ بارانەوە دەکرێ قسەی لە سەر بکرێ:

١) ڕوانگە (Point of View) :

لەم بەشەدا باس لە سەر ئەوەی دەکرێ کە لە ڕوانگەی کامە دەورگێڕەوە چیرۆک دەگێڕدرێتەوە؟ کەسێتییەکانی چیرۆکی "ئەو کە ون بوو" لە سێ ڕوانگانەوە بۆ خوێنەر خوێا دەبن:

ئ- کاتێک بە شێوەی مۆنۆلۆگێکی دەروونی وە قسە دێن، بۆ وێنە باسی ڕابردووی خۆیان دەکەن.

ب- کاتێک دراوسێکانی ئەفسانە سەبارەت بە ئەو ئەفسانە دەدوێن یان بە واتایەکی دیکە کاتێ دراوسێکانی دەس دەکەن بە نرخاندن یان ڕووخاندنی کەسایەتی ئەو ئەفسانە.

ج- کاتێک لە زمان ڕاوییەوە واتە چیرۆکنووسی ڕاستەقینەوە، نەک چیرۆکنووسەکەی نێو چیرۆک ڕووداوەکە دەگێڕدرێتەوە، دیارە ئەم ڕاوییەش تاپۆیەکە لە عەتای چیرۆکنووس. بۆیە دەڵێم تاپۆ چون، عەتا لە درێژایی ڕەوتی گێڕانەوەی داستانەکەی دا بە ئەسپایی دێتە دەر وتەنیا دەبێنە چاوەدێرێک و هیچی تر و ئەم ئەرکە دەخاتە ئەستۆی کارەکتێرەکانی. واتە زۆر بە وریایی وە بە وردی لە حاڵەتی "ڕاوی- قەهرمان" بەرەو "ڕاوی- نا.." دەچێ.

٢) گێڕانەوە (Narrative):

بۆ گێڕانەوەی چیرۆکی مۆدێرن کەلک وەرگرتن لە تێکنیک فلاش بەک وگێڕانی داهاتووی ڕووداوی چیرۆکەکە لە گەڵ فلاش بەک وهەروەها هاتنە دەر لە بازنەی ڕێوایەتی ڕێئالیستی پێویستە، کە عەتا بە باشی ئەم دوو کژارەی بە ئەنجام گەیەندووە.

٣) دارشت (Structure):

عەتا هەر لە سەرەتاوە بە دانانی دارشتێکی بەراوەژوو "Re-versed" ئەم پێکهاتە نوێیە دادەڕێژێ، واتە ڕووداوی سەرەکی چیرۆکەکە یانی ون بوونی ئەو دێنێتە سەرەتای چیرۆکەکەی. بەڵام لەگەڵ ئەمەش دا یەکگرتوویی و یەکێتی چیرۆکەکە دەپارێزێ. خاڵێکی گرینگی تری ئەم چیرۆکە فەزا وئاقاری چیرۆکەکەیە. ئەم فەزا ناتاسایی یە دەمانباتە فەزای چیرۆکەکانی دینو بۆتزاتی نووسەری ئیتالیایی کە فەزایەکی میتافیزیکییە، نەک سوریئالیستی و دەکرێ لە کۆمەڵگای ڕاستەقینەش دا عەینی ئەو فەزایەی بۆ بدۆزییەوە وپێکیان بگری بە تایبەتی لە چیرۆکی ساحیردا(١١)

کۆتایی:

دیاری کردنی سنووریکی ڕوون وئاشکرا لە نێوان دەقی چیرۆکێکی مۆدێرن و چیرۆکێکی پۆست مۆدێرن کارێکی دژوارە. چون زۆر جاران خاڵ گەلێکی هاوبەشیان تێدا بەدی دەکرێ و لێک هەڵاواردنی چیرۆکی مۆدێرن و چیرۆکی پۆست مۆدێرن لە یەکدی چەتوون دەکا، هەر بۆیە چیرۆکی "ئەو کە ون بوو" لە یەکەم ڕوانیندا وا هەست پێدەکرێ کە لە ماهیەتی چیرۆکی مۆدێرن وپۆست مۆدێرن دا لانکەی دەکا. بەڵام ئەوەی کە منێ دەمەوێ لێرەدا لە سەری بدوێم ئەمەیە کە چیرۆک "ئەو کە ون بوو" چیرۆککی مۆدێرنە، هەر چەند فەزا و ڕێوایەتی داستانەکە سێبەرێکی پۆست مۆدێرنی بە سەردا کشاوە بۆ وێنە: لەم چیرۆکەدا دنیایەکی ئەفسانەیی لەگەڵ دنیای ڕاستەقینە تێکەڵ کراوە وبوو جیهانی لە سەداسەد دژ بە یەک (گۆڕستان و دنیای ڕستەقینە) ساز



مەبەست لە شێمای ساکار، بوونی ڕووداوێکی سەرەکی و چەند ڕووداوی لاوەکییە، کە ئەم ڕووداوانە موازین. بەڵام لە شێمای بە پێچ و پەنادا. سەرجەمی ڕووداوەکانی سەرەکی و لاوەکی فلاش بەکیش لە خزمەت ڕووداوەکان دان. هەروەها ڕووداوەکانی لاوەکی موازی ڕووداوی سەرەکی نین بەڵکوو بە سەر ڕووداوە سەرەکییەکەدا عەمودن. بۆ وێنە وردەسەرنجێک دەدەینە چیرۆکی ملوانکەی گی دۆ مۆپاسان: ماتیلدا ژنی مووچەخۆرێکی هەژارەی وەزارەتی بار هێنان و پەروەردە کردنە. وەزیر ئەوان بۆ شەونشینی بانگێشتن دەکا. ماتیلد چون زیرەک و جەواهیری نییە لە دۆستێکی ملوانکەیەکی ئەڵماس بە ئەمانەت وەردەگرێ. ماتیلد ملوانکەکە ون دەکا. ژن و مێرد ناچار دەبن بە قەرزو قۆڵە ملوانکەیەکی دیکە

www.KurdishMedia.com

پرسە نامە

بەناوی خۆمان و بنەماڵەکەمانەوە ڕێزو سوپاسی خۆمان ئاراستەی هەموو ئەو کەسانە دەکەین کە بە سەردان و فاکس و ئیمێل و تەلەفۆن بەشداری پرسەکەیان کردین.

لە گەڵ ڕێزماندا.کەمال ڕەئوف هەنجیرە

بەناوی ستافی ڕۆژنامەکەمانەوە پرسەو سەرخۆشی خۆمان ئاراستەی نووسەر و هونەرمەند **" مامۆستا کەمال ڕئوف هەنجیرە"** دەکەین بە بۆنەی کۆچی دوایی دایکی بەڕێزیانەوە .

إنا لله وإنا إليه راجعون **پەیامی کورد**

بەشی یەکەم

ئازادی، لەسایەی تیرۆردا...

تیرۆر ئەو کارەتاوانەیە، کە دژ بە وڵاتێک ئەنجام دەدرێت و بە پێی سروشت و ئامانجی تایبەت دەبێتە هۆی دروستکردنی ترس و تۆقاندن لە ناخی کەسایەتیەک، یان گروپێک، یان کۆمەڵگە بەگشتیدا.



شاهۆ تۆفیق - ئەڵمانیا

لەورۆژەوە کەژیان خوڵقاو، بونەوەران دنیایان ئاوەدانکردەوە؛ ململانێ و سەرکێشیش لەنێواندا دروست بوو. هەرلەسەرەتای ژیانی مرۆڤەوە ناکۆکیەکان دەستیان پێکردو، بەسەرهاتی "هابیل و قابیل" نموونەی ئەو ناکۆکیە ئەزەلیەیە کەلەپاشاندا بەچەندین قۆناغدا تێپەڕی و، جۆرەها دۆخی بینی. ئالەوپێشەوە "ترس" وەکو هەستێک بۆ بەرەنگاربوونەوە و خۆپاراستن لەدژو بەرانبەرەکان لە دایکبوو. پاشان، ئازادیش وەک پێداویستی و خواستی بوونەوەرە لاوازو مافخوراوەکان بووبە ئامانج. واتە دەتوانین بڵێین: ژیان و ترس، پێکەوە لەدایکدەبن. بوونەوەر دەخوڵقێ و ترسیش لە دڵیدا دەمرسکێ ، ترس لەهەموو ئەو شتانەی کە لەدەوروبەری هەن ولێیان بەگومانە، ئەوانەی لێیان تێدەگات و ئەوانەش کەلێیان تێناگات. واتە: ململانێ لەنێوان(بوون و نەبوون) دا، لەنێوان بیروهۆش لەلایەک و گێلی ونەفامی لەلایەکی تر. لەنێوان ئازادی رەها و سانسۆری هزرداد. کەترسیش هەبوو کاردانەوەی خۆدەربازکردن و رزگاربوون لەوترسە دروستدەبێت و، ئەوساش ئازادی وەک خواستێک دەبێت بەمیوا. ئازادی، بۆ مرۆڤە چەوساوەو دیل و ژێردەستەکان؛ هەمیشە خەون و ئاواتێکی مەزن بووەو لەپێناویدا خەباتیان کردووە. لەهەمان کاتیشدا بروسکەی هەرمشە بووە بۆ سەر دەسەڵات و هێزی زۆردارو زاڵمەکان و، وەک دێوەزمەیەک لێی ترساون. هەربۆیە هەمیشە لە هەوڵی کوشتنیدا بوون و بەهەموو جۆرێک دژی وەستاون. جارێک بەبیانووی پاراستنی دەسەڵاتی خۆیان و، جارێکی تریش بەبیانووی پاراستنی بەرژەوەندیی گشتی و، چەندین جاریش بەناوی ئایین و بیروباوەڕەوە ئازادیيان خنکاندووە ئازادیخوازانیان دیل و ڕەوانەی زیندانەکان کردووە، یان بەشێوەی جیاجیا قەلاچۆیان کردوون. لەسەدەکانی رابردودا، کاتێک مرۆڤ دەکرایە کۆیلەو لەبازاڕدا سەوداو مامەڵەی پێوەدەکرا ! جێیەک نەدەمایەوە بۆئەوەی "ئازادی" هەناسەی تێابداو کۆیلەکان رزگاریان بێت. ئەویش لەسایەی زوڵم و زۆرو کاری ناببجێی خاوەن دەسەڵات و پلەوپایەکان و، لەژێر گوشارو زەبرو زەنگیاندا دەکراو لەڕێی ترس و تۆقاندنەوە؛ مرۆڤیان پاواندەکرد. بەشێوەیەک تەنانەت نەشیاندەهێشت بیربکەنەوەو بۆخۆشیان بڕیار لەچارەنوسی خۆیان بدەن. تالێرەوە چەمکی تیرۆر خۆی نواندو، پاشان لەچەندین بەرگ و بەچەندین ناوی جیاجیاوە شەرعیەتی بەخۆی دا. تیرۆر، واتە هەرمشەو تۆقاندن و گوشارخستنە سەربوونەوەرێک بۆ لەکارخستنی بیروهۆش و بڕیاردانی، یان لەناوبردنی لەڕێی پاکتاوی جەستەوە. جانەوەر لەهەرجێیەکەوە بێت و دژی هەرکەسێک بێت؛ پاساوی نیە. لەکۆبوونەوەیەکدا کە لە ١٦ تشرینی دووەمی سالی ١٩٣٧ لە(جنیف)ی پایتەختی سویسرا بەسترا، بەم شێوەیە پێناسەی تیرۆر کرا: تیرۆر ئەو کارەتاوانەیە، کەدژ بەوڵاتێک ئەنجام دەدرێت وبەپێی سروشت و ئامانجی تایبەت دەبێتە هۆی دروستکردنی ترس و تۆقاندن لەناخی کەسایەتیەک، یان گروپێک، یان کۆمەڵگە بەگشتیدا. ئەگەرچی تیرۆر دیاردەیەکی دێرینەو چەندین قۆناغی بڕیوەو، هەمیشە لەهەڵچوون و داچوون و کەم و زۆریدا بووە؛ بەڵام هەرگیز بنەبڕ نەبووەو هەرچەندەی کرابێ لەلایەن(کەس و گروپ و پارت و دەسەلاتەوە) بەکارهێناوەو، بەمەبەستی جیاجیا بانگەشەی ڕەنگاوڕەنگی بۆکراوە. ئەمەش وایکردووە کەدەبینین چەندین جار لەمێژوودا وەک شەڕی پیرۆز دژی ئازادی بەکارهێنراوە. بەتایبەتی لەسەردەمی توندوتیژبوونی ناکۆکی و ململانێ سیاسی و کۆمەڵایەتیەکاندا و، بۆقۆستنەوەی هەڵ؛ وەک دیاردەیەکی ترسناک ڕۆڵی خراپی بینیوە لە پەکخستنی ئاسایشی ژیانی ئاکۆکینەداو، بۆتە بکوژو بڕڕی ماناڕۆڤایەتیەکان و لەسپەر لەبەردەم گەشەکردنی هزری کۆمەڵدا. بەو پێیەش خۆی کردۆتە ئەلتەرناتیف بۆ هەموو فۆرمێک کەلەگەڵ بیروبۆچوونی ئەودا نەگونجابێت. پەیوەندیی نێوان ئازادی و تیرۆر، ئازادیخواز و تیرۆریست، دیموکراسی و تیرۆریزم؛ پەیوەندیەکی پێچەوانەیە. واتە: تاتیرۆر هەبێ و وەک هەرمشەیەک بەکاربهێنرێت بۆ سەرکوتکردنی دەنگەکان! ئەوا لەبەرانبەردا ئازادی لاواز و بێهێز دەبێت. تاتیرۆریستان چالاک بن و بارودۆخ و کەش و هەوای گەشەکردنیان بۆلەبارببێت! ئەوا ئازادیخوازان، دەکەونە بەرهەرمشە و ترسی نەمان و هەمیشە لەقەیراندان. هەرکاتێکیش تیرۆریزم کرایە بەرنامەو، لەلایەن خاوەن ئایدۆلۆجیا تونڕەوەکانەوە پەیرەوکرا! ئەوا بەدڵنیاییەوە دەبێتە خنکێنەری دیموکراسی و پێشێلکاری مافەکانی مرۆڤ.

دیارە جۆرەکانی تیرۆر زۆرن وەک(سیاسی، چەکداری، ئابووری، فکری، کۆمەڵایەتی، دەروونی...) وەلەهەرجارێکدا بەشێوەی جیا بەکاردێن و، لەرووی مافەوە شەرعیەت بەخۆیان دەدەن و لەژێر پەردەی ناوی جیاجیاوە شەرعیەتی بەخۆی دا. تیرۆر، واتە هەرمشەو تۆقاندن و گوشارخستنە سەربوونەوەرێک بۆ لەکارخستنی بیروهۆش و بڕیاردانی، یان لەناوبردنی لەڕێی پاکتاوی جەستەوە. جانەوەر لەهەرجێیەکەوە بێت و دژی هەرکەسێک بێت؛ پاساوی نیە. لەکۆبوونەوەیەکدا کە لە ١٦ تشرینی دووەمی سالی ١٩٣٧ لە(جنیف)ی پایتەختی سویسرا بەسترا، بەم شێوەیە پێناسەی دیموکراسی لەدایکەبێ و دواجاریش ئازادی دەخوڵقێت. کەواتە هەر لەبەرئەوەیە تیرۆر هەمیشە دژی بیرکردنەوەیە، بیرکردنەوە لەشتێک کەپێچەوانەی کرداری ئەوەو بەترسناکی دەزانێت.

پەیوەندیی تیرۆر، بە ئایدۆلۆجیاوە

تیرۆر بەتەنها، ئایدۆلۆجیایەکی دیاریکراو نیەو لەچوارچێوەی چەند پرنسیپێکی سنووردارداد نەوەستاوە. بەڵکو دەرهاویشتە و دەرئەنجامی ئایدۆلۆجیایە و، لەشوێن و کاتی جیاوازدا، جۆری سەرهەڵدان و گەشەکردنی دەگۆڕێت.واتە ئەوانەی تیرۆریستن و، تیرۆر پیشەیانە، هەمیشە خاوەنی بیروباوەڕ و ئیمانێکی لەپێشینەن کەلەوانەیە پێشتر بەشێوەیەکی جیا بیریان کردبێتەوە. چونکە هیچ کامیان بە تیرۆریستی لەدایک نەبوون. بەڵکو ئەوە بیرو باوەڕ و ئایدۆلۆجیای سەقەت و نارێکە؛ کەمرۆڤ لەکەسێکی ئاشتیخواز وهێمن و خۆشەویستەوە دەکات بەکەسێکی شەڕەنگیز و هەڵەشە و بێزراو. کاتێک ئایدۆلۆجیا دەبێتە نەخشەڕێلان بۆ نیشاندانی ڕێگەی گەیشتن بە ئاوات و ئامانجەکان و، لەرووی تیرۆریەوە سەرنجەکانی خۆی بۆ لایەنەکانی ژیان و نیشانەکردنی کردارو هەڵوێست دەخاتەڕوو! ئەوکاتە پەیڕەوکارانی ئەو ئایدۆلۆجیایە، دەبنە جێبەجێکارو دەکەونە بازنەی کاریگەرێتیەوە. لێرەشدا جۆری بیروبۆچوون و فەلسەفەی ئەو ئایدۆلۆجیایە ڕەفتاروگفتاری کەسەکان دیاریدەکات و، هەرئەویش کاریگەریی زۆری دەبێت لەسەر ئایندەیان. ئەمە لایەنێکی هاوکێشەکەیە. بەڵام لایەنی دووەمی هاوکێشەکە مرۆڤەکان خۆیانن. ئایا تاچەند دەکەونەژێر کاریگەریی ئایدۆلۆجیاکەوە؟ ئایا تاچ سنوورێک لە وردەکاریەکان دەکۆڵنەوەو، تاچ ئاستێک هەڵە و کەموکورتیەکان دەبینن؟ ئەگەر مرۆڤ بەچاوی ڕەخنەوە سەیری بیروباوەڕی خۆی بکات و هەمیشە لەکردارەکان وردبێتەوە، ئەگەر وایدابنێت کە ئەویش هەڵە دەکات و ئەوبیروباوەڕەی ئەو هەڵیگرتووە لەوانەیە کەموکورتی تێدابێت، ئەوا زۆر بەئاسانی دەتوانێت گەشە بەخۆی و بیروباوەڕەکەی بداو، هاوزەمان پەیوەندیەکی باشیش لەگەڵ ئەوانی تردا ببەستێت. بەڵام خۆئەگەر بەچاوی بێگومانیەوە بڕوانی و هەمیشە ڕاستیەکی (ڕەها) لای خۆی ببینی و ئەگەری هەڵە دانەنێ! وەلەهەمان کاتیشدا بەچاوی گومان و کەموە بۆ دەوروبەر و دژەکانی بڕوانێ، ئەوا کارەساتەودەبێتە کەسێکی دیکتاتۆر و توندڕەو. جاهەڵگری هەرئایدۆلۆجیایەک بێت(نەتەوەیی، ئایینی، مەزهەبی، پێشکەوتووخواز، پارێزگار..هتد) کە لەپاشاندا بەرەفتاری ڕادیکالانە گۆش دەبی و، بەوشێوەیەش ناتوانێت لەگەڵ بیری بەرانبەرو ڕەخنەو سیستمی دیموکراسیدا بژی. ئەوکاتەی چەند ئایدۆلۆجیایەک دەکەونە پێشبڕکێ و ململانێی یەکترەوە؛ جۆرێک لەدژایەتیکردن لەنێواندا دروستدەبێت، ئەگەر بێتو بەگیانی دیموکراسی و قبوڵکردنی یەکتر کارنەکەن ئەوا ترسی سەرهەڵدانی کاری تونددوتیژی دەبی و، کەسانی تونڕەو ناکۆکیەکان دەقۆزنەوەو، پاشان کەهەستیان بە لاوازی و کەم توانایی لۆجیکەکەیان کردو، زانیان بەشێوەی ئاسایی ناتوانن بیرو ئیرادەی خۆیان بسەپێنن! ئەوسا پەنا بۆ توندوتیژی دەبەن ؛ بۆئەوەی لەوڕێگەیەوە دەسەلات و بەرنامەی کاری خۆیان بسەپێنن. هەوڵدەدەن لەڕێی تۆقاندن و هەرەشەوە چۆک بە دژەکانیان دابدەن و ناچاریان بکەن بۆسەلماندنی تێزەکانی ئەمان، سازش بکەن. لێرەشەوە کارەکان دەچنە خانەی تیرۆرەوە. یەکێک لەو بیروباوەڕانەی کەهەندێکجارو لەلایەن کەس و گروپی تایبەتەوە بەکاردێت؛ بیروباوەڕی ئایینیە، بەتایبەتی گروپە فەندەمینتالیست و ڕادیکالەکان، کەپێیان وایە دەبێ هەموو جیهان لەچاوی ئەوانەوە بڕوانێتە ژیان. لەسەدەکانی ڕابردودا لەزۆربەی جیهاندا، ئایین وەک دەقێکی پیرۆز و سیستمێکی بەڕێوەبردن، لەلایەن کەس و دەزگاو زۆربەی دەسەلاتەکانەوە پەیڕەودەکرا. لەئەورووپادا، کەنیسەکان ڕۆڵی گرنگ و گەورەیان هەبوو لە ڕەنگڕێژکردنی سیاسەت و بەڕێوەبردنی وڵاتدا. لەشەڕوئاشتیدا دەنگیان بڵندو خۆیان بەنوێنەری هەموو میللەت دەزانی و، زۆربەی بڕیارەکان لەژێر باڵی ئەوانەوە دەردەچوو. لەدنیای پەیڕەوکارانی ئایینی "مەسیح" دا، کەنیسە، پیرۆزیەکی یەکجار زۆری هەبوو. بەشێوەیەک کە لەزۆرشوێندا لەسەرووی دەسەلاتی سیاسیەوە بوو. بگرە هەرئەویش شەرعییەت و موبارەکیی دەبەخشیە سیاسیەکان. لەگەڵ ئەوەی لەسایەی ئەو ئایندا کاری باش کراوە،بەڵام لەهەمان کاتیشدا کاری خراپ و دزێویش ئەنجامدراوە، هەندێکجار کەسانی سەربەو ئایینەو لەسێبەری کەنیسەداچەندین کاری نابەجێ و تونددوتیژییان کردووە کەچۆتە خانەی تیرۆرەوە. چ لەرووی سیاسی،یان کۆمەڵایەتی، یان فکری و دەروونیەوە بووبێ، یان لەرووی پاکتاوی جەستەوە کرابێت. ئەویش بە بیانووی لەدین دەرچوون و خیانەت و، نەیارەکانیان بەبەدڕەوشت و یاخی لە قەڵەمداوە. هەمیشەش پاساویان بۆ کارەکانیان هێناوەتەوەو، خۆیانیان بە خاوەن ماف و پارێزەری ئایین و بیروباوەڕ زانیوە. بەڵام دوای ئەوەی بیری ئازادی و تێگەیشتنی عەقڵانی گەیشتە ئەو باوەڕەی کەپێویستە: لەرووی سیستمی بەڕێوەبردنەوە، دەسەلاتی ئایین بەسەر دەوڵەتەوە نەمێنێ. پاشان هەندێک لە پەیڕەوکارانی ئەو ئایینە دڵنیان بەهەڵەکاندا ناو پاش چەندین ساڵ بۆیان دەرکەوت، کەژیانی دیموکراسی و ئازادی لەلایەک و، بەزۆر سەپاندنی بیروباوەڕ لەلایەکی ترەوە ناگونجێن. تێگەیشتن کە دەبێت، مرۆڤ ئازادبێت لەوەی کام بیروباوەڕ و ڕێگە هەڵدەبژێرێت. ئەوجا بەرنامەی کاریان گۆڕی و دەسەلاتی ئایین و کەنیسەیان لەدەسەلاتی یاسا و دیموکراسی جیاکردەوە. بەوشێوەیەش بەرەوپێشچوون و ئایین و گەنیسەش هەر بەپیرۆزی مانەوە، کارەئایینیەکانی خۆیان دەکەن و هاوبەشیی کاریگەریشیان لە ژیانی کۆمەڵایەتی و مەدەنیدا هەیە. لەدنیای پەیڕەوکارانی ئایینی ئیسلامیشدا، بەهەمان شێوەو لەسەدەکانی ڕابردودا، ئایین ڕۆڵێکی گرنگ و سەرەکیی هەبووە لە بەڕێوەبردنی ژیانی دنیایی و کۆمەڵایەتی خەڵکیداو، لە لووتکەی هەرەمی دەسەلاتدا وەستاوە. بەتایبەتی لەسەرەتای بڵاوبوونەوەی ئیسلامدا. تادەگاتە فەرمانڕەوایەتی خەلیفەکان و، هەرسێ دەوڵەتی ئەموی و عەببباسی و عوسمانی. لەسەردەمی ئەو سێ خەلافەتەدا ! بەشێوەی جیاجیا، ئایین گەورەترین سەرچاوەی دەسەلات و داڕشتنی یاسا بووەو، هەرچی لە گەل وتە و پرنسیپەکانی ئەودا نەگونجابێ؛ بەلادەر و بێ ئیمان و گومڕا لە قەڵەمدراوەو، پاشانیش لەناوبراوە. زۆرکاری هەق و ناهەق، لەژێر پەردەی ئەو ئایینەدا کراوە و دەکرێ، بەتایبەتی توندڕەوەکان، کە بە بیانووی پاراستنی هەیبەت و پیرۆزیی باوەڕەوە، چەندین نەیاری خۆیانیان پاکتاو کردووەو، هەندێکجار خەڵکی بۆ پاراستنی گیان و ژیانی خۆیان، ملیان بۆ ئارەزووەکانیان داوەو بەفرمانیان جوڵاونەتەوە.

ماوەتی.

سەدام سەرۆکێکی عەرەبی ئەتک دەکات

مستەفا چوارتایی



دیارە سەدام حسێن ناوێکە لە سەرانسەری دنیادا ناسراوە، لە لای ڕەگەزپەرستانی عەرەب و ئیسلامە سافیلکەکانی تورکیا و بۆسنەو پاکستان و زۆر شوێنی تر بە مجاهدو موسڵمانی دژە ئەمریکا و، لەلای نەتەوەی کورد و گەلی عێراق بەتایبەتی و گەلانی دنیا بەگشتی بە دکتاتۆرو خوێنڕێژ ناسراوەو،هەووەها بە هەڵگیرسێنەری جەنگی عێراق - ئێران و داگیرکردنی کوەیت، بەڵام هێشتا ئەو تەپێنییە گەورەیە بۆ جیهان ئاشکرا نەبووە کە ئاوانەگەلی سەدام خەڵکی ئاسایی تێپەڕاندووە تارادەیەک کەسەرۆکی دەوڵەتێکی عەرەبی ئەتک بکات ئەم ڕوداوە بە نەپێنی مایەوە تاساڵی ١٩٩٥ کاتێک "حسێن کامل"ی زاوای سەدام هەڵات بۆ ئوردن،لەوێ بۆ کۆکردنەوەی خەڵک لەخۆی کەوتە پەیوەندیکردنێکی زۆر بە کەسایەتیە سیاسی و سەربازییەکانە وە هەروەها بە ڕۆژنامەنووس و نووسەرانەوە،یەکێک لەوانە نووسەری عێراقی "سەمیر عوبێد" بوو کە فلیمەکەیان نیشان دابوو بەڵام لەو کاتەدا کەس جورئەتی ئەوەی نەکرد ئەو بابەتە بوروژێنێ و بڵاوی بکاتەوە، تا ساڵی پێشوو "سەمیر عوبید" ئەم پاڵەوانێتییەی سەرۆکی قەرماندەی لە ڕۆژنامەو جێنێتی Arebtimes دا بڵاو کردەوە. لەبەر ئەوەی کە نووسەرو وروژێنەری ئەم بابەتە ئەوەندە دژی کوردو خواستەکانی خەڵکی کوردستانە دیدی ئەو جیاوازییەکی زۆری نییە لەگەڵ بەعسییەکاندا بۆ کێشەی کورد نەمویست ڕاستەوخۆ وتارەکە وەرگێڕم بۆ کوردی، بەڵکو لەسەر خودی ڕووداوی ناو وتارەکەی ئەو بنووسم، هەروەها ڕووداوەکە بۆ من هێندە گرنگ نییە بەقەدەر هەڵوێستی ئەو "سەرۆکە والێکراوە" بەرامبەر بە کورد . (ئەم سەرۆکە دوای ئەواوبوونی ئۆپەراسیۆنەکانی ئەنفال لەگەڵ "سەدام"ی قائیدولئومەدا سەردانی کوردستانیان کردبوو، لەیەکەم ڕۆژی گەیشتنیدا داوای کردبوو کە شەش حەوت کچی کوردی ئەنفالکراوی بۆ بێنن و دواتریش ئامادەیی خۆی نیشان دابوو کە لە کوردستاندا بایی ٧ ملیار "بە پارەی وڵاتەکەی خۆی" پرۆژەی گەشتیاری لە کوردستاندا بکاتەوە بەناوی خۆیەوەو ئەم داوایەی لە لایەن "سەدام" موە ڕەتکرابوەوە و پێی گوترابوو لە عێراقدا هەموو شتێک هەر بەناوی "سەدام" ەوەیە. سەمیر عوبید دەڵێ" ئەمە نەفیلمی هیندیەو نەورێنەی نووسەرێکی خەڵەفاوە و نە پێشبڕکێنی ڕۆژنامەنووسییەو نە هەڵپەی بەناوبانگبوونە،بەڵام گەمیەکە لە گەمەکانی دکتاتۆری و خوێندنگای لادان و بەرەڵایی و گۆڕینەوەی ڕۆڵی خراپەو ڕیسوایی" هۆکارەکانی ئەم ڕووداوەش ئەوەم بوو لە دوای ئەواو بوونی جەنگی عێراق - ئێران هەڵوێست و سەرۆکی ئەم دەوڵەتە لەگەڵ هەڵوێستی کومیت دا یەک بوو،ئەمیش داوای قەرزەکانی دەکردەوە جگە لەوەش بەهەماهەنگی لەگەڵ کومیت دا نرخی نەوتی بەرز کردبووە، بۆیە سەدام حسێن لەسەرەتای ٩٠ دەکانیدا و لە دوای ئەواوبوونی کۆنگرەی لووتکەی عەرەبی لە بەغدا ئەم سەرۆکە داوەت دەکات تاپێتکەوە بچنە باکووری عێراق بۆ بیروڕاگۆڕینەوەو لە بیربردنەوەی خەمەکانی سیاسەت، ئەمیش ڕازی دەبێ و بە یەکەوە سەردانی موسڵ و

بۆ لاپەڕەی ٧

بڕیارێکی نوێی کۆنگرێسی ئەمریکا لە دژی سوریا

ڕۆژی ٢٠٠٤/٩/٢٨ کۆنگریسی ئەمریکا بڕیارێکی نوێی لە دژی سوریا دەرکرد بە مەبەستی ناچارکردنی دیمەشق کە هێزە سەربازییەکانی لە لوبنان دەربکات. ئەم بڕیارە لە دوای کەمتر لە دوو هەفتە لە دەستپێکردنی پرۆسەکانی شوێن گۆڕینەوەی هێزەکانی سوریا لە لوبنان دەرچوو. هەڵبەتە لە گەڵ ئەوەی کە ناوەندە نیودەوڵەتیەکان پێشوازییان لە جێگەگۆڕینەوەی سەربازە سوورییەکان کرد، کە چی لەگەڵ ئەوەشدا ئەمریکا بەم هەنگاوە سوورییە ڕازی نەبوو، هەر بۆیە ئەو- بڕیارەی دەرکرد. جێگەی وەبیر هێنانەوەیە کە لە هەفتەی ڕابردوودا ئەنجومەنی ئاسایشی نیودەوڵەتی بڕیارێکی دەربارەی پێویستی پاشەکشی کردنی هێزەکانی سوریای لە لوبنان دەرکرد.

کۆشتنی دوو کورد لە لایەن کۆماری ئیسلامی ئێرانەوە

لە سێ بەیاننامەی جیاوازی یەکێتی شۆڕشگێرانی کوردستاندا کە لە ٢٧ـ٢٨ـ٢٠٠٤/٩/٢٩ دەرکراون، هاتووە کە:

١ـ سەر لە بەیانی ڕۆژی یەک شەممەی ٢٠٠٤/٩/٢٦ وڵە سەر ڕێگای سنە- مەریوان، هێزەکانی کۆماری ئیسلامی تەقەیان لە ئۆتۆمبێلێکی جۆری پیکان بیجۆ کردووەو سەر ئەنجام یەکێک لە سەرنشینەکانی ئەو ئۆتۆمبێلە بە ناوی جەمیل ئیبراهیمی گیانی لە دەستداوە.

٢ـ لە هەمان یەکشەممەدا، هێزە بەرهەڵستکارەکانی کۆماری ئیسلامی ئێران بە کرێ گیراوێک، بەناوی (ئەحمەد قەرەچی) یان بە سەختی بڕیندار کرد وڵە بارودۆخێکی تەندروستی یەکجار خراپدایە.

٣ـ هەروەها لە دوا ئیوەڕۆی هەمان یەکشەممە وبەهۆی تەقەکردن لە لایەن هێزی تایبەتی کۆماری ئیسلامییەوە لە سنووری پیرانشار- حاجی ئۆمەران کوردێک دەستبەجێ کوژرا.

ئەڵمانیا تانکی پێشکەوتوو بۆ عێراق ڕەوانە دەکات

بە پێی هەواڵێکی سایتی ئینترنێتی گۆڤاری (شپیگل)ی ئەڵمانی، وانیازە کە ئەڵمانیا ٢٠ تانکی (فۆکس)، ڕەوانەی عێراق بکات. بڕیاری ناردنی ئەم تانکانە وەکو شپیگل باسی دەکات، لە ژێر کاریگەری فشارەکانی ئەمریکا بۆ سەر ئەم وڵاتە بەنجام دراوە. ئەم تانکانە لە یەک کاتدا توانای گەڕانیان بە دوای چەکی ئەتۆمی و بایۆلۆجیدا هەیە، سەرباری ئەوەی کە بۆ سەرکوتکردنی یاخیبووان و شەڕی ناوشارەکانیش بەکاردێن.

بەشداری سەندیکای پارێزەرانی کوردستان لە کۆنگرەی UIA



لە ڕۆژانی ١ـ٥ ئەیلوول ی٢٠٠٤ دا و لە شاری جنیف ی سویسرا، ٤٨ مین کۆنگرەی یەکێتی پارێزەرانی نیودەوڵەتی بەسترا. لەسەر ئەو بانگهێشتەی کە ئاراستەی هەموو ئەندامانی UIA کرابوو لە نیوانیشیاندا پارێزەر بەختیار حەیدەری قازی بە نوێنەرایەتی سەندیکای پارێزەرانی کوردستان بەشداری کرد. لە ڕۆژی یەکەمی کۆنگرەدا و لە ڕێگەی هەڵبژاردنی ڕاستەوخۆوە بەڕێز Paul Nemo بە سەرۆکی یەکێتییەکە هەڵبژێردراو جێگەی سەرۆکی پێشوو Jacques Leroy ی گرتەوە.ئەومری تویژینەوەی ڕۆژی یەکەمی کۆنگرە ئەوەبوو کە (تەندروستی مافیکە لە مافەکانی مرۆڤ) وە دانیشتنی سەرەکیش بەسەرۆکایەتی وەزیری تەندروستی پێشووی فەرەنسا " د. بەرنارد کۆشنەر" بوو .هەروەها سەندیکای پارێزەرانی کوردستان باسی باری تەندروستی هەرێمی کوردستان و عێراقی کرد و بە تایبەتی بە هۆی کەڵک وەرگرتنی ڕژێمی پێشوو لە چەکی کیمیایی دژ بە خەڵکی کوردستان کە تائێستاش ئاسەوارەی نەخۆشی جەستەیی و دەروونی بە خەڵکەوە دیارە، داواشیان لە یەکێتی نیودەوڵەتی و هەموو لایەنە نێو دەوڵەتیەکان کرد کە یارمەتی تەندروستی خەڵکی کوردستان بدەن. وە لەڕۆژی سێیەمی کۆنگرەکەدا چاوپان بە سەرۆکی نوێی یەکێتی پارێزەرانی نیودەوڵەتی بەڕێز Paul Nemo کەوت، بەتێرو تەسەلی باسی بارووی دۆخی کوردستان و عێراق و سەندیکاو کاری پێشەیی بۆ کردو وەڵامی هەموو پرسیارەکانیان دایەوە و لە کۆتاییشدا بانگهێشتێکیان ئاراستەی بەڕێز Paul Nemo کردبۆ سەردانی کوردستان و ئەویش بانگهێشتەکەی قبوڵکرد.

تووندوتیژی ڕژێمی سوریا ڕابوەستێنن!

لە ژێر دروشمی: تووندوتیژی ڕژێمی سوریا ڕابوەستێنن ڕەوەندی کوردی لە سەرتاسەری ئەورووپا بە نیازە دوو خۆپێشاندانی گەورە سازبکات.

یەکەمیان: لە کاتژمێر ١٢:٠٠ نیوەڕۆی ٢٠٠٤/١٠/٢ لە "Karla Plan" بەرامبەر بالیۆزخانەی "Narvavägen" سوریا لە ستۆکهۆڵم.

دووەمیان:کاتژمێر ١٢:٠٠ نیوەڕۆی ٢٠٠٤/١٠/٥ لە شاری "دەن هاگ" لە هۆڵەندا.

لە دروشمەکانی خۆپێشاندەران:

گەرانەوەی مافی هاوڵاتیەتی کوردی و ئازادکردنی زیندانیە سیاسیەکان و پاراستنی مافی مرۆڤ لە سوریا.

هەوی شایەنی باسە لە ١٩٦٣/١٠/٥ەوە لە سەرژمێریەکی نا یاساییدا زیاتر لە ١٥٠ هەزار کورد لە ڕۆژئاوای کوردستان ناسنامەی سوریان لێ سەندرایەوە.

سەربار نۆسکی ئەندامی سەرکردایەتی پارتی سۆسیالیستی هۆڵەندا:

کوردستان تەنها هەرێمێکی ئارامە لە ناوچەکەدا ، لەبەر ئەوە زۆر شیاوە ببێتە بنکەیەکی بازرگانی

حکومەتی عیراق و هەردوو ئیدارەی کوردیش قایل نین بە ناردنەوەی پەنابەران

ئامادە کردنی فینوس ڤایق - هۆلەندا



سەربار نۆسکی لەبایکۆری شاری دهۆک، کۆتایی ساڵی ١٩٩٥ وەک پەنابەرێکی سیاسی بەکانە وڵاتی هۆڵەندا. لە کوردستان ئەکانیمی ڕاستە سیاسیەکانی خوێندوە. لە ساڵی ١٩٩٩ەوە ئەندامی پارتی سۆسیالیستی هۆڵەندایە ، لە ساڵی ٢٠٠٣ەوە بۆتە ئەندامی سەرکردایەتی پارتی ناوبراو لە هۆڵەندا وەک بەرپرسەری هەرێمی ناوەڕاستی باکووری هۆڵەندا . هەر لە سەرەتای نیشتەجێبوونیەوە لە هۆڵەندا سەرقاڵی کاری ڕۆژنامەوانی و نووسین بووە، ساڵی ٢٠٠٢ ڕێکخراوێکی نامەزرانندوە بۆ ڕۆژنامەوانی کوردەکانی ناو هۆڵەندا بەناوی (مەزگای کوردستان بۆ ڕاگەیاندن) بە مەبەستی یارمەتی دانیان لە بواری کار لەزینەوە وەک ڕۆژنامەوان لە ناو کۆمەڵگای هۆڵەندیدا.

پ: سەرلەنجامی سەردانی وفدەکەتان بۆ کوردستان و بینینی لایەنە سیاسیەکان و هەردوو ئیدارەی کوردستان لە نزیکەوە.. دەتوانن داخوازییەکانتان ئاشکرابکەن؟

و: زیاتر مەبەستی ئێمە ئەوەبوو لە نزیکەوە بزانین ئەوان چی دەخوازن و چیان دەوێت . لە زانکۆی سەلاحەدین پێویستیەکانیان زیاتر ئەوەبوو هەوڵ بدرێت لینک دروست بکرێت لە نێوان زانکۆکانی هۆڵەندا و زانکۆکانی کوردستان ، زیاتر ڕێگای قوتابیەکانی کوردستان بکەنەوە بۆ ئەورووپا بەتایبەت بۆ هۆڵەندا ، ئەوانیش لە بەرامبەردا ڕێگا دەکەنەوە بۆ قوتابیەکانی ئەوان بچن بۆ کوردستان لێکۆڵینەوە بکەن ، لە هەموو ئەوانەش گرنگتر ئەوەیە کەوا هەموو دەزانین ئێستا لە کوردستان ناتوانن بە ڕەسمی بڕوانامەی پرۆفیسۆری بدەن ، ئەلە سلێمانی نە لە هەولێر نە لە دهۆک ، لە لایەن هەردوو زانکۆی سلێمانیش هەولێریشەوە ئەو داخوازییان خستە ڕوو ، کە داوا لە چەند پرۆفیسۆرێکی هۆڵەندی بکەن بچن بۆ کوردستان سەرپەرشتی بەخشینی ئەو بڕوانامانە بکەن ، هەروەها ڕێگا بدەن بە مامۆستاکانی کوردستان بێنە دەرێ سیستەمی دەرەوە بۆ نموونە هۆڵەندا ببینن چۆنە ، لە سەروو ئەوەشەوە مامۆستای زانکۆکانی هۆڵەندی لە بواری جیاجیاکاندا بچن بۆ کوردستان لەوێ سیمینار و کۆڕ و کۆبوونەوەی زانستی ساز بدەن و کۆرسی خوێندن بکەنەوە و ئەگەر بخوازن لەوێ کار بکەن ، خەڵک هەن لە وڵاتە جیاجیاکانی دونیاوە دەخوازن بچن لە هیند کار بکەن یان بچن لە کوردستان کار بکەن ، ئەو دەرگایە بکرێتەوە... هەروەها داوایان کردووە بانکی زانیاریەکان بۆ زانکۆکانی کوردستانیش دابین بکرێت بە واتایەکی تر بتوانرێت کۆدێک بۆ زانکۆکانی کوردستانیش دابین بکرێت هەتا بە ئاسانی خوێندکاری زانکۆکانی کوردستانیش لە ڕێی تۆڕی ئینتەرنێتەوە سەردانی ئەو بانکە بکەن و سوود لە بانکی زانیاریەکان وەرگرن وەک هەموو خوێندکارێکی تری زانکۆ لە دونیادا ..

پ: ئاوەدانکردنەوەو پەرەندی بازرگانی لە ڕێگەی ڕێکخراوو کۆمپانیاکانەوە، گرنگییەکی تایبەتی لەسەردانەکەتاندا هەبوو.. گیشتە چ تەنجامێک؟

و: بواریکی تری گرنگ کە دەبێت گوێی پێ بدرێت و کاری بۆ بکرێت بواری کارکردنی کۆمپانیا و ڕێکخراوە هۆڵەندیەکانە لە ناو کوردستاندا و پەیوەندیە ئابوورییەکانە ، کەلە ئاکامدا بە شێوەیەک لە شێوەکان لەگەڵ ئامانجە سیاسیەکان یەکدەگرنەوە

" شتێکی گرنگی تر ئەوەیە کەوا کۆمپانیاکانی ئەورووپی و بە تایبەت هۆڵەندی بێنە ناو کوردستان بۆ کار کردن ، لە هەموو بوارەکاندا ، بیناکردن ، داوادەکەن پێشوازی لەو کۆمپانیایانە بکرێت و ئاسانکاریەکانیان بۆ بکرێت وەک بەسەڵەی باج و زەوی و هەر شتێکی تر ، ئێمە هەموو دەزانین کوردستان تەنها هەرێمێکی ئارامە لە ناوچەکەدا ، لەبەر ئەوە زۆر شیاوە ببێتە بنکەیەکی بازرگانی بۆ جێگای تری عیراق تا ئارامیش دەکەوێتە باشوور و ناوەڕاستی عیراقەوە. "

پ: وەک کوردێک کە ئەندامێکی پارتی سۆسیالیستی هۆڵەندین، کاری بەرچاوتان بۆ خزمەتی دۆزی کورد وەک ئەزموون وسیستمی کاری سیاسی چییە؟

و: پارتی سۆسیالیستی هۆڵەندی هەوڵی تەنسیق ئەدات لەگەڵ حیزبەکانی تر بۆمەبەستی ئەوەی دانبنرێت بە فیدرالیدا بۆ کورد لە کوردستاندا و ڕۆڵی گرنگ بدرێت بە پەرلەمانی کوردستان ، هەروەها پشتگیری دابین بکرێت بۆ بواری ڕاگەیاندن بۆ (وەک کردنەوەی کۆرسی ڕاگەیاندن بۆ ڕۆژنامەوانیەکی ئازاد) و چۆنیەتی دروست کردنی ڕاگەیاندنێکی ئازاد ، هەروەها پشتگیری کردن لە ڕێکخراوە NGOکان واتە ڕێکخراوە ناحکومیەکان ، هەروەها سازدانی کۆڕ و کۆبوونەوە و کۆرسی زانیاری بەخشین سەبارەت بە مەسەڵەی دیموکراسیەت و بە دیموکراسیبوون ، بە تایبەت پاش ٤٠ ساڵ لە دیکتاتۆریەت ، هەروەها چۆنیەتی داکۆکی کردن لە مافەکانی ژنان و چۆنیتی بەرزکردنەوەی ژن لە ناو کۆمەڵگادا ، بێگومان ئەم شتانە هەمووی کورد ئەیان زانیت و حەزی پێدەکات بەلام پێویستی بە پشتگیری و دەستی یارمەتی هەیە بۆ بەرجەستەکردن و بەدیهێنانی . هەڵبەتە کورد سەپانی کەس نییە ، کورد تەنها ئەزموون دەخوازێت ، دەخوازێت لە هەموو بوارەکاندا سوود لە ئەزموونەکانی وڵاتێکی ئەورووپی وەکو هۆڵەندا ببینێت لە هەموو بوارەکاندا ، هیچ حکومەتێک یان پارتێکی سیاسی یان ڕێکخراوێک هیچ کەسێک لەکوردستان هیچ داواکاریەکی نەبوو کە بڵێت کارێک بە ئێمە بدەن یان شت وەک و کۆمپیوتەر و ماتریالمان بۆ دابین بکەن ،بەڵکە هەرهەموو تەنها دوو داواکاریان هەبوو ئەویش پشتگیری سیاسی و گواستنەوەی ئەزموونی هۆڵەندا

بۆ لاپەڕەی ٧

پەیامی کورد

ژمارە٤(ساڵی یەکەم) | رۆژنامەیەکی هەفتانەی گشتییە | ٢٠٠٤/١٠/١

بکوژی شەوکەتی حاجی موشیر دەستگیرکرا



تایبەت بە پەیامی کورد

سەرچاوەیەکی بەرپرس لە ئاسایشی هەرێمی کوردستانەوە لە پەیوەندییەکی تایبەتیدا بە (پەیامی کورد) رایگەیاند کە بکوژی ئەندامی پەرلەمانی کوردستان و سەرکردایەتی یەکێتی نیشتیمانی کوردستان (شەوکەتی حاجی موشیر) لە هەولێکی سەرکەوتووانەی پارێزەرانی ئارامی و سەقامگیری لە کوردستاندا دەستگیرکرا. سەرچاوە بەپرسەکە لە درێژەی قسەکانیدا گوتی: ئەو بکوژە ئەندامێکی باندی تیرۆریستی ئەنسارولئیسلام بووە ودانی بەوەدا ناوەکە چەندین جار سەردانی (فەللوجە)ی کردووەو لەوێش چاوی بە تیرۆرست (ئەبومسعەب ئەلزەرقاوی) کەوتووە. سەرچاوەی بەرپرس کە رازی نەبوو ناوەکەی ئاشکرا بکەین روونی کردەوە کە لێکۆڵینەوە لەگەڵ ئەو تیرۆریستەدا هێشتا بەردەوامە. جێی وە بیرهێنانەوەیە کە ساڵی پارو لە کارێکی تیرۆرستی ناجوامێرانەدا، خوالێخۆشبوو (شەوکەتی حاجی موشیر) کە سەرگەرمی هەوڵی بەرقەرارکردنی ئاشتی بووە، تیرۆرکراوە، ئەم هەواڵە دڵخۆشکەرە ئەو راستییە ئاشکرا دەکات کە برادەرانی ئاسایشی هەرێمی کوردستان هەمیشە چاوکراوە وئامادەن بۆ پاراستنی ماڵ و گیانی گەلی کورد و دام ودەزگا فەرمییەکان.

١٩٩٢/١٠/٤ رۆژی جارپدانی دەوڵەتی کوردستان



راستیەکی مێژوویی کەوا مێژووی میللەتی کورد پڕە لە ڕۆژ و بیرەوەری و ڕوداوی گرنگ و دیار، هەندێکیان تاڵ وناخۆشن و هەندێکی تریان گەش و بایەخدار و کاریگەرن. رۆژی ١٩٩٢/١٠/٤ بۆ یەکەمین جار لە مێژووی میللەتی کورد پاش دەیان ساڵ لە تەشکەنجە و یاریکردن بە چارەنووسی کورد و بڕیار سەپاندن بە سەریاندا لە لایەن دوژمنانەوە، نوێنەرانی هەڵبژێردراوی خەڵکی کوردستانی عێراق بۆ پەرلەمانی کوردستان وە پاش هەڵبژاردنیان بە ماوەی٥ ساڵ، بە ئارەزووی ئازادانەی خۆیان، بڕیاریاندا پەیوەندی نێوان هەرێمی کوردستان لەگەڵ عێراقدا دیاری بکەن و شوازی فیدراڵیزم بۆ ئەو پەیوەندیە هەڵبژێرن، ئەو شێوەیەی کە ڕاستەوخۆ پێویستی بەڕەزامەندی لایەنی عێراقی هەبووە و هەیە. بەڵام لە ڕاستیدا بۆ ئەم کاتە هەنوکەییە و هۆکارە بابەتییەکانی ناوخۆو هەرێمی و دەرەکییەکانەوە، بڕیارەکە، واتە بڕیاری هەڵبژاردنی شێوازی فیدراڵیزم بڕیارێکی گونجاو و ژیرانە بوو و سەرکردایەتی کوردیش توانی ئیشی باشی بۆ بکا، چ لەگەڵ ئۆپۆزۆسیۆنی عێراقیدا پێش ڕوخانی ڕژێمی سەدام و چ لەگەڵ لایەن و گرووپە سیاسیەکان و کۆمەڵایەتییەکانی عێراق پاش ڕوخانی ڕژێمی بەعس،ئەمەش ڕەنگی دایەوە و بە ئەنجامی باش گەیشت بەچەسپاندنی ئەم شێوازە لە یاسای کاتی بەڕێوەبردنی عێراق. ئێستاش پاش ئەوەی لە عێراقدا بڕیاری ئەنجامدانی هەڵبژاردن دراوە لە کۆتایی مانگی کانونی دوەمی ساڵی ٢٠٠٥ دا و بە دوایدا یاسای بنەڕەتی (دستور) ی هەمیشەیی دادەڕێژرێ، بۆیە پێویستە میللەتی کورد و کوردستانیەکان و گشت لایەنە سیاسی و کۆمەڵایەتیەکانیان لە هەوڵێکی بەردەوام و کاریگەر بن بۆ ئەوەی بتونن ئەم مافە ڕەوایەی زامن بکەن بە چەسپاندنی فیدراڵیزم لەم یاسا بنچینەییە، ئەمەش بەڕای من بە یەکێتی ڕیزەکانی میللەت و هەوێستی پۆڵایین و نەگۆڕ دێتە دی.

بەختیار حەیدەر قازی ئەندامی پێشووی پەرلەمانی کوردستان

وێنە- زاگرۆز مەحمود

هێڵی ئاسمانی کوردستان Air Kurdistan کرایەوە!



سەرچاوەیەکی دیپلۆماسی لە ئەنقەرە ئاشکرای کرد.. بە پێی ئەو گرێبەندەی لە نێوان تورکیا و بەرێز نێچیرڤان بارزانی سەرۆکی حکومەتی هەرێمی کوردستان لە ناوەڕاستی مانگی سێبتەمبەر مۆرکرا.. هێڵی ئاسمانی کوردستان Air Kurdistan کە لە قۆناغی یەکەمدا ٢٠ فڕۆکەیە لە نێوان کوردستان و جیهاندا کرایەوە. بۆ مەبەستی وەرگرتنی بەنزین و ترانزێت لە فڕۆکەخانەکانی سەبیحەی ئەستانبول و دیاربەکر و ماردین و ئەنقەرە وچان دەگرێت. ئەوەی ماوە بگوترێت.. دەسەلاتدارانی تورکیا تەنها مەرجیان بۆ ئەو گرێبەندە، بەکارنەهێنانی هێما کوردیەکانی وەک "ئاڵای کوردستان" و ئەو نیشانانەیە کە لە عێراق جیایی دەکاتەوە!

سەری بارمتە ئەمریکیەکەیان فڕێدایە ناو ماڵێکی کوردەوە

لە بەغداد سەری لێکراوەی دووەم بارمتە ئەمریکیەکەیان خستە ناو باخچەی ماڵە ناسراوێکی کوردەوە، بەو مانایە خوێن ڕێژانی تیرۆریستانی ئیسلامی و ڕەگەزپەرستە عەرەبەکان کورد تێکەڵ بەو کارە نامرۆییە بکەن و داهاتووی کوردیش بەو کردەوە نامرۆڤانەیە لە کەداربکەن، بەداخەوە کۆنە بەعسییەکی پۆلیسیش لەکاتی هەڵگرتنەوەی تەرمەکەدا دەڵێ : " وەڵاهی پێویستە سەرەکەی بکرێتە کەباب "

پەیامی کورد - بەغداد

"لە ئامەدەوە بەرەو بڕۆکسل"

ئەوە دروشمی خۆپێشاندانێکی فراوانە لە بەردەم تەلاری پەرلەمانی ئەورووپا لە بڕۆکسل

ڕۆژی یەکشەممە ڕێکەوتی ٢٠٠٤/١٠/٣ کات ١٢ تا ١٥

کورد دەنگ و هێزی خۆی بۆ ئەو پرسە دەکاتە یەک

مەرجی ئەندامێتی تورکیا بۆ ناو یەکێتی ئەورووپا، چارەسەرکردنی کێشەی ڕەوای کورده لە تورکیادا.

بەهەمەن قوبادی خەڵاتی فیستیڤاڵی "سان سەباستیان"ی وەرگرت



سیروان حەجی بەرکۆ- پەیامی کورد فیلمی (کیسەڵەکان دەتوانن بفڕن)ی دەرهێنەری کورد بەهەمەن قوبادی، کە خەڵاتی ئەسڵی فیستیڤاڵی (سان سەباستیان)ی وەرگرت، باسی ژیانی منداڵانی کوردی قوربانی شەڕ دەکات. فیلمەکە باس لە ئێوارەی شەڕی ئەمریکا و بەریتانیا دژی ڕژێمی عێراق لە کەمپێکی پەنابەرانی کورد لە باشووری کوردستان دەست پێدەکات و بە ڕوخانی سەدامی دیکتاتۆر کۆتایی دێ. ئەکتەری سەرەکی "کاکە" کە بەناوی "مانگی دەستکرد" ناسراوە و هەندێ ئنگلیزی دەزانێت، لاوێکی کوردە سەرپەرشتی گرۆپێک لە هەتیمان دەکات، کە لەبەر خراپی باری ژیانی خۆیان "مین" دێنن و دەیفرۆشن، سەرەڕای ترسی تەقینەوەیان، کە ڕەنگە ببێتە هۆی لە دەستدانی ئەندامێکی لەشیان. فیلمەکە بە شێوەیەکی کۆمیدی دەست پێدەکات و بە کوشتن و تراژیدیا کۆتایی دێت. بەهەمەن قوبادی لە کۆنگرەیەکی ڕۆژنامەوانیدا ئاشکرای کرد: کە فیلمەکەی باسی سیاسەت ناکات، بەڵکو باسی ژیانی ڕاستەقینەی ئەم کەسانە دەکات. هەروەها ووتی؛ هەوڵم داوە ئەو وێنانەی کە لەڕاگەیاندن وەلاوەنراون پێشکەش بکەم. بۆش و سەدام بوونەتە دوو قارەمانی سەرەکی تەلەفزیۆنەکان، بەڵام قارەمانانی ڕاستەقینە ئەم منداڵانەن و دەڵی من خۆم بە بەرپرسیار دەبینم بۆ دیاریکردنی تراژیدیای ئەم منداڵانە. قوبادی دەڵێ: بە ڕوخانی سەدامی دیکتاتۆر شادبووم و دەبوایە ئەمریکاش پێش دەمێکی درێژتر بهاتایە. شایەنی باسە، فیستیڤاڵی (سان سەباستیان) گرنگترین فیستیڤاڵی ئیسپانی و ئەورووپییە و بەهەمەن قوبادی لە ساڵی ٢٠٠٠ دا خەڵاتی کامێرای زێڕینی فیستیڤاڵی Cannes ی نێو نەتەوەیی لە سەر فیلمی (کاتێک بۆ مەستی ئەسپەکان) وەرگرتبوو و ناوبانگی لە سینەمای جیهانی دەرکەوت.